Salnameya Qedexeya Derketina Derve ya 2015-2016an

DEWLET HAT

Ev weşan bi fînansoriya Yekitiya Ewropayê hatiye amadekirin û ji naveroka wê Komeleya Çavdêriya Koçberiyê (GÖÇ-İZ DER) berpirsyar e.

Amadekar:
Zana Kibar

Çapa Yekem: Cotmeh, 2019

Koma Xebatê: İlyas Erdem, Yeter Tan, Zana Kibar

Werger: Halit Karahan

Rûpelsazî û Berg: Zozan Eser

KOMELEYA ÇAVDÊRIYA KOÇBERIYÊ

Navnîşan: Şirinevler Mahallesi Meraşal Fevzi Çakmak Cad.
No:5 D: 50 Dönmez Apt. Bahçelievler/İstanbul

Tel: 0530 703 02 99

E-Posta: gocizleme@gmail.com / gocizlemedernegi@gmail.com

Malper: www.gocizlemedernegi.com

Çapxane: Berdan Matbaa / Sadık Daşdöğen
Güven Sanayi Sitesi C Blok No: 239 Topkapkı / İstanbul **Tel:** 0212 613 12 11

DEVLET GELDİ

B

CİZRE YANLIZ
DEĞİLDİR !
BÜİ
BERGE
DAN
CİZRE
tis


DEVLETİN
VAR İHANET ETME
POH
ÖH
TEM BURDA


T.C
BURDA
T.C
Biz
Geldik

Dewlet

Hat

NAVEROK

017 Pêşgotin

033 Gimgim / Varto

051 Farqîn / Silvan

077 Sûr / Sur

107 Bismil / Bismil

110 Licê / Lice

111 Dicle / Dicle

115 Cizîra Botan / Cizre

199 Girgê Amo / Silopi

225 Şirnex / Şırnak

255 Hezex / İdil

275 Nisêbîn / Nusaybin

307 Gever / Yüksekova

336 Rapora Netewên Yekbûyî(NY)

352 Kronolojî

PÊŞGOTIN

Di sala 2013an de li Tirkîyeyê bo çareserîya pirs girêkên di navbera dewleta Tirk û Kurdan de pêvajoya aşîtîyê destpê kir. "Pêvajoya Aşîtîyê" di 28ê Sebata 2015an de bi "Mûtabaqata Dolmabahçeyê" hate asta guftûgokirinê. Lê belê piştî ku serokomarê dewleta Tirk Erdogan di 11ê Tebaxa 2015an de go "ji nuha û pê ve pêvajoya çareserîyê hatiye sekinandin[1]", di 2015an de şerê herî dijwar yê ji 40 salî û vir ve di navbera dewleta

---

[1] Bo axaftina Erdoganî binere: https://www.bbc.com/ turkce/haberler/2015/08/150811_turkiyede_bugun_catisma_ operasyon

Tirk û Kurdan de rû da. Şerê ku bi deh salan e li bejahîyan dom dikir vê carê li navendên bajaran pêk hat. Di 18ê Tebaxa 2015an de dewletê li Farqînê işareta şerê dijwar bi nivîsa **“Dewlet Hat”** ya ku li ser derabeyên dikanekê nivisîbû, da. Di Kanûna 2015an de piştî ku dewletê di şer de çekên giran ên wek tank, top û helîkopterê bikaranîn, Şirnex, Cizîr, Sûr, Nisêbîn, Gever hilweşîyan.

Di vê pêvajoyê de YPSê (Yekîneyên Parastina Sivîl) li 12 bajaran xendeq kolan û li van bajaran hemîyan pevçûn destpê kir. Ev bajar: Gimgim, Sûr, Cizîr, Şirnex, Gever, Silopî, Farqîn, Dêrik, Kerboran, Bismil û Hezex in. Ji bilî van bajaran li Wan û Sêrtê jî hin pevçûnên ji dervî stratejîya xendeqan rûdan.

Piştî ku di 16ê Tebaxê de qedexeya derketina derve ya li Navçeya Mûşê Gimgimê hate ragihandin pevçûn destpê kir. Bi vê re jîyana rojane bi temamî lepikî. qedexeya derketina derve û pevçûn di demeke kurt de li gelek bajar û mehelleyan belavbû. Di dema qedexeya derketina derve de, ku bi rojan bênavber dom kir, bajarên ku di bin dorpêçê de bûn têkilîya wan ji derve qut bû. Navendên bajaran hatin kavilkirin; bêhiqûqî, destdirêjîya li mal û milk, bir girseyan jicihkirin, birîndarkirin, kuştin bi awayekî sîstematîk hate sepandin.

Di vê pêvajoyê de rê li ber têketin û derketina bajaran hate girtin. Têketina bajaran bi barîkatên polîs û leşkeran hate astengkirin. Têketina bajêr a rêxistinên sivîl, rojnamegeran, bijîşkan, parêzeran, nûnerên partîyan di vê pêvajoyê de hate astengkirin û nehiştin ku ew li navbajêr lêkolînan bikin. Şebekeyên elektrîkê û telefonan hatin birrîn û bi vî awayî rê li ber agahadarîya bi derve re hate girtin. Herwiha rê liber têketina bajêr a grûbên wek Neteweyên Yekbûyî (NY), Rêxistina Çavdêrîya Mafê Mirovan, Rêxistina Efûyê ya Navnetewî (Amnesty International) û Bijîşkên bo Mafê Mirovan (Physicians for Human Rights), ku derbarê mafê mirovan de li qada navneteweyî dixebitin, hate girtin. Tevî ku qedexeya derketina derve bi dawî bibû û pevçûn qedîyabûn jî dewletê nehişt ev rêxistin li deverên pevçûnan lêkolînan bike.

Lêkolînera Tirkîyê ya Rêxistina Çavdêrîya Mafê Mirovan li ser vê rewşê wiha go:

> **“Dorpêçandina fîîlî ya dewleta Tirkîyê ya li gelek herêmên başûrê rojhilat, gûmanên li ser hewildanên veşartina hin tiştinan xurt dike. Piştre wisa domand” Vegotinên bawerdêr li ser kuştina sivîlan ji teref hêzên ewlehîyê yên dewleta Tirkîyê hene, ku ew sivîl alên boz li ba kirine, di jêrzemînên apartmanan de asê mane û di nav wan de zarok hebûne. Hebûna van vegotinan divîya bibûya sedema xuyabûna telûkeyên mezin.**

Ji 16ê Tebaxa 2015an ta 1ê Adara 2018an bi giştî li 11 bajar û herî kem 49 navçeyan, bi qasî ku bi awayekî resmî hatîye tespîtkirin, qedexeya derketina derve hatîye îlankirin:

Amed (169 caran),
Mêrdîn (48 caran),
Colemêrg (23 caran),
Şirnex (13 caran),
Bedlîs (14 caran),
Mûş (7 caran),
Çewlik (7 caran),
Dêrsim (6 caran),
Êlih (6 caran),
Xarpêt (2 caran)
û Sêrt (4 caran).

Herwiha 127 herêm, di serî de Dêrsîm, Colemêrg, Mêrdîn, Şirnex, wek "herêmên taybet ên ewlehîyê" hatin îlankirin.

Li gor daneyên hejmara nufûsa 2014an li navçeyên ku qedexeya derketine derve lê hatibû îlankirin, her kêm **1 milyon û 809 hezar kes ji van qedexeyan tesîr girt.** Di vê pêvajoyê de mafê azadî û ewlehîyê, mafê rêzdarîya li jîyana tabet û malbatê, mafê civîn û birêxistinbûnê, mafê dan û stendina agahîyan, mafê parastina xwedîtîyê, mafê perwerdehîyê, mafê jîyîn û parastina bedenê hate binpêkirin.[2]

---

[2] TİHV, Qedexeyên Derketina Kolanan ên ku di navbera 16ê Tebexa 2015an û 1ê Adara 2018an Hetine Îlankirin.



Kuştin, rûxandin û koçberîya girseyî ya jicihkirina bi zorê bi piranî li neh bajaran ên ku Cizîr jî dinav wan de ye, pêk hat.

Tevî ku bi dû re li van bajaran veger çêbû jî, di merhaleya yekem de nêzî nîv mîlyon mirov bi zorê ji cihên xwe hatin kirin. Herî kêm **3 hezar û 638 kes mirin.** Bajarqirîyeke wisa hat jiyîn ku ne bi tenê mirov ji xwe re kir armanc û wan ji cihên wan kir, herwiha nirxên çandî yên mirovan, bajarên ku lê dijîn, şeklê jîyana wan jî bi mebesta ji holêrakirinê ji xwe re kir armanc.

Yek ji mînakên ku wek bajarqirîyê were nirxandin jî Şirnex e. Li Şirnexê bi destpêka qedexeyan re tank, top û obusên ku li ser girên bilind hatibûn bicihkirin, navenda bajêr dan ber guleyan. Berî êrişan di nirxandinên leşkerî de taktîkeke ruxandinê wisa hatibû tesewirkirin: **“Divê guleyên topa li her malên Şirnexê keve”.** Li bajêr mal ne man ku guleyên top û hawanan li wan neket. 9 meheleyên ji 12 mehelleyên navenda bajêr bi temamî hatin ruxandin. Wek mînaka Seraybosnayê li Şirnex, Cizîr, Nisêbîn, Gever û hwd. bajarên Kurdan di sala 2016an da mînakên bajarqirîyê pêkhatin.

Komîserîya Bilind a Mafê Mirovan a Neteweyên Yekbûyî (OHCHR) bûyerên wek bikaranîna hêza zêde; kuştin; wendakirina bi zorê; êşkence; tûnekirina mîrasa çandî û xanîyan; teşwîkkirina nefretê; rêlibergirtina gihiştina xizmetên lezgîn ên tibbî, xwarin, av û çavkanîyên debirînê; tundîtîya li dij jinê; sînordarkirina azadîya raman û îfadeyê û mafê sîyasî yê beşdarbûnê, tomar kir. Hat raporkirin ku binpêkirinen mafê mirovan ên herî giran di dema tetbîqa qedexeya derketina derve de pêk hatine. Di wê heyamê de têkilîya hin deveran ji cîhanê bi temamî qut bû û çûnehat bi şev û roj bênavber hate sînordarkirin.[3]

UNITED NATIONS
BİRLEŞMİŞ MİLLETLER

---

[3] Rapora Komîserîya Bilind a Mafê Mirovan a Neteweyên Yekbûyî ya li ser rewşa mafê mirovan li başûrê rojhilatê Tirkîyê, Tîrmeh 2015- Kanûn 2016

Li gor Komîserê Bilind yê Konseya Ewropayê Nils Muižnieks, qedexeya derketina derve ya li herêmê hatiye îlankirin,tetbîqeke wisa ye ku mîna wê tetbîq tuneye. Di îçtihadên Dadgeha Mafê Mirovan a Ewropa'yê (DMME) de jî tetbîqeke bi vî rengî tune. Komîser di rapora xwe de ifade kir ku tehayyulkirina ji tetbîqa qedexeya derketina kolanan girantir pir zahmet e. Loma jî komîser di wê fikrê de ye ku pêkan e, ew qedexeya derketina kolanan bandor li hemû mafên ji teref Komîsyona Venedîkê hatine pejirandin, kiribe.[4]

---

[4] Komîserê Bilind yê Konseya Ewropayê Nils Muižnieks, Momorandûma Bandora li ser Mafê Mirovan a Operasyonên Têkoşîna li dij Terorê yên li Herêma Başûrê Rojhilatê Tirkîyê https://wcd.coe.int/com.instranet.InstraServlet?command=com.instranet.CmdBlobGet&InstranetImage=2952754&SecMode=1&DocId=2393076&Usage=2

Dema ku bi awayekî giştî li pêvajoya herêmê were nêherîn, ewê were têgihiştin ku planek bo dabînkirina kontrolê bi rêya guhertina hîmsazî û veguhestina nifûsê û ji cihkirina ew kesên ku li ew deverên dabeşa behsê rûniştî û kavilkirina ew cihan ji berê de hatîye amadekirin.

Dema ku li ser firehîya qedexeya derketina kolanan were fikirandin, pêkan e ku li li tevahîya herêmê, li hemû navçeyên ku qedexeyîya derketina derve lê hatibûn îlankirin, bi giştî zêdeyî nîv milyon mirov ji cih bûbin.[5]

ULUSLARARASI
AF ÖRGÜTÜ

---

[5] https://www.amnesty.org/download/Documents/EUR4452132016TURKISH.PDF

Piştî ku di Tîrmeha 2015an de di navbera hêzên ewlehîyê yên Tirkîyê û PKK(Partîya Karkerên Kurdistanê) û milîsên bi ser PKKê ve pevçûn rûdan, heyamek ku bipêkirinên mafên tanduridstîyê û tibba alînegir, bi taybetî ji teref rêveberîya Tirkîyê, bi awayekî berbelav pêk hatin. Hêzên ewlehîyê yên Tirkîyê, hemû bajarên başûrê rojava dorpêç kir, sazîyên tenduristîyê ji dervî qanûnan bi armancên leşkerî bikaranîn, rê li ber gihiştina xizmetên tenduristîyê yên lezgîn girt û mirov ji wan bêpar hiştin, sazîyên tenduristîyê ruxandin, êrişi xebetkarên tanduristîyê kirin, zilim kir û bi her wekîdin rêbazan mafê jîyan û tenduristîyê yên niştecihên herêmê binpê kir.[6]

PHR

Physicians for
Human Rights

---

[6] http://hakikatadalethafiza.org/wp-content/uploads /2016/10/2016.08.09_PHR_southeastern-turkey-health-care-under-siege-TUR.pdf

ONLY GOD

Gimgim

Varto


Varto
Toplam Ölüm Sayısı: 16
Sivil
PKK Militanı (HPG)
Tanımlanamayan Gençler
Güvenlik Gücü Mensubu
PKK Gençlik Yapılanması (YPS)
Toplam Ölüm Sayısı
8
6
4
2
0
Tem
Oca 2016
Tem
Oca 2017
Tem
Oca 2018
Tem
Oca 2019
Varto
(16)

VARTO
Nüfus: 10800

GİMGİM - VARTO

GİMGİM
BÛ
DESTPÊK

Di heyama pevçûnan a ku piştî Hilbijartina Giştî ya Tirkîyê ya 7ê Pûşpera 2015an destpê kir de, cihê ku yekem pevçûn lê rûdan navçeya Mûşê Gimgim bû. Qedexeya derketina derve ya ku di 16ê Tebaxê de li Gimgimê hate tetbîqkirin,bi pişt re li 11bajar û navenda 49 navçeyan belav bû.

Di dema rêkontrola gerîllayên HPG ya li ser rêbejahîya Mûş- Gimgmê de, pevçûn derket. Di wê pevçûnê de gerîllaya HPGê Kevser Elturk, bi kodnavê xwe Ekîn Wan, bi birîndarî êsîr ket.

Piştî ku di şeva 15ê Tebaxê de sûretekî Gerîlaya jin a êsîrketî di medyaya civakî de hate belav kirin, ku di wî suretî de gerîlaya jin kûştî û tazî xwûya dikir, di nav civakê de hêrs rabû. **Ew dîmen bû xala werçerxê ya pêvajoya ku were jîyîn.**

- Ev yek bû sedema geşedana herî girîng; bandor li pêvajoya agirbestê kir ku ji 2013an vir ve dihate meşandin û him bû destpêka şerên bajaran him jî li bajaran bû destpêka kolandina xendeqan. Herwiha ev bûyer bû nîşaneka herî cidî ya ku rengê pêvajoyê da dîyarkirin.

- Wexta ku Rojava(Tirkîye) ji ber atmosfera hilbijartinan rewşa heyî ferq nedikir, hêrsa Rojhilat(bajarên Kurdan) li hev diqelibî. Ev yek bi taybetî di nav ciwanan de bû sedema bicîhbûna tigihiştina ‘’Tu erdînegarîya xwe neparêzî, tu yê bedena xwe jî nikaribî biparêzî’’. Jixwe bi sala 2013an re ciwanan bo dûrxistina hêzên rejîmê ji kolan û malên xwe bi saya barîqatan hin tecrûbe bi dest xistibûn. Xendeq bi vê rewşê re derbasî asteke nû bû û him bo bicîhanîna fiîlî ya rêveberîya xwesar a ku ji sala 2004an û vir ve tê talepkirin him jî bû sîstema parastinê ya bo dûrxistina hêzên rejîmê ji ‘’bedena xwe, mala xwe û mekânê xwe’’[7]

---

[7] Mersin, Şirenex Jin,52.

EKİN WAN DİRENİŞİMİZİN ÇIRILÇIPLAK HALİDİR
KADIN BEDENİ ÜZERİNDEN, BİR HALKIN ONURUYLA OYNAMANIN KENDİSİ ONURSUZLUKTUR
İNTİKA
SEVM
Jin



Jin Jiyan Azadî
KADIN BEDENİ ÜZERİNDEN, BİR HALKIN ONURUYLA OYNAMANIN KENDİSİ ONURSUZLUKTUR
Ekin W

AKP
ONURUNU
GİYİNDE
GEL !!!

STOPPA MASSAKERN AV
CIVILA I KURDISTAN!

- **“Bedenên mirî bi kurtejîyanekê tên pêşberî me. Ew kurtejîyan, dike ku em ew bedenên mirî û ew mirovên ku mîna wan dijîn, hevyekî bikin. Tiştên ku li bedena wan hatîye kirin, daxwaza nîşaneka heman tiştî li bedena ew kesan e, ku ew kes di wexta jîyîna wan de wek wan xwedîyê heman çarenûsê ne. Bedenên wan him mirî û him jî zindî ne. Her çiqas ji alîyê fizîkî de mirî bin jî, ji alîyê sîyasî ve dijîn. Bedena mirî û tiştên ku li bedena mirî hatine kirin, rewşa herî kifş a sîyasetê ye.”[8]**

---

[8] (Verdery, Katherine. 1999. The Political Lives of Dead Bodies: Reburial and Postsocialist Change. New York: Columbia University Press aktaran Evren Balta, http://www.birikimdergisi.com/haftalik/7240/olu-bedenlerinsiyasal-yasamlari#.Vx5- Afl97IU)

Piştî belavkirina van dîmenan komek gerîllayên HPG daketin navenda bajêr. Êvara 15ê Tebaxê, di saet 20:30an de, li navenda navçeyê di navbera gerîllayan û polîs-leşkeran de pevçûn rûdan. Piştî vê pevçûnê navenda bajêr, hemû kolan jî di nav de, ket bin kontrola gerîllayên HPGê. Li navçeyê hemû polîs û leşker vekişîyan qeroqolên xwe û ji Mûş û Xinisê polîs û leşker hatin teqwîyekirin.

Ji sala 2013an ve li deverên wek Cizîr, Licê û Nisêbînê xendeq hatibûn kolandin, lê belê kolandina xendeqan ya herî berfireh li Gimgimê pêk hat. Kolandina xendêqan, berê bêhtir bi sedema ewlehîyê ji teref ciwanên mehelleyê li dij biserdegirtina malan a nîvê şevê, destpê kir. Lê li Gimgimê xendeq wek enîyeke şer bo zevtkirina qadê û dûrxistina hêzên dewletê ji wan deveran, hatin kolandin.

Qedexeya derketina derve ji teref parêzgerîya Mûşê di 16.08.2015an, danê sibehê saet 8:30an de, hê ku gerîllayên HPGê li navenda bajêr bûn, hate îlankirin:

- *Ji tarîxa 15.08.2015an de li navende bajarê Gimgimê ji teref endamên rêxistina terorê PKKê gelek mayîn hatine dayîn û xifik hatine vedan. Di gava berterafkirina van xifkan de, di serî de bo parastina can û malê hemwelatîyên me, bo pêkanîna asîyîş û ewlehîyê, li gor xala 11/c a Zagona Rêvebirina Parêzgehan a bi hejmara 5442an, li navçeya parêgezha me Gimgimê, ji roja 16.08.2015an saet 08.30 û pê ve heya fermaneke din neyê dayin, qedxeya derketina derve hatîye îlankirin.*

Li hember vê, gerîllayên HPGê telefonî 156 Cenderme û 155 Polîs dikir ku wan qedexeya derketina derve bo hêzên dewletê îlankirine:

- *"Li Gimgimê xweserîya demokratîk hatîye îlankirin û hemû kolan di bin kontrola gerîlayên PKKê de ye. Bo polîs û leşkeran derketina derve qedexe ye. Bo ewlehîya canê xwe dernekevin kolanan. Ji nuha û pê ve Gimgim di bin kontrola gerîlayên PKKê de ye."*

Di êvara 16ê Tebaxê saet li derdora 20:00an de gerîllayên HPGê ji navenda bajêr vekişîyan, qedexeya derketina derve jî di 17.08.2015an saet 05.00an de hate rakirin. Di wê demê de 4 kes mirin. Li gor ku hate gotin karkerên avahîsazîyê Rahmi Kızıltaş(36) û Abdullah Toprak(26) ku li Mûşê jidayik bûne, ji ber gule reşandina bi ser erebeya wan de hatine kuştin lê derheqê nasnameya her du kesên din de tu agahî nehat bi dest xistin.[9]

---

[9] Li gor Daneyên Navenda Dokumantasonê a TİHVê, di Navbera 16ê Tebaxa 2015 û 16ê Tebaxa 2016an de, Qedexîyên Derketina Derve û Sivîlên Jîyana Xwe ji Dest Dane,21.08.2016

Piştî ku sûretên Kader Kevser Elturkê bû sedema hêrsrabûnê, ji teref parêzgarîya Mûşê derbarê sûret de ev daxwuyanî hat dayîn:

- Hat tespîtkirin ku hin dîmenên jineke endama rêxistina terorê PKKê di medyaya civakî de hatine weşandin, ku ew jin di 10.08.2015an de li bejahîya navçeya parêzgeha me Gimgimê di pevçûneke li dij hêzên me yên ewlehîyê de hate kuştin. Derbarê ew kes an jî kesan de ku dîmen girtine, weşandine û di medyaya civakî de belavkirine, ku ev helwest ji teref rayagiştî û parêzgarîya me nayê qebûlkirin, lêpirsîna edlî û îdarî hatîye destpêkirin

Tahrîkkirina Gel

Piştî ku qedexeya derketina derve ji holê hate rakirin, heyeteke ji Komaleya Mafê Mirova(İHD) çû Mûşê. Heyetê bi kesên ku bûbûn şahidê bûyerên di 15,16 û 17ê Tebaxê pêk hatin û bi kesên ku ji bûyeran zerar dîbûn, hevdîtin kir û ev daneyên hevdîtinan rêz kirin:[10]

- **Kader Kevser Erturk a ku bi kodnavê xwe Ekin Wan piştî ku hate girtin û infazkirin, sûretên wê di medyaya civakî de hatin belavkirin, ji wan dîmenan saw tê girtin.** Mebesta vê tahrîkkirina gel e. Li gor ku me bihîstîye, tiştê ku malbata wê de otopsîyê de dîyê, Kader Kevser Erturk ji kulêmeka xwe birîndar buye û ev birîn ne kujer bûye. Dîsa li gor îfadeya malbata wê di **histûyê wê de kindir hebûye.**

---

[10] Rapora Lêkolîn û Lêgerîna li ser Bûyerên li Navçeya Gimgimê a bi ser Parêzgeha Mûşê ve.

- Parêzgarîyê ya derbarê weşandina bedana tazî ya milîtana jin de go “kê ew dîmen weşandibe, ewê werin tespîtkirin”. Lê belê tiştên berî weşandina dîmenê yên ku “êşkence û ji dervî mûalmela mirovî ne”, parêzgarîyê bo wan xwe li nedîtinê danî. Ev yek nirxên civakî êşandin û saw jê hat girtin.

Di wan hevdîtinên ku heyeta İHDê bi şahidan re pêk anîbûn, rewşa hat jiyîn wisa hat îfadekirin:

- “Em difikirin ku ew îddîayên li ser rûdana pevçûnekê di navbera PKKê û hêzên ewlehîyê de ne rast in, piştî qedexeya derketina derve dengên çekan bilind bûn, qedexeya derketina derve tunebûya jî me yê nizanîbûya ku pevçûn heye an tuneye, gule ketin heya hundirê malên me.”

- “Elektrîk û av hatibûn birrîn.”

-“Navenda Gimgimê bo pevçûnan ne musaid e. Li malên me, li kargehên me gule hatin reşandin. Hişte sûretên wan, qulikên ji ber guleyan bi çavan tên dîtin. Me bi xwe guleyên panzêran dan hav. Bi çekên mîna biksiyan li me reşandin, roket avêtin, malên hin cîranên me qismek jê şewitî, malek cîranekî me bi temamî şewitî, ku ew ji malê derneketibûna ewê jî bişewitîyana.”

- Li avahîyên dewletê yên wek Şopa tu guleyan li Banke û ATM’yên di nav mal û kargehan de ne tuneye ku li wan mal û kargehan gule hatine reşandin, ev agahî ne balkêş e?

- “Di pêvajoya qedexeya derkerina derve de, çi cihên ku lebat lê hebû, gule lê hatîye reşandin, pişt re jî hêzên taybet li ew cihên ku lê hatîye reşandin, li şopa xwînê gerîyan.”

- Di 16ê Tebaxê de teqîneke pir mezin qewimî û bi pişt re pevçûn sivik bûn, tevî ku qedexeya derketina derve bi dawî bû jî nehiştin em nêzî cihê bûyerê bibin, piştî ku em çûn jixwe ceset biribûn, li ser daran û li erdê perçên goşt hebûn, me dît, me sûretên wan kişandin. Me bihîst ku Remezan Kızıltaş û Abdullah Toprakê ku li Gimgimê ikemet dikirin û du kesên bi wan re hatine înfazkirin.”

- “Me bihîst ku du cîranên me hatine kuştin, ew cîranên me bû, hevalên me bûn, em her roj li gel hev bûn, me çay vedixwar, sohbet dikir, nehiştin ku em nêzî cihê bûyerê bibin û cesedan bibînin.”

- Hêzên ewlehîyê di dema ku HPGyî li navendê bûn, li malên xwe, li qereqolan sekinîn, bi pişt re li malên me reşandin.”

Heyeta ku ji parêzer Eren Keskîn, Leman Yurtsever û Nûnerê ÎHDê yê Gimgimê parêzer Rûmet Egît Ozer pêk dihat, çûn Gimgimê û raporek bi navê “Pêveka Rapora li ser Lêkolîn û Lêgerîna Bûyerên ku li Navçeya Parêzgeha Mûşê Gimgimê Pêk Hatine”, weşandin. Di raporê de, tiştên ku qewimîne wek sûcê şer hatin binavkirin û bi sernivîsa **“Lİ GOR HUQÛQA NAVNETEWEYÎ NİRXANDİNA BÛYERÊ”** ev tişt hatin ravekirin:

“Huquqa navneteweyî derbarê tundîtîya li dij jinan da bi salên dûr û direj kêm maye. Di şerê cîhanê yê yekemîn û duyemîn de tevî ku bi milyonan jin rastî tundîtîya cinsî bûne jî, di mahkemeya Tokyo û Nurnberg de a ku piştî şer hate damezirandin, ev tewan nehat darizandin, hat paşgûhkirin. Lê belê di pevçûnan de, yên ku li Rûanda û Bosnayê qewimîn, li gelk jinan tacîz, tecawiz her cûre tundîtîya zayendî, bi taybeti bi saya hewildanên jinan, wek ‘sûcê şer’, ‘sûcê li dij mirovahîyê’ hate binavkirin û des bi darizandin wan hatin kirin.

Herwiha ji teref Dadgeha Cezayê ya Navneteweyî(DCN), her cûre tundîtîya li dij jinan, wek ‘sucê şer’, ‘sûcê li dij mirovahîyê’ hatîye pejirandin. Her çiqas Tirkîye nebûbe alîyekî DCNê jî, sûcê ku li dij Kader Kevser Ertürk (Ekîn Van) pêk hatîye,di wesfê sûcê şer de ye.

- **Dê pevajoya Gimgimê de, li gor pîvanên rêvebirina krîz û karesatan tu rêbazên pêşxistina çareserîyê nehatin ceribandin. Di şûna vê de bi perspektîfeke ewlekarîyê rewş hate nirxandin. Bi taybetî kuştin û teşhîkirina bedena tazî ya Kader Kevser Erturk bû sebebê înfialê.**

- *Di şeran û pevçûnan de tundîtîya li dij jinan wek amûreke şer tê bikaranîn. Bi vî awayî tundîtîya li dij jinan li alîkî, binyada civakî ya gel, wek alîyekî din ê şer, serûbinî dibe.*[11]

---

[11] İHD, Pêveka Rapora li ser Lêkolîn û Lêgerîna Bûyerên ku li Navçeya Parêzgeha Mûşê Gimgimê Pêk Hatine”

Buyera Kader Kevser Erturk bandorek giran li ser gelê heremê hişt. Şahidiya hevpeyvinek Şirnexê jî vi bandorê baş nişandide:

Berî qedandina qedexeyan bi hefteyekê ez diçûm cem, digirîyam, tim digirîyam û min digo” Wer! Vê zarokê nehêl. Tu yê çawa ma bihêlî?”. Çend caran min keça me jî bir, keça me pir bi ser bavê xwe ve bû. Ta sibehê digirîya, ‘’babo wer!” digo, wê wextê biçûk bû, nêzî 3 salî bû. Yekî neçar çawa dinêherî, bavê wê jî wisa li rûyê zaroka me dinêherî... Min go ‘’Veya bi me nede jîyîn, ez ê çi bikim ji nuha û pê ve? Bi tena serê xwe ez ê nikaribim bi vê zarokê re derxim serî- Yanî ma tu nabînî wan çi bi keça apê min kir? Ma we Cizîr nedîye?” Wî go ‘’li qusûrê nener, ku hevalên min mabin ez ê jî bimînim. Ma canê wan ne can e”. Min go ‘’ Zarokên wan tune, hevserê/a wan tune. Yanî tu û ew ne wek hev in. Ewil namûsan min biparêze, pişt re namûsa xelkê biparêze! Çend caran min ji hevserê xwe re go” Ez nabêjim neke, lê belê ne ewqas jî, zaroka te heye şevder nemîne!”. Wî go ‘’ ez te di xim şûna wê jinê, ku tu bûya min ê çi bikira? Bedena te şifî tazi avêtibûna orta kolanê, min ê çi bikira?”. Belê me tim ew tirs jîya, hevserê min pir tesîr girt ji wî sûretî, piştî wî sûretî hema hema jîyana wî serûbinî bû. Û hevserê min di wexta qedexeya derketina kolanan de şehît ket.[12]

---

[12] Serpêhatîyên Jinan ên Koçê, r.32-34,2018, Stenbol.

Farqîn

Silvan


Silvan
X
Toplam Ölüm Sayısı: 49
Sivil
Tanımlanamayan Gençler
PKK Gençlik Yapılanması (YPS)
PKK Militanı (HPG)
Güvenlik Gücü Mensubu
Toplam Ölüm Sayısı
10
5
0
Tem
Oca 2016
Tem
Oca 2017
Tem
Oca 2018
Tem
Oca 2019
Silvan
(49)
Erzurum
Erzincan
Tunceli
Bingöl
Muş
Malatya
Elazığ
Batman
Bitlis
Van
Siirt
Mardin
Adıyaman
Şanlıurfa
Hakkari
Adana
Mersin
Gaziantep
Osmaniye
Kilis
Hatay
Iğdır
Ağrı
Naxçıvan
Qamişlo
Derika Hemko

SİLVAN
Nüfus: 86600

FARQÎN - SİLVAN

NİVÎSÊN SER
DÎWARAN
YEKEM CAR
Lİ FARQÎNÊ
HATİN NİVÎSANDİN

Hê bûyerên Gimgimê neqedîyabûn û hê heyet bo lêgerînan nû ketibûn rêya Gimgimê vê carê li navçeya parêzgeha Amedê Farqînê qedexeya derketna derve hate îlankirin.

Li Farqînê di navbera tarîxa 18-19ê Tebxê, 24-25ê Tebaxê, 13-14ê îlonê, 02-05ê Cotmehê û 03-14ê Mijdarê de qedexeya derkeitna derve 6 caran hate îlankirin.

Di 15ê Tebaxê de, ew wexta ku di medyaya civakî de sûretê bedena bêcan a tazî ya Ekîn Wan hat belavkirin, li Farqînê rêveberîya xweser hate îlankirin. Serokê DBPya Navçeyê Bariş Gulenyuzlu di daxwuyanîya derbarê rêveberîya xweser de ev beyan bi lêv kir:

> *“Xweferzkirinên hukumeta AKPê yên wek her kes ewê di bin emrê min de be û her kes ewê li gor dilê me tevbigere, nayên qebûlkirin. Em naxwazin ku jî Enqereyê werin birêvebirin. Loma jî em dixwazin xwe bi rêveberîyên xwe yên xweser birêvebibin. Û herwiha di vê qada ku em ê birêvebibin de, bi serokê vî gelî Evdella Ocelan re em ê vê sîstemê tetbîq bikin. Ev mafê me yê herî rewa ye. Azadîya serok Apo azadîya gelê Kurdistanê ye. Em wek Meclîsên Bajêr ên Demokratîk ên kesên hibijartî yên ku li Farqînê dijîn, li dij rejîma faşîzan û ne rewa wek rêveberîya xweser a civakê xwe beyan dikin.*
>
> *Li dij rejîma ku dixwaze gel bi tevahî îmha bike, ji îro û pê ve wek gel em bawer dikin ku bi rêveberîya xweser û vînê ewê xwe birêvebibin. Em bang li raya giştî dikin ku, beyana vîna me ya rewa bipejirînin û xwedî lê derkevin. Herwiha em dîyar dikin ku li dij ev rêveberîya me ya xweser a ku em ê wê pêjde bixin,çi êrîş were kirin, em ê bi xwe parastina cewherî bersiv bidin an li dij qatlîameke an jî êrîşeke li ser gel were kirin, em ê bi mafê xwe yê herî rewa bersivê bidin.Gelê Farqînê ewê Farqînê birêvebibe.”*

Ciwanên YDG-Hyî (Tevgera Ciwanê Şoreşger ên Welatparêz) bo rêlibergirtina êrişên dewletê bo rêlibergirtina têketina mehelleyan li Mehelleya Tekelê, Mescîtê û Selahattinê dest bi çêkirina barîkatan û kolandina xendeqan kirin. Piştî ew roja ku qedexeya derketina kolan di 15ê Tebaxê de hate ilankirin û di 17ê Tebaxa 2015an de hate qedandin, di saet 01.00ê şeva **18ê Tebaxê de, ji teref parêzgarîya Amedê li Farqînê qedexeya derketina derva hate îlankirin.** Parêzgarîya Amedê, di daxwûyanîya xwe ya çapemenîyê ya 19.08.2015an de dîyar kir ku bi ekîbeke ku ji 700 kesên wek hêzên taybet û wekîdin yekîneyan pêkhatî, ji saet 05.00ê serê sibê û pê ve li hemû navçeyê dest bi operasyonê kirine. Bi vê operasyonê hemû bajar kete bin dorpêçê û ji nehiştin kes ji derve derbasî navbajêr bibin. Elektîk, av, înternet şebekeyên mobîl birrîn[1] û li ser tiştên ku li navçeyê diqewimin tu agahî veneguhezî derveyî bajêr.

---

[1] RAPORA LÊKOLÎNÊN BÛYERÊN FARQÎNÊ, 26ê Tebaxa 2015an, Sazîyên ku di nava heyetê de bûn:
- Komaleya Mafê Mirovan(İHD), Şaxa Amedê
- Weqfa Mafê Mirovan a Tirkîyê(TİHV), Nûnerîya Amedê
- Baroya Amedê
- Komaleya Huqûqnasên Mezopotamyayê(MHD), Şaxa Amedê
- Odeya Tebîban ya Amedê

Heyet ber bi Farqînê ve ket rê, da ku bûyerên li Farqînê qewimîne, di cih de çavdêrî bike û da ku ew bûyerên ku li Gimgimê qewimîne, li Farqînê neyên dûbarekirin. Lê belê rê li ber têketina bajêr a heyetê hate girtin. Parlementerê HDPê Zîya Pîr, ku ew jî di nav heyetê de bû, hevdîtinên xwe yên bi rayderan re wisa veguhest: “Li herêmê xetên ragihanê qutkirî ne, elektrîk qutkirî ye, em agahîyan wernegirin. Em nuha li ser rêya Farqînê ne. Em bi parêzgarîyê re axivîn, li gorî ifadeyên parêzgarîyê, rewşeke zêdeyî qeweta parêzgarîyê heye. Ferman ji Enqereyê hatîye dayîn.”[2] Astengîya gihiştinê(agahîwergitina ji nav bajêr) heta saet 07.00ê roja 19ê Tebaxa 2015an dom kir.

> *Parêzgarîya Amedê, di 17ê Tebaxê de 20 herêmên li bejahîya Farqînê, Licê, Pasûrê û Dicleyê wek herêmên ewlehîyê îlan kir. 6 deverên ku 55 gundên bi ser Farqînê ve werdigirt nava xwe, ketin nava herêmên ewlehîyê. Beşeke mezin a ji nav van gundan gundên çîyê ne ku li bakûrê navçeyê dimînin. Lê belê gûndên deştê yên ku li bakûr û rojavayê navçeyê bûn jî, kirin nava herêmên ewlehîyê.*

Lê belê piştî ku qedexeya derketina derve hate betalkirin, encax wê demê şênîyên navçeyê dengê xwe dan hisandin. Ahmet Altûnê ku li navçeyê dijî, ji BBCya Tirki re tiştên ku li Farqînê pêk hatin, wisa vegot: *“Em nikarin derkevin şaneşînan. Ji bo ku qetlîam çênebe ji mizgeftan bang hat kirin ku mirov xwe bikin mertalên zindî, lê belê polîsan bi tundî midaxele kir. Li meydana Azîzogluyê agirek pêketî ye. Min xwest ku derkevim şaneşînê û lê binêherim, polîs gule berda şaneşînê. Îro ev der mîna Kobanêyê ye. Ne pevçûn e, li vir herb heye. Ji çar alîyên Farqînê dû bilind dibe.”*

---

[2] http://www.radikal.com.tr/turkiye/sokaga-cikma-yasagi-olan-silvanda-catisma-1-olu-1-yarali-1417402/

İhsan Yilmazê ku bi salan li Farqînê rojnamegerî kirye, li ser neceribandina pêşvebirina çareserîyê ya li gor pîvanên rêvebirina krîz û karesatan ev tişt bi lêv kirin:

> “Ta 9 saetan hêzên ewlehîyê midaxale kir. Pevçûn çêbûn. Tu dibêjî qey Farqîn hatibûye dagirkirin. **Berevajî vê bi saya dîyalogê ev rewş pêkan bû ku bêmirin, bêxesar were derbaskirin. Ev hestîyarî pêk nehat.”**

Di dema pêvajoya qedexeya derketina derve de, li bajarên ku pevçûn lê diqewimîn, kesên nenas ên çekdar an jî birih ku li ser wan pir tişt dihatin bilêvkirin, cara yekem li Farqînê derketin qadan. Şahidan dan dîyarkirin ku, hin çekdarên ku di dema oprasyona dîtine, nedişibîyan polîs û hêzên taybet. Şinîyekî bajêr wiha axivî: **"Ji hêzên taybet xerabtir bûn. Ne dîyar bû ku ji kê re xizmetê dikin. Rûyê wan veşartî ye. Hin jê riha wan dirêj bûn. Wek ku derman xwaribin dinêhêrîn."**

> Şênîyekî ciwan ê bajêr li ser tiştên ku dîtiye wiha axivî: **"Min piçikekî serê xwe di pacê re dirêj kir. Ew kesên ku hatibûn vir ne polîsên normal ên dewletê bûn. Reşgirêdayî, rihdirêj, qet nedişibîyan polîsan. Ez bawer nakim ku ew polîs bûn. Wan bi qîrin got 'zû têkeve hundir!'. Bi ew rihên dirêj tu yê bêjî qeyn ne polîsên dewletê bûn, DAİŞî bûn. Hema ku tu awirên wan ên li mırovan bibîne, tu yê sawê jê bigre."**[3]

Di heyama qedexeyê de Serhat Bîlen (25) ji teref Yekîneyên Karên Taybet hate kuştin. Hanîfe Dûrak (80), Veysî Toraman (60) jî ji ber rageşîya operasyonan bi krîza dil jîyana xwe ji dest dan.

---

[3] http://www.diken.com.tr/sur-izlenimleri-2-buraya-gelenler-devletin-normal-polisleri-degil/

YEŞİL BURDA

Şahid: *Ez li ber vê pacê bûm. Kobra hat li pêşîya vî dîrekê sekinî û dest bi guleberdanê kir. Gule bera hemû malên li pêşya me dan, ew wêran kirin. Pişt re ber bi me ve hatin. Gula bera hemû dikanan dan. Ez dibêjim qeyn bi 6 wesîteyan hatin mehelleya Tekelê. Kepçe jî li pêş wan bû. Wesîteya min da ber xwe û li çep û rast, li dîwar û dîrek xist. Perçe kirin, anîn li vir danîn. Min lê mêze dikir. Êdî min xwe ranegirt û ez derketim derve. Ji kobraya ku li ser qorzîyê sekinî bû, gule berdan min. Cam şikestin û ez li ser wan ketim. Bi zorê min xwe dîsa avêt hindir. Çend gule jî li hindir ketin. Mêrikan hatibûn, me bikujin. Pac bi me re nehiştin, tiştek nehiştin. Li malan reşandin. Pişt re di ber me re buhirîn û çûn. Di dema reşandina li malan de bi tekbîran digotin ‘’Allah-û Ekber’ û merşên wek ‘Ölürüm Türkiyem” digotin. Ne bi tenê min hemû mehelleyê ev dît. Yek din, ew kesê ku wesaîta min perçe kiribû, serdarekî bipaye ber bi wî ve çû û go ‘Xezaya te bimbarek be.’ Wekî din qîrîya û go ‘Benzîn tune?’ Xwuyabû ku dixwestin bişewitînin. Ev hemû min bi xwe bihîstin. Bi vanan re dîn û îman tunebû.”*[4]

---

[4] RAPORA LÊKOLÎNÊN BÛYERÊN FARQÎNÊ, 26ê Tebaxa 2015an,
Sazîyên ku di nava heyetê de bûn:

- Komaleya Mafê Mirovan(İHD), Şaxa Amedê
- Weqfa Mafê Mirovan a Tirkîyê(TİHV), Nûnerîya Amedê
- Baroya Amedê
- Komaleya Huqûqnasên Mezopotamyayê(MHD), Şaxa Amedê
- Odeya Tebîban ya Amedê

Ji 16ê Tebaxa 2015a ve li Farqînê di demên cihê de 6 caran qedexeya derketina derve hate îlankirin. Qedexeya derketina derve ya ku di navbera 3-14ê Mijdara 2015an de hatibû îlankirin, 6emîn qedexe bû, ku 12 rojan dom kir û herî zêde hat tetbîqkirin. Bi vê qedexeyê re pêvajo kete asteke bêveger. Dewletê bi hemû hêzên xwe yên çekdar konseptek bo îmhakirina ew hêzên ku li dij wê li ber xwe didin, xist pratîkê.

Di vê heyamê de tahrîbat, mirin û birîndarîyên herî zêde pêk hatin. Ji bajêr, bi taybetî ji mehelleyên ku pevçûn lê diqewimîn, mirov bi girseyan ji mecbûrî koç kir.

AVUKAT
AVUKAT
AVUKAT

Di tarîxa 3ê Mijdara 2015an de, bi saet 05.00an re, heta fermaneke din, li taxa **Tekel, Mescit û Konakê** qedexeya derketina derve hate îlankirin. Berî qedexeyê sewkîyata muhîmatên herbê, çekên giran, tank, top, leşker, yekîneyên karên taybet û polîsên sivîl hatibû kirin, bi piştî qedexeyê re bi van hemû hêzan û bi alîkarîya hêzên hewayî êrîş destpêkir. Qedexe bi daxwuyanîya qeymeqamê nevçeyê di 14ê Mijdara 2015an de bi saet 14.00ê re hate qedandin. Heta bidawîbûna qedexeyê, li navçeyê şebekeyên mobîlan hatin birrîn.

Di vê heyama qedexeyan de yek ji rûdanên herî girîng **nivîsên li dîwaran** bûn. Hewildana dewletê ya nivîsên li dîwaran ku li Fsrqînê destpê kir, êdî li her deverên pevçûnan dihat dîtin. Ji alikî de dewlet hebûna xwe bi awayekî tehlker teşhîr dikir û ji alîyekî din tunebûna xwe jî îfşa dikir.





Mînakeke nivîsên ser dîwaran li Filistînê derdikeve pêşberî me. Leşkêrên îsraîlê li Xazzeya ku kirine bin dorpêça leşkerî, li dîwaran stêrka Cihûyan xêz dikirin û "em ê di demeke nêzîk de dîsa werin" dinivîsandin.



Di 3ê Mijdara 2015an de li ser cahdeya Amedê, ciwanê bi navê Mislim Tayar(22) bi 4 guleyên ku ji wesaîta zirxî hate berdan, birîndar bû. Tayarê ku li Fakulteya Tipê ya Amade hate dermankirin, digel hemû midaxaleyan can da. Di heman rojê de li mehelleya Tekelê ji teref polîsan ciwanê bi navê Sertîp Polat (20) hate kuştin. Abdulkerim Eleftos (27) û Faysal Korkmaz (40) jî hatin birîndarkirin. Di roja qedexeyê ya dudan de Engîn Gezici (24) li ber mala xwe derb xwar û can da. Dema ku İsmet Gezici (55) li gazîya birazîyê/xwarzîyê xwe çû, ew jî hat kuştin. Di 5ê Mijdarê de Mukaddes Arbağ (33), di 6ê Mijdarê de Ridvan Us (20) û Adnan Bakir (?), di 8ê Mijdarê de Mehmet Emin Çiçek(70), birîndar bûn. Di 9ê Mijdarê de piştî reşandîna li qahweyê Mehmet Gündüz (45) can da, Seyfettin Kurt (44), Kudbettin Çiçek, Abdulsamed Kesici(50) birîndar bûn. Mustafa Sağlam jî li mehelleya Selahattinê ji teref polîsan hate birîndarkirin. Di 11ê Mijdarê de A.G (5) ji ber ku perçeyên bombeavêjê lê ket, can da û İ.Y. jî birîndar bû. Di 12ê Mijdarê de Huseyin Yıldız û di 13ê Mijdarê de Üstün Yıldız birîndar bûn.

Piştî qedexeya derketina kolanan a ku di 18ê Tebaxê de hate İlankirin, rêxistînên sivîl û rojnameger bo lêkolîna bûyerên ku li bajêr qewimîne, çûn Farqînê. Şênîyên bajêr xeternak nedîn ku navê di hevdîtinan de veşêrin; lê belê şahid, piştî bûyerên 3ê û 14ê Mijdarê, bi şertê ku navê wan veşartî bimîne, axivîn. Ev nîşanek herî girîng dîyar dike ku mirov rîska ewlehîyê di asta herî bilind de hisdikin.

Şahidîya li ser kuştina Süleyman Güleç: *Ew azib bû. Market hebû, bi marketê re mijûl bû. Marketa wan li cem qahwexaneyê bû. Jixwe parlementerên me li wir bûn. Ew ji me çêtir dizanin. Hewil dane ku wan xelas kin. Xwe ji wan re kirîye mertal. Ayla Akat li wir bû. , 4 parlementerên me li wir bûn. Wan go ‘’em xwe dexlî ku derê dikin, ew jî bi tank û roketan êrîşî wê dereê dikin.” Helîkopter ji jor de wan tespît dikir. Di dema bûyerê de bi parlementeran re li wir bû. Bi guleyekê, li ser dilê wî xistine. Gule di pişta wî re derketîye... Dema ku me wî derxist eyn wek me bû... Zarok ji nişka ve ketîye. Guleyên van jahrî ne. Ku bighêje xwînê tavilê mirov can dide. Biner, 2-3 kesên din jî eynê di van bûyeran de ji lingên xwe ve birîndar bûyîne. Ji ber vê birînên mêrikan can dane.*

Şahidê 2an: *Guleyek jî li milê min ketîye. Yani bi rastî jî mamoste, guleyên ev M16an hemû jahrî ne. Bi ên din, keleşnîkof an jî G3, yek derbê bixwe tiştek nabe. Yanî birîn fireh in. Birîna M16an tavilê rehet dibe, ji xwînkişîna hundirîn candidin.*

Şahidê 3an: *Ev 12 roj in ez naçim malê. Nû hatim, hemû derîyên min şikandine, leşkeran wisa kirye. , kesê min tune, du zarokên min di hefsê de ne, bi tena serê xwe dimînim. 12 roj in em birçî ne, li kolanan in. Yextîyar im, wan mala min xera kir, wêran kir. Ez ê nuha çawa bikim, hêza min tune. Ji tirsan em li mala xwe jî nikarin bimînin. Li malê elektîk, av tune, gul berdidin, em çawa bimînin! Ma me çi kirye ku leşkerên dewletê derîyên mala me şıkandine û mala me li bin guhê hev xistine! Xwedê heqê me nehêle!*

Şahidê 4an: *Min 4 meh in em li derve ne. Ji 10 rojan carekê zarok tên, dewlet jî li wan derb dike... Em nikarin herin malê. Em perîşan in. Wan mala me xera kir. Ev 4 meh in ne Şaredarîya Bajarê Mezin, ne Şaredarîya Farqînê, ne sazîyên mafê mirovan...Kes bo mexdûrbûna me nehat. Birçîtîya me, nexweşîya me, perîşanîya me... Ku Kurdistan be, li ser seran li ser çavan, lê ku hinek li kêfa xwe binerin... Biner ha Farqîn, here vê jorê gul û gulistan e, li qahweyê bı okeyê dilîzin. Ez li vir birçî me, kirê jî 150 lîrayî çûye 300 lîrayî.*

Kurdistan li ser çavan, lê belê em perîşan bûne. Bêûjdanan mal kirin hedef. Hemû gule ji derve de avêtin, binere li guleyan. Yanî ez hatim û min derî vekir. Leşkeran em derxistibûn, ji çengûrên me de em kişkişandin, derxistin. Li dolaban binêherin şopa guleyan lê ye, hemû ji hemberê de avêtin. Werin li odeyê binehêrin, Xwedê ji wan re nehêle. Hamû cam şikandine, li her derê reşandine. Ji cahdeyên de gule berdidan. Segvan li ser apartmana Azizoğluyê hatibûn bicihkirin. Ev çend car in ku wisa dikin! Li malên gel bê sûc û sebeb reşandine, ne gerîlla li vir hene û ne jî wekî din tu kes. Ma kî li vir eku hûn malên gel bê sû û sebeb didin ber gulan.

Nursel Aydoğan (Parlementera HDPê ya Amedê)

Derîyekî ku neşikest, maleke ku nehat serobînîkirin, tu tiştek nema. Wisa ne êrîş, ne operasyon bû, rast e rast herb bû yanî! Bi 4 hezar hêzên karên taybet hatibûn. Berdûşnî wisa bûn ku li kuştinê gûr bibûn û qahr û kerbek zêde bi wan re bûn. Mirov dikeve malê lê digere ew tiştekî din e. Hûn ê malân bibînin, ketine malan, derî, sarincok şikandine, makîneya cilşoyê ji hev xistine. Yani bi encax bi kîn û qahrê encax wisa bê îzahkirin, bi ti awayê din nayê îzahkirin. Jixwe di malan de mirovek bi tenê jî nemabû. Piştî ku roket avêtên, bombe avêtin cihê ku em lê bûn, em jî tavilê derbasî mehelleya paşî bûn, em fikirîn ku ewder ewle ye, bi rastî jî me li malan yek kes jî nehişt, ku me bihiştaya ewê hemû bihatana kuştin. Li meheleyê bi tenê pisîk man, ji sedî sedê mehelleyê hat valakirin. Roja çarşemê me go bila her kes ji mehelleyê derkeve. Ji ber ku berdûşnî bi temamî aqilavêtî, bi temamî xezeb di çavê wan de hebûn. Bo wan zar û zêç, ciwan, yextîyar ferq nedikir, dibe ku hemû bikuştana.

Em di roja ku pevçûn qewimîn de, li ser ew cehdeya mezin di malekê de bûn. Em li çend mala wisa belav bûbûn. Wê şevê heya sibehê bi sedan gule, bombeavêj, topavêj kirin, mala ku em lê bûn zim zim dilerizî. Me derî xiştik kiribû... ku me li wê derê dîtibûna ewê qetlîameke mezin pêk bihata, ewê me hemû bikuştana. Em çûn mehelleya konakê ku elektrîk lê hebû û şebekeyên telefonan lê dikişand. Xwedê rê tu kesî nede, pir xerab bû bi rastî!

Min li vir peyam şand ji qeymeqam re, min nivîsi û go: “Qeymeqam Beg, li vê derê rewşeke xof heye, rewş ji tiştê ku tu texmîn dikî û gûman dikî, bi gelekî vahîmtir e, bi gelekî xerabtir e, her dem her tişt dibe ku biqewime. Em li mehelleya Mescîdê ne.

TÜRK SEN
ÖVÜN
DEGİLSEN
İTAAT ET
26

Digel wê jî ji jor de agir berdidan cihê ku em lê bûn, bi helîkopteran dişopandin.Me ji ew cihê ku em lê bûn, Suleyman Güleçê ku segvanan ji dibistanê bi gule berdanê ew kuşt, xist nav bettanîyê û tavilê bir ew alîyê kêlekê, danî ser kevirê ku di hundirê mizgeftê de mirî li ser tên şuştin, ew mizgefta ku 50 metre li hêla din bû. Jixwe li ew dera ku derb lê ketibû wefat kiribû. Min lê nêherî damarê wî hilnediavêt. Tişkî din cihê ku em lê bûn, ez texmîn dikim ku koordînat dabûn, ji jor de topên hewanê diavêtin bexçeyê. Bi pişt re em çûn mizgeftê, li derdora mizgeftê topên hewanê reşandin, her derên mizgeftê tije bûn ji perçeyan. Tiştekî sawnak bû bi rastî.

Murat Ateş (Serokê Komaleya Muxtaran)

Di roja nehemîn a qedexeya derketina derve de qeymeqamîyê anons kir bo ku sivîl ji mehelleyê derkevin; bo rojekê biryara agirbestê derxistin; di wê navberê de ên ku derketin derketin, ên ku derneketin di hindir de man. Li gor agahîyên ku min ji hevalên xwe yên muxtar wergirtin, ez dikarim bibêjim ku ji %95ên mirovan derketin lê belê beşa %5an di malê xwe de man. Ew jî ên nexweş, ketî bûn an jî ew kes bûn ku ji ber sedemên aborî malên xwe terk nekirin. Li temamê Farqînê 25 hezar kesî koç kir. Qismek ji van koçî meheleyên jor, qismek ji wan koçî Bismil, Êlih, Amedê û qismek jê jî koçî Mersîn û Edeneyê kir. Ev her sê mehelleyanan, nêzî ji sisêyan yekê nufusa Farqînê ye yanî bi qasî 14.365an bû. Berî ananosa roja nehemîn a qedexeya derketina derve ji %30 mehelleyê li mala xwe bûn, lê belê piştî anonsa ji %95 derketin. Li Farqînê yên herî maxdûr, ên herî xizan li van mehelleyên ku ji xanîyên şevnişîn pêk hatine, dijîn. Bi taybetî malbatên ku rewşa wan a aborî xerab in, di van pevçûnan de madî-manewî zerar gihişt wan. Em vê jî dupat bikin, hin kesên keysbaz li Farqînê di dema qedexeya derketina derve de kirê kirin 1000 lîre û piştî qedandina qedexeyê an jî bo ku piştî tahmîrê kes venegere mala xwe peyman bo salekê bi wan dane navîşkirin.

Abdulmenaf MANAZ (Serokê CHPê yê Navçeya Farqînê)

Ez 60 salî me, min tiştekî wisa nedîtiye. Li Filistînê li İsraîlê jî tiştekî wisa neqewimîye heta nuha. Hedefa wan hê ne dîyar e nuha. Mala min li jêra gir e û li wê derê 11 tank hene. Bi kêfa xwe direşînin. Ji bexçê xwe nikarim derkevim derve. Nişane guleyan tune, li kê rast were ew adres e. Li ser vê maseyê du alî hene; yek jê Evdalla Ocalan e, ê din jî Erdogan e. Gel di rewşeke perîşan de ye...

Guh nadin xwuşk û dayîktîyê, çêran dikin. Bi unîformayê dewletê ne bawer bin, ewqas nedikir. Rayedarên dewletê iddîa dikin ku wan li vir ewlehîya hemwelatîyên sivîl parastine. Berevajî wê li vê derê 2-3 gerîlla mirin, ên din hemû hemwelatîyên sivîl bûn. Derbarê van bûyeran de tiştek tenê heye ku were gotin: Bila wek berê pêvajoya çareserîyê destpê bike. Ku Erdogan bi Ocalan re biaxive ne cêşa Osmanîyan li vir dimîne û ne jî Daîş dimîne. Em bê destmêj Qurana Kerîm naxin destê xwe, ew diçin li qûrsên Qûranê direşînin, li mizgeftan direşînin. Di van bûyerên dawîyê de me yekîneyên Esedullahê nedît lê belê cara din ku em çûn me dî. Yek ji ew kesên nav yekêneyên karên taybet bi Erebî diaxivî, bi Tirkî nizanîbû. Di sûretên medyaya civakî de jixwe tê dîtin.[5]

Nirxandina **MAZLUM-DERê**

Bandorên derûnî yên herî mezin ên şer û pevçûnan dîyardeya koçê ye. Li gor agahîyên ku ji çavkanîyên heremî hatine wergirtin, ji 3 mehelleyan nêzî 25.000 hezar mirov mala xwe terk kirine, koçî meheleyê Farqînê yên din an jî koçî parêzgehên cûda kirine. Di encama koçê de li van mehelleyan faalîyetên ticarî rawestîyaye û nêzî 5000 xwendevan ji mafê xwe yê esasî yê perwerdehê maye.

Nivîsên ser dîwaran ên ku ji teref hêzên ewlehîyê bi hestên dijminahîyê hatine nivîsin û wêrankirina hin mala ji teref wan delîlê vê ye ku ew ji alîyê derûnî ve ne kesên temam in, derûnîya wan zerareke mazin dîye û ne di wê rewşê de ne ku xizmetên ewlehîya civakî bicih bînin. Dema ku em li pirahî û naveroka nivîsên ser dîwaran binehêrin, ewê ew guman xûrt bibe ku ev yek ne tiştekî ji rêzê ye ji ber ku ew nivîs li navendên cûda bi heman naverokê ne. Ev nivîs rê didin ku li dij sivîlen li herêmên pevçûnan nefreteke kûr heye. Şênîyên mehelleyan ên kû duçarî tiştên kû hatin jîyandin û nivîsan bûn, li hember desthilatdarîyê meyildarê hestên pênebawerî û jêbinefretîyê ne.

---

[5] Rapora Lêkolîna Binpêkirina Mafên ku Li Navçeya Parêzgeha Amedê Farqîn Pêk Hatine, MAZLUMDER, 17.11.2015

Nirxandina **HDPê**

Di van dîmenan de polîsên karên taybet ên ku rûpoşkirî diçin navçeyê, li dîwaran nivîsin wiha netewperest, nijatperest û zayendperest ku gef jî dadihundirandin, hatin nivîsandin: *“Dewlet hat”, “Bila bêhna xwîne bifûre”, “Xwîn gihişt diranê gur, bitirsin”, “Keçno em hatin, ketin Şikeftên we”, “TC li vir e, bêjî li ku ne”, ‘’bibin zilam”, “Yekîneyên Esedullahê li vir in”, “Dewleta te heye, xiyanetê neke”, “TC çi bêje, ew e”, “Tu Tirk be xwe bipesinîn, ne Tirk be îteatê bike”.*

Dewlet Hat

Nivîsa “Dewlet hat’’ tê wateya îtirafkirina dewletê ya ku “ez tunebûm lê nuha ez li vir im’’ û “bi saya tundîtiyê li vir im’’. Ew derbirandin e ku dewletê hebûna dewletê bo Kurdan bi ti awayên “rewa” domdar nekirîye. Ew hêza ku bi vê tundîtîyê xwe ferz dike, bendewarîya wê îteateke bêsînor e.

Sloganên ku li Farqînê hatin nivîsîn, hîv-stêrk û sê heyvikên hatin xêzkirin... bi awayekî aşkere rêdide ku ew mîtosa girîng a netewperestîya Tirktîyê a ku bû sedemê hafızaya qetlîaman, xwe bibîrtîne û xwe li vir bi cih dike. Herwiha êrişkarîya dewletê ya gefxwûr jî derpêş dike.

“Keçno em hatin, ketin şekeftên we”

Yek ji mîtosên netewdewletan dagirkirina bedena jinê ye...Ew nivîsên zayendperest kurtebira nêrîna dewletêya li jinan e û ji nû ve hilberîna vê ramanê ye...

“Yekîneyên Esedullah li vir in”

Yekîneyên Esedullah kî ne? Ji kê pêk tên?... ‘Yekîneyên Esedullah’... Careke din hin angaşt hatin rojevê ku ev yekîneyanan li dervî însîyatîfa parêzgar û qeymeqamên herêmê tevdigerin û raste rast bi ser serokomarîyê ve ne. Roja duşema 21ê Tebaxê li gor nûçeyeke ku di rojnameya Evrenselê de hatîye çapkirin, parlementerên ku di nav heyetê debûn, bal kişandina ser vê : ‘’Li vê derê yêkîneyên rasterast bi ser serokkomarîyê ve hene ku guh nadin parêzgarîyê, qeymeqamîyê û hêzên zêrevanî.” û li gor îfadeyên heyetê hin ji ew kesên ku kincên yekîneyên karên taybet li xwe kiribûn, bi Tirkî nizanîbûn û herwiha heman kesên ku behsa wan têkirin, li Gimgimê jî bûyîne.[6]

---

[6] Rapora Lêkolînên li ser Bûyerên di Navbera 03 - 04ê Mijdara 2015an de li Farqîna Amedê Pêkhatine,
Navenda Giştî ya HDPê, 18ê Mijdara 2015an


303.SK
TÜRK'ÜN GÜCÜNÜ
GÖRECEKSİNİZ
TC ile şaka OLMAZ...
PİÇLER


esedullah
#PÖH#

Sûr

Sur


Diyarbakır (merkez)
Toplam Ölüm Sayısı: 252
🟦 Sivil
🟦 Tanımlanamayan Gençler
🟨 PKK Gençlik Yapılanması (YPS)
🟩 PKK Militanı (HPG)
🟥 Güvenlik Gücü Mensubu
Toplam Ölüm Sayısı
40
20
0
Tem
Oca 2016
Tem
Oca 2017
Tem
Oca 2018
Tem
Oca 2019
X
Diyarbakır (merkez)
(252)
Sivas
Erzincan
Ağrı
Tunceli
Bingöl
Muş
Malatya
Elazığ
Bitlis
Van
Siirt
Batman
Mardin
Hakkari
Adıyaman
Şanlıurfa
Gaziantep
Kahramanmaraş
Adana
Mersin
Kilis
Hatay
Derîka Hemko
دهوك
الموصل
الحسكة
حلب
منبج

SÛR - SUR

QEDEXEYA HERÎ DEMDÎRÊJ

Meclîsa Gel a Sûrê di 14ê Tebaxa 2015an de li navçeya Amedê Sûrê dîyar kir ku ew êdî sazîyên dewletê yên kû bi konsepta şerê giştî dixwazin wan îmha bikin, rewa nabînin û bi rêveberîya xweser dixwazin xwe bi xwe birêve bibin.

Piştî ku rejîmê bi tundîtîyê bersiv da daxwaza xwerêvebirnê û zext zêde kirin, hêzên herêmî li dij têketina hêzên rejîmê bo jîngehên xwe barîkat çêkirin.

Piştî ku cara yekem di 6-7ê îlona 2015an de qedexeya derketina derve hate îlankirin, dîsa di tarîxa 13-14ê îlonê û 10-13ê Cotmehê de qedexe hat tetbîqkirin. Di navbera tarîxa 28-30ê Mijdarê de li Sûrê qedexeya derketina derve ya 4emîn hat îlankirin. Qedexeya derketina derve ya 5emîn û 6emîn jî di tarîxa 2ê Kanûna Ewel de destpê kir. Piştî ku di 10ê Kanûna Ewel de bo demeke kin qedexeya derketina derve hat rawestandin, dîsa di 11ê Kanûna Ewel de destpê kir. Û 103 rojan bênavber dom kir.

Di meha tebaxê de di navbera hêzên heremî û polîsan de pevçûn destpê kirin û her ku çû wergerî pêleke tundîtîyê ku tim lê zêde dîbû û saw jê dihat girtin. Di Kanûna Ewel a 2015an de piştî ku Hêzên Çekdar ên Tirk(TSK) bi çekên wek tank, top, helîkopter û hwd çekên ku bi tenê di şerên konvansîyel de tên bikaranîn, êrîş kir, 6 mehelleyên Sûra ku xwedîya dîroka 7 hezar salî ye, hilweşîya. 24 hezar mirov koç kir, bi dehan sîvîl can da.

Dema ku Tahîr Elçîyê Serokê Baroya Amedê di 28ê Mijdara 2015an de li ber minareya 4 ling bo rawestandina pevçûnan û bo zerarnedayîna avahîyên dîrokî daxwuyanî da çapemenîyê, ji serê xwe de derb lê ket û hat qetilkirin. Berî ku li ber minareyê derb li Tahir Elçi keve, gotinên wî yên dawî wiha bûn:

Berî bi salan me dîmenên bombekirina ji teref Talîban a peykerê Buda yê li Efganîstanê bi saw şopand. Dîsa di çend salên dawî de ew komên barbar ku wek DAİŞ tên binavkirin li Palmîrayê, Misrê, li welatê Êzîdîyan Şengalê , ew suîqastên wan ên li dijî bermahîyên mirovî, bombekirinên wan her tim me bi saw û keser dişopandin. Û wek civaka Tirkîyê me tim wisa digot ‘’ Eman bila vana ji me dûr bin.’’ Mixabin di demeke kurt de li dij berhemên me yên dîrokî, li dij nirxên me yên dîrokî ji heman hewildan pêk hatin. Vê gava di vî cihê Amedê yê herêma dîrokî ya nav Sûrê de, di vî cihê xwedîyê dîrokeke 9 hezar salî de, mizgeft, dêr û hîn wekî din berhemên dîrokî hene. Dema ku Amed tê gotin, tiştê ku herî zêde tê ber çavê me, tiştê ku herî zêd bi navê Amedê bibîr tê,



tiştê ku herî zêde di zihnê me de sombolîze bûye Minareya çar ling e, mixabin du roj berê, wek ku hûn dibînin, wan ji lingê wê de ew hingaftin. Em vê dibêjin: “Minareya dîrokî ya çar ling bang li mirovahîyê dike. Wan ji lingên min de ez hingaftim; min çiqas şer û çiqas bobelat dîtin, lê belê wisa xiyanet min nedît” ji me re dibêje. Ev berhema dîrokî mînakeke tekane ya li Anatolyayê ye. Minekeke dinê ya ji vê li cîhanê tuneye. Li gor salnameyên Amedê, li gor nivîstekan berî Îslamê hatiya avakirin, eletexmînî wek qûleya naqosê hatîye sêwirandin. Lê belê piştî İslmiyetê, piştî fetihkirinê, di dema Hikimdarîya Akkoyunîyan de ji teref Siltan Kasim ve Mizgefta Mutahar a li kêleka me hatîye avakirin û heya îro ji gelek bobelatan sax xelas bûye ev berhem.”

...Em dixwazin ji vir bang bikin. Em operasyonan, çekan, pevçûnan li vî mekanê dîrokî yê mirovahîyê yê hevpar naxwazîn, ku ev cihê qedîm gelek şaristanî vehewandiye, bûye mal ji wan re. Em dixwazin ku şer, operasyon, pevçûn, çek ji vê qadê dûr bin. Bi vê mebestê îro bi hevalên xwe re, bi hevalên xwe yên baroya Amadê re em li vir in. Bo nîşandana berteka xwe ya demokratîk em li vir in. Em vê helwestê, ev çalakîya tundîtîya ya li dij dîrokê, vê sûîkast û bêrêzîya li dij nirxeke dîrokî şermezar dikin.





HIDR





Tevî ku di 9ê Adara 2016 de pevçûn qedîyabûn jî, li hin mehelleyên Sûrê qedexe dom kir. Di 22ê Gulana 2016an de, 172 roj bi pişt re li mehelleya Fatîh Paşa'yê, Dabanoğlu'yê û Savaşê li 14 kolanân qedexeya derketina derve hate betalkirin. Lê belê li deverên din qedexe dom kir. Ev qedexe hat tomarkirin ku di cihanê de maweya wê ya herî dirêj e. Dema ku ev pirtûk di 7ê Pûşpera 2019an de dihat amadekirin, li 6 mehelleyan qedexe berdewambû.

Li Meheleya Cevat Paşa’yê, Fatîh Paşa’yê, Dabanoğlu’yê, Hasırlı’yê, Cemal Yılmaz’yê û Savaş’ê

Bi îlankirina qedexeya derketina derva ya 2ê Kanûna Ewel a 2015an re 25 hezar kesên ku li van mehelleyan dijîyan, ji cihên xwe hatin kirin. Piştî ku mehelle hatin valakirin, hemû kolanên navberê bi blokên betonê hate girtin û nehiştin şênîyên mehellê vegerin malên xwe.

Di hejmara Rojnameya Resmî ya 25ê Adara 2017an de hat weşandin ku bi biryara Lijneya Wezîran 6 hezar û 300 parsêlên ji 7 hezar û 742 parsêlên Sûrê ketin ber "îstimlaqkirina lezgîn". Bi vê biryarê re nêzî ji %80'yî bajêr hate îstimlaqkirin. Di projeya Wezareta Hawirdorîyê û Bajarwarîyê de Plana Parastina Avawerîyê nehatîye rahînandin û herwiha bi guhertina planê re warên arastî yê bajarwarîyê jî hatîye pelaştin. Xwedîyên milkan bi biryara îstimlaqkirinê re him ji cihê xwe hatin kirin him jî bê mal hatin hiştin.

Piştî 6 meheleyên qedexe yên Sûrê li Lalabey'ê û Alipaşa'yê xerakirin destpê kir. Projeya veguherîna bajarwarîyê ya ku di 2009an de ji ber dijderketina gel û jêvekşîna Şaredarîyê nehatibû rahînandin, bi saya rewşa awarte dîsa hat destpêkirin. Bêyî destûra xwedîyên milkan, xanî yek bi yek hatin xerakirin, bi hezaran mirov bêmal hatin hiştin. Ji bajarê herî kevnar yê cîhanê û yê ji teref UNESCO'yê wek cihê parastî hatiye pejirandin, xakeke repî rast ma.

Di roja çarşema **17ê Sebata 2016an** de ku hê operasyon dom dikir, Mazlûm Dolanê muhabîrê Ajansa Nûçeyan a Dicleyê li wê derê nûçe dişopandin. Dolan bi SMS'an rewşa wê derê bo ajansan wisa vediguhest:

Saet: 12.56

"Rewş xerab e. Em di jêrzemîneke Apartmanan de ne. Ez bi malbatan re me, di demeke nêzîk de rewşeke mîna ya Cizîre dibe ku li vir jî pêk were. Pevçûn pir gurr in, cihê ku em lê ne bi gelekî tê bombekirin, bi hewan û tankan lê dididn. Bi anonsan ' ji hewa da em ê li we hemîyan din, em ê bikujin', digotin. Li xwe miqate bin, silav bo hevalan."

Saet 14.57

"Birîndar hene. Ên rewşa wan giran jî hene. Cihê ku ez lê me 30 kes hene. Li cihên din jî di zik hev de 200 kes hene. Qumatk û êxtîyar hene. Qumatkên 4 mehî jî hene. Pirsgirêke şarjê heye."

Di 26ê Sibatê 2016an de Remzîye Tosûna ku yek ji sivîlên li Surê asêmayî bû, telefonî Ajansa Nûçegihana Dicleyê kir û ev veguhestin: "Korîdora çi? Em nikarin wê rîskî bidin berxwe ku rahêjin zarokên xwe û derkevin ber guleyan. Ku heyet were rahêja me, em ê derkevin. Ya na em li vir bimrin çêtir e. Qedexe û dorpêç bila were betalki-

> rin, em ê wisa derkevin, mirovên li Sûrê bêxwedî nehêlin.'' Di dema vê daxwîyanîyê de dengên gelek teqînan dihatin.

Di 27ê Sebat 2016de Remzîya Tosun dîsa telefonî DİHAyê(Ajansa Nûçegihana Dicleyê) kir û ev veguhestin:

> Ne li qada ku em lê ne dikeve raste rast li apartmana kû em tê de ne, dikevin. Îro roja dawî ye. Ya têkevênê ya jî bihêliin ji mirinê re. Ev zilm e, wahşetî ye... Ji bo hemû kesên ku li Sûrê ne îro roja dawî ye, her kes bi qetlîamê re rû bi rû ma ye. Heger ku em li vir bimrin bila tu kes neyê. .. Zarokên min şîyar in. Ji tirsan digrîn. Dibêjin 'em ê îro bimrin, bimrin'. Zaroka min a 9 salî xwe ji mirinê re amade kirye. Dibêje 'dayê netirse, ji xwe em ê bimrin!'. Ji saet 4ê sibehê de ye bi tankan li apartmana me didin. Em li qatê herî jêr in. Ku hûn bibînin, bi rastî jî hûnê şaş bimînin, hunê bibêjin 'hûn çawa li vir zindî man?'. Bi tankan lê tê dayîn... Bi rastî jî ku em bimrin, me hemû malbatên li vir wisa biryar da ku bila kes neyê cenazeyên me. Bombe, tank ma çi bikarnaynin! Heger ku em ji vê rewşê xelas bibin, em ê apartmanê rê we bidin, bê ka di çi rewşê de ye. Em şaş dimînin ku heya nuha em çawa nemirin. Em 6 kes li kêleka hev in. 3 mezin û 3 zarok... Hevalê/a ku li kêleka min e naxwaze qet bi we re biaxive. Dibêje ''me bi mirinê re rû bi rû hiştin'.

Şahidê/a/a 1ê: Em baş in. Pirsgirêka me, bavê min 65 salî ye. Bîst salan li gund wek kevjalan xebitî, ji axê, ji herîyê ji xwe re malek çêkir. Di salên 90î de li hêsirên çavên bavê min nenêhêrîn, li ber çavên wî agir bera mala wî, keda wî ya 20 salan, dan. Bavê min koçî Sûrê kir, mala me di nav cihên pevçûnan de ma. Mala me hê jî nîvcomayî bû, mitfaxa me biçûk bû. Îsal bavê min mitfaxa me mezin kir. Mala me ya ku di 20 salan de me wê temam nekir, vê carê bi topan rûxandin. Bavê min 40 salî bo ku maleke wî çê bibe xebitî, di her carê de ruxandin"

EuroCap
By KOÇ

Şahidê/a 2an: *Di şeveke pevçûnên gurr de mêrê min ne li malê bû. Ez raneketim, min xwest ku rahêjim zarokê xwe û herim li komirdankê xwe veşêrim., wê gavê guleyek li caman ket. Bi wî dengî re zarokên min veciniqîn. Keça min a biçûk verşîya. Bi zorê em daketin komirdankê ne derîyekî komirdankê hebû ne ji cihekî wê yê ku hewê bistîne. Wê şevê gişî keça min verşîya.Heya rojekê wisa her derê me di verşîyê de mayî li bende mêrê xwe sekinîm, daku were me ji mehelleyê derxe. Ez wê heyamê ducanî bûm ji ber stresê xwîn ji min dihat. Pişti ku em ji mehelleyê derketin, zarokên min hê jî doşeka xwe şil dikin , lawê min ê mezin naaxive, zimanê wî dialiqe. Çendek berê em çûn me li malê nêherî, me dît ku mala me bi temamî hatîye şewitandin. Cardin xwîn ji min hat, wexta ku me çû li malê nêherî. Lê belê ez ji ser hişê xwe ve çûme û ji wê derê bi betenîyeke nîvşewitî min birine nexweşxaneyê. Bijîşk ji min re go, rîska te ya beravêtinê mezin e. Bi mala me ya din re têkilîya me ya hestyarî hebû. Ez nuha li malê pir bê kêf im, ne dikarim bi zarokên xwe re mijûl bibim, ne jî guh didim xwarin û vexwarina xwe. Pir pir tahdê didim wan.*

Şahidê/a 3yan: Ez nikarim herim Sûrê ji ber ku li her derê bîranînên lawê min heye. Bi wextê re dibe ku herim...

Şahidê/a 4an: Ewil ji helikopterê gule berdan,piştre segvanan gule berdan. . Rojekê ez diçum malê, gule di ber min re çû, min xwe avêt erdê, min xwe neavêtibûya, ewê derb li min ketibûya. Ew firneya hema li pîşya mala me, rojekê lawê xwedîyê firnê bo berhevkirina textên li derve derket, bi perçeyên topê yên ku ji jor de hatin, li ber çavê me hate kuştin. Me nexwest ku em derkevin. Min go ku ez li vir bimrim jî ez dernakevim. Min dev ji mala xwe bernedida, lê belê ji jor de ewqas bombe dibarandin êdî min nêherî ku nema diqede, di roja 27emîn de mecbûr mam, derketim. Em 3 malbat,bi giştî 13 kes derketin. Em di ew qulikan re derketin, di dîwaran re, di hewşan re hatibûn vekirin.

Şahidê/a 5an: Wexta min telefonî 155ê(hewar polîs), jixwe me tim telefon dikir, ew kesê ku telefon vekir jimin re go ‘Xanimê ji tank û topan tiştek ji dengê te nayê fahmkirin’. Ez jî hêrs bûm, min go ‘ ew tank û top ên ku hûn diavêjin, ez çi bikim!.’ Ew kû telefon vekir go ‘hûn di hundir de ne?, Hûn çend kes in? ‘ Min jî go ‘erê em di hundir de ne, em nêzî sed kesÎ ne, werin me derxin.’ Wekta ku em derketin, em di ew qulên dîwaran re derketin. Wekta ku em derketin tuxla bi me ve xişiqîn, kincên me sor bibûn. Polîsan di jêderketinê de ji min re go ‘’xwîn li ser te heye, te rahiştîye birîndaran?’ ez bi wan re xeyidîm. Wexta ku min go ‘ez diya sê zarokan im, dibe ku gemarî bûbe”, polîsan go ‘vê bigrin’. Min birin hundirê Otela Classê. Bi cîhazê kontrol kirin, teştek nedîtin û serbest berdan. Wê wextê helîkopteran ji jor de segvanan ji cihên bilin de beyî ku bêjin ev zaroke sivîl e, gula berdidan. Di navbera mala min û polîsan de bi qasî 50 metreyî hebû. Eletexmîn gule berdidan. Min dît ku em ê bimrin, min rahişt zarokên xwe û heya deh rojan ez di komirdankê de mam. Bi piştî 27 rojan min dît ku nabe, ewê zarokên min bimrin, min xwe ranegirt, wexta ku min li çavên zarokên xwe dinêherî agir bi kezeba min diket, min nêherî ku êdî nabe ez derketim. Zarokên min ewas bandor girtibûn ku heta dewra dudan an dibistanê bi mamostê xwe re neaxivîne, neketine dersê. Hê jî her ku dengek tê dibêjin ‘dayê em ê bimrin dayê!’ Bi berî hefteyekê min çû mala xwe nêherî, min dît ku mala min şewitandine, wêran kirine, 4 odek û mitfaxa wê bûna xwelî.

Şahidê/a 6an: Sibeheke ku em ji xewê rabûn me dît ku li mehelleya me li kolana me, kesên nenas ên birih, digerin. Ew mirov hatin bîra me ku li Surîyeyê serên wan hatin jêkirin, tecawiz li wan hate kirin. Me ji mala xwe ti eşya ranehiştê, bi kincê li ser xwe me mala xwe terikand.

Şahidê/a 7an: Mala me li mehelleya Fatîhpaşa'yê bû. Ez 65 salî me. Wexta ku pevçûn destpê kir, pştî ku min du zarokên xwe ji mehelleyê derxist, jiber ku min nedixwest dev ji mala xwe berdim, heta 2 mehan bi sê jinên wek min re di qatê koxikê de mam. Pirsgirêka me ya xwarin û avê çêbû lê belê jiber ku polîsan her tiştên ku liv pê diket, dikir hedef, bi tu awayî em derneketin derve. Bo xwegermkirinê tiştekî me tunebû, bedena hevala me ya nexweşa şekir ji ber ku germ bû, me wê himbêz dikir û xwe germ dikir.

Şahidê/a 8an: Polîsan li ser mala hemberî me kozik çêkirin. Wexta ku zarokên min derketin şaneşînê, polîsan ji wan re dan çêran. Çend caran bombeyên xazê avêtin şaneşîna me. Şewq davêtîn odeya me ya nivînan. Tu ji evanan ne girîng e lê belê ew mirovên ku wan ew kuştin ez dikim û nakim ji bîra min naçe. Wexta ku ez mirovên din difikirim, dîsa jî ûjdanê min qebûl nake ku ez li mala xwe me û tiştek bi mala min nehatîye.

SUR
JÖH BURDA
SİZ NERDESİNİZ
OĞUL
LAL
ASLIM

Şahidê/a 9an: Pêvajoyê min pir êşand, qet nikarim normal bim. Tim bêhizûr û esabî me, ev şeş meh in ku nakevim cilan. Helwetsa min a li hember hevserê min bûye tund. Lawê min ê 9 salî bi xwe de berdide.

Şahidê/a 10an: Divîye wan dest zixurekê Sûrê jî nedabûna. Biranînên me, jîyarên me wan kirin xirbe. Mala me ya ku me dil nedikir bizmerekî pê de bikutin, bi kamyonên harfîyatê wan vala çemê Dicleyê kir.

Şahidê/a 11an: ji Pûşpera 2015an ve ihaleya blokên betonê vebû. Ez jî tevlî îhaleyê bûm lê belê min nizanî bû bo çi ye. Piştî ku ev pêvajo qewimî, min fahm kir ku bo vê ye.

Rêxistina Efuyê ya Navneteweyî di rapora xwe ya binavê “**Mafê Vegerîna Şênîyên Sûrê yên Jicihkirî û Bêmilkkirî**’’ de, bal kişand ser evanan: Rayedaran bi saya rewşa awarte, wek perçeyek ji êrîşên berfireh û sîstemetîk yên li dij mixalîfan, bi rêya girtina organên çapemenîya Kurdan, girtina rojnamegeran, bi cihkirna qeyûman li cihên cûda yên herêmê di şûna kesên hilbijartî de, dawîlêanîna bi awayekî girsî ya li çalakîyên rêxistinên sivîl, Kurdên mixalîf kirin armanc.

Malbatên jicihkirî yên ku li bajêr dijîn ji teref du aktorên girîng, Şaredarîya Sûrê û ya Bajarê Mezin ê Amedê, alîkarî werdigirtin. Li şûna hevserokên van şaredarîyan ji teref hukûmetê qeyûm hat bicihkirin û dîsa Rêxistinên sivîl yên ku alîkarî û piştgirî didan kesên jicihkirî hatin girtin.

Jiber ku lêpirsîneke bibandor nayê meşandin û jiber ifadeyên ne wek hev her çiqas rê li ber agahîyên rast û aşkere yên li ser hejmara bûyerên bi mirinê qewimîne digre jî, Li Cizîrê piştî qedexeya derve, di Îlona 2015an de ev lêgerîna ku Rêxistina Efûyê ya

Navneteweyî kirye, aşkere dike ku hêzên ewlehîyê di dema qedexeya derketine derve de çekên agirbar biîhtîyat bikarneanîne û oprasyonên wan ne bo binçavkirine çekdaran bileqs bo kuştinê pêk hatine anîn. **Di nav mirîyên dema sepandına qedexeya derketina derve de zarok û Extîyar jî hebûn ku nepêkan e, tevlî şer bûbin**.

Wek ku li Sûrê qewimî, li hemû bajarên ku qedexeya derketina derve demeke direj lê hat sependin, di dema bikaranîna topên giran û opresyaonên hêzên ewlehîyê de û bi pişt re, hîmsazî û avahî bi piranî rûxîyan, **hema hema hemû nufûsa ew cihan bi zorê ji cih hate kirin...** Rayedarên Şaredarîya Sûrê bo Rêxistîna Efûyê ya Navneteweyî vegot ku nêzî 40 hezar mirovî bi darê zorê ji cihê xwe hatine kirin.



Piştî qedandina pevçûnanên li Sûrê bo ji nûve avakirina navçeyê hema hema hemû avahîyên wê derê hatin îstimlaqkirin û pirên avahîya jixwe rûxîyayî bû. Hukûmet li cihên ku qedexeya derketina derve lê dihat sepandin, bi hinceta ku wê noqateyên kontrolê yê polîsan were avakirin, bo navendên wek Cizîr, Silopî û Geverê biryara "îstimlaqkirina lezgîn" wergirt.

Dema ku bi awayekî giştî li pêvajoya herêmê were nêherîn, ewê were têgihiştin ku planek bo dabînkirina kontrolê bi rêya guhertina hîmsazî û veguhestina nifûsê û ji cihkirina ew kesên ku li ew deverên dabeşa behsê rûniştî û kavilkirina ew cihan, ji berê de hatîye amadekirin.

Pierre Nora:Mekanên hafizayê vê îfade dike ku kesên berê li wê derê dijîyan û îro li wir najîn. Bîranînên, brewerîyên, serpêhatîyên û rabirdûyên li dû kesên çûyî mane wê derê dike mekanê hafizayê. Ew ne li wir in, lê belê ew der wek cihê wan ê bîrewerîyê heye.

Andrew G. Ryden: Heta hevbadorîya kûr a bi cih re, mirov xwe bi têgehên ew cihan, li gor ew cihan pênase dike, ev rewş ku bêhtir were berfirehkirin, mirov, bêyî ku cihên hawîrdora wan pêçaye, bi rastî jî dibe ku têkevin rewşekê ku nikaribin îfade bikin, ew kî ne.

Bismil-Bağlar

Lice-Dicle


Bismil
Toplam Ölüm Sayısı: 13
Sivil
PKK Militanı (HPG)
Tanımlanamayan Gençler
Güvenlik Gücü Mensubu
PKK Gençlik Yapılanması (YPS)
Toplam Ölüm Sayısı
4
2
0
Tem
Oca 2016
Tem
Oca 2017
Tem
Oca 2018
Tem
Muş
Diyarbakır
Bismil (13)
Batman
Mardin

BİSMİL
Nüfus: 61200

BİSMİL-BİSMİL

Li navçeya Amedê Bismilê di 08-09ê Îlonê, 27-28ê Îlonê, 29ê Îlonê û 6ê Cotmehê de, bi giştî 6 caran qedexeya derketina derva hat îlankirin. Qedexeya derketina derve bi taybetî bandor li mehelleya Uluturk û Duplûpinarê kir.

Di qedexqeya derketina derve de ya ku di 27ê Îlona 2015an saet 14:30an de û di 28ê Îlonê saet 00:30an de hat îlankiriin, 3 kesan can dan.

Di qedexeya derketina derva da ya ku di 28ê îlonê saet 11:00an de hat îlankirin, zarokekê/î can da. Di saetên sibeha heman rojê de li Parka Halil İbrahîm Oruç zarokê bi navê Berat Güzel(12) hat kuştin. Li gor agahîyên ku şahidên bûyerê dane, polîs ji wasîteya zirxî daketin û wan fîşekên hewayî danîn ber meyîtê zarokê ji teref hêzên zêrevan kuştî û sûretê wî girt.

> Dema ku qedexeya derketine derve ya Bismilê di 6ê Cotmeha 2015an de di navbera saet 12:00an û 00:00ê de li hat îlankirin, 4 kesan can da. Li gor şahidên bûyerê, piştî ku 6ê cotmehê li Mehelleya Rojavayê Bîlal Bozkurt(19/22) û Doğan İnce(16) ji teref yekîneyên karên taybet hatin înfazkirin, polisên meyîtê wan xişiqandin û birin nexweşxaneyê. Abdullah Sügücü(32) û Şeymus Düşergeyê(18) ku di heman operasyonê da can dan, derdora serê wan ji ber reşandina çekên agirbar bo teşhîsa nasnameyê nedihat naskirin. Malbata ew 4 kesanan zarokên xwe ji sûretên ku ji teref hesabê tiwitterê yê binavê “@J_1_T_E_M hatibû weşandin, nas kirin.

REZAN: Li navçeya navendî ya Amedê Rezanê ji teref qeymeqamîya Rezanê di 15ê Adara 2016an, saet 03:00an de qedexeya derketina derve hat îlankirin. Di roja yekşema 21ê Adara 2016 an saet de, bi saet 06:00an re qedexeya derketina derva hate betalkirin. Di dema vê qedexeya derketina derve de yek jê polîs 5 kes mirin.


ECZANE
FIRST GOLD

LİCÊ: Li navçeya Amedê Licê rewş tim ne aram bû.Di dema pêvajoya aşîtîyê ya di navbera salâ 2013an û 2015 an de jî bûyer qewimîn û kuştin çêbûn. Tevî ku pêvajoya aşîtîye di merîyetê de bû jî, qereqol dihatin avakirini lo ma jî çalakîyên protestoyê çêbûn. Di çalakîya 28ê Pûşpera 2013an de Medenî Yıldırım(18) hat kuştin, 2 jê bigiranî 9 kes birîndar bûn. Ji ber ku avakira qereqolan ranewestîya, protesto jî berdewam kirin. Di protestoya li dij qereqolan a 6ê Pûşpera 2014an de polîs û leşkaran bi bombeyên xaza jihevbelavkirinê midaxale kir, bi pişt re bi çekên agirbar midaxaleyî bûyeran kirin. Di van midaxaleyan de Ramazan Baran(24) û Hacı Baki Akdemir(50) hatin kuştin. Abdullah Akkuluyê ku bi birîndar ew birin nexweşxaneyê,bi piştî tedawîya 3 mehan a di unîteya saxberîya giran re can da.

Li Licêyê pevçûn bêhtir li deverên bejahî di dawîya Tîrmeha 2015an de û di serê tebaxê de giran bûn. Jiber avêtîna top û hwd. çekên agirbar li Licêyê pir caran agir bi daristanan diket. Di vê heyamê de li navenda navçeyê 2 xanî jiber avêtina topan zerar dît.

DİCLE: Li navçeya Dicleyê di Cotmeha 2015an de pevçûn qewimîn. Jiber van pevçûnan li navenda bajêr zerar gihişt hin mekanan. Heyeta TMMOBê (Yekîtîya Odeya Avahîsaz û Endezyaran ya Tirkîyê) ya ku bo pevçûnan çûbû Licê'yê, ev encam bidest xistin: Avhaîyen ku zerar giştine wan 22 ne, evana bêhtir ji mal û dikanan pêk tên. Nêzî 56.049,04 lîre malîyeta tahmîratan hat hesapkirin.

Cizîra Botan

Cizre


Cizre
Toplam Ölüm Sayısı: 347
Sivil
PKK Militanı (HPG)
Tanımlanamayan Gençler
Güvenlik Gücü Mensubu
PKK Gençlik Yapılanması (YPS)
Toplam Ölüm Sayısı
100
50
0
Tem
Oca 2016
Tem
Oca 2017
Tem
Oca 2018
Tem
Bingöl
Muş
Van Gölü
Bitlis
Van
Batman
Siirt
Diyarbakır
Mardin
Şanlıurfa
Cizre (347)
Hakkâri
المالكية
دهوك
ارومیه

CİZRE
Nüfus: 119000

CIZÎRA BOTAN-CİZRE

JÊRZEMÎNÊN APARTMANAN...

Li cizîrê qedexeya derketina derve 5 caran di demên cûda de hat îlankirin. Qedexeya yekem di 4ê îlonê de hat îlankirin û heya 12ê Îlona 2015an 8 rojan berdewam kir. Di 13ê îlonê de jî qedexeya duyem ku rojekê dom kir, hat îlankirin.

Di navbera 14 û 15ê Mijdarê de li kolana 3yem a Cizîrê, di 24-25ê Mijdarê de li kolana 4em a Cizîrê qedexeya derketina derve hat îlankirin. Qedexeya ku di 14ê kanûna ewel de hat îlankirin bi şev û roj bênavber 79 rojan berdewam kir.

Hê hefteyek di ser ilana qedexeyan derbas nebûbû, li meheleya Cûd'iyê, Nûr'ê û Yasef'ê êrîş gûrr bûn. Mehelleya Nur'ê bi tankên li ser Aşk Tepesîyê bichkirî, Mehelleya Sûrê bi tankên li ser Şahin Tepesi'yê bicihkirî , Mehelleya Cudi'yê bi tankên li ser Caferi Sadık Tepesi'yê bicihkirî, Mehelleya Yafesê bi tankên li ser Hastane Tepesi'yê bicihkirî bi şev û rojan bi topan hatin lê dan û rastî êrîşên xedar hatin.

Dema ku li Cizîrê qedexe destpê kir hejmara nufûsa wê ji 110 hezaran daket 10 hezaran. Bi taybetî ji bi piştî 20 rojên qedexeya dawî ya ku di 14ê Kanuna ewela 2105an de hat îlankirin, koça bi darê zorê zêde bû. Koç ber bi gundên nêzi navenda Cizîr û hezexê ve, ber bi parêzgehên nêzîk ên wek Êlihê, Amedê û Mêrdînê ve û ber bi bajarên dûr ên wek Mersîn, Edene û Stenbolê ve hat kirin.



Dema ku di 2ê Adara 2015an de qedexeya derketina derve bi awayekî qismî hate betalkirin vegerîna li navenda navçeyê destpê kir.[7]

Berî qedexeya derketina derve ya li Mehelleya Nurê ya navçeya Cizîrê di 27ê Tebaxa 2015an de, di saet nêzî 11:30an de, piştî ku bi bombe û roketan erîşî Fermandarîya Garnîzonê hat kirin, li navenda navçeyê pevçûn destpê kir. Piştî êrişan ji Fermandarîya Garnîzonê gula lı derdorê hatin reşandin û 2 jê zarok 4 kesan can da. Hat angaştin ku ew kesên kuştî ji teref Yekîneyên Karên Taybet li cihên pevçûnan hatine înfazkirin. **Ev qetlîam tiştên ku li Cizîrê ewê biqewimin, dîyar dikir.**

Yeqînî pê hat ku di 27ê Tebaxa 2015an de endamên çekdarên ji teref PKKê an jî YDGH'ya(Tevgera Ciwanên Şoreşger ên Welatparêz) bi ser vê rêxistinê ve an jî ji teref rêxistineke din an jî ji teref kesnin din li navçeya Cizîrê li qiraxa çemê Dicleyê, tenê leşkergeha li Mehelleya Nûr'ê bi roketekê an jî bi bêhtirîn roketan hatîye lêdan û/an jî piştî lêdana yekîneyên leşkerî ya bi çekên agirbar ji teref van yekîneyên leşkerî û ji teref Tabûra Tankan a Cizîrê ya li ser girê jora mehelê, Cehdeya Botaşê û malên li serê kolanên ku derdikevin vê cehdeyê bi awayekî gûrr û bi çekên agirbar ên bibandor bi awayekî demdirêj hatiye lêdan, di destpêka bûyerê de ji bilî avêtina roketan pevçûnên beramberî hev çêbûne lê pir berdewam nekirine, lê belê ji teref her du yêkîneyên leşkerî ve û bi taybetî ji teref yekîneyên li qiraxa çem û ji teref yekîneyên leşkerî yên hindirê mehelleyê hedefên dîyar bi guleyên yeko yeko û bi "avêtina nuqteyê" hatîye lêdan. Ev rewş qeneet pê anî ku, ev lêdan bi taybetî li wasîteyan, berê bi gulan teker hatine lêdan û wasîte hatine bêbandorkirin, bi pişt re mirovên

---

[7] 14/12/2015 – 02/03/2016
Ropara Çavdêrîya Cizîrê Qedxeya Derketina Derve ya 79 Rojî
31ê Adara 2016an. Baroya AmedÊ, Komaleya Gündem Çocuk, İHD, SES(Sendîkaya Kedkarên Xizmetên Tenduristîyê û Civakîyê), TİHV

ku di hindirê wan wasîteyan de yek bi yek hatina nîşangirtin û derp xwarine, Eyüp Ergînê personelê tenduristîyê, Mesut SANRI'yê wesîfedarê DEDAŞê û Emin YANAĞ jî bi awayên dirûvê hev li heman cehdeyê di saat/deqeyên cûda da di dema hereketkirina wasîteya wan de bi yek derbeyê ku ji serên xwe de xwarine, hatin kuştin, Ji qûleyên leşkerên nobedar û ji kozikên ji torbeyên qûmê çêkirî yên li ser dîwarê îstinafê yê yekîneya leşkerî ji teref segvanan hatine lêdan.[8]

Dema ku Eyüp Ergen derp xwar, personelê tenduristîyê Sabri Enük jî pê re bû. Sabrî Enük li ser bûyerê wisa axivî:

"Ez hê jî li nexweşxaneya Cizîrê wek personelê tenduristîyê (hemşîr) dixebitim. Di roja bûyerê de me dengên çekan ji mehelleya Nur'ê bihîstin. Jiber ku mala hevalê min Eyüp Ergen jî li wê mehelleyê bû û ji ber ku zarokên wî li malê bûn, ew qilqilî. Ez, Eyüp Ergen û hevalê me Şerif Sak bi wasîteyê em ber bi mehelleya Nûr'ê ve çûn. Rêyên ku ji mehelleyê derdiketin cehdeya mezin pirên wan girtîbûn, bi tenê rêha li qiraxa Dicleyê û ya li hundirê mehelleya Nûr'ê ya ku di di ber yekîneyên leşkerî re derbas dibe, vekirî bûn. Em di wir re debas bûn, bi jor ve, ber bi Tabûra Tankan a Cizîrê ve , ber bi mala Eyüp Ergen a li mehleyê ve diçûn, wê gavê ji nişkave cîsimek li camê ket û me dî ku camên jihevbelavbûyî li ser me ketin. Di eynê wextê de jiber ku tekerên erebeyê jî teqîya, hem em zû ji erebeyê derketin, me xwe daqûlkir û ketin maleke nêzîk. Ajovanê erebeyê Şerif Sak jî li wê malê bû ku me xwe avêtê. Wê gavê me

---

[8] Rapora Lêkolîna li ser Mirinên Sivîlan û Bûyerên di Tarîxa 27ê Tebaxa 2015 de Qewimîn
SEROKATÎYA BAROYA AMEDÊ
31ê Tebaxa 2015an/Amed

ELİN ECZANESİ
ECZANE
EGEMEN OTO GALERİ ve EMLAK
AYGAZ

EYÜP ERGEN
SİZLERE İNAT
SAVAŞA KARŞI BARIS
ÖLÜME KARŞI YAŞAN
SAVUNMAYA
DEVAM EDECEĞİZ

BARAN ÇAĞLI

T.C.
SAĞLIK BAKANLIĞI
MERSİN DEVLET HASTANESİ
MERSİN
ÜKŞEHİR BELE
MERSİN
İP ODAS
CİZRE'DE KATLEDİLEN
HEMŞİRE EYÜP ERGEN İÇİN
YASTAYIZ, İSYANDAYIZ...
SAĞLIK ve SOSYAL HİZMET EMEKÇİLERİ SENDİKASI
MERSİN ŞUBESİ

ferq kir ku hevalê me Eyüp Ergen ne bi me re ye. Ewilî me telefonî wî kir, wexta ku em ji malê derketin û ber bi erebeyê ve meşîyan gule hatin berdan, em dîsa vegerîyan malê, ew jinika xwedîya malê piştî demekê bi şiklekî çû cem erebeyê û pajde hat, wexta ku pajde hat go, hevalê we di erebê de birîndar ketîye. Li ser vê me telefonî serîsa 122an kir û telefonî personelê Nexweşxaneya Dewletê ya Cizîrê kir, daku ambûlans bê şandin û gule berdan bê sekinandin. Jiber ku demeke dirêj ambûlans nehat me dîsa telefonî 122an û nexweşxaneyê kir. Di telefonê de ji me re gotin hêzên ewlehîyê nahêlin ambûlans têkeve mehelleyê. Bi piştî nêzî 1,5-2 saetan re ambûlans hat nêzî erebeyê ku Eyûp Ergin tê de birîndar bû. Lê belê ji ber ”avêtina nuqteyê” gule berdanên yeko yeko yên ji teref yekîneyên leşkerî personelên 112ê daneketin û midaxaleyî Eyup Ergen nekir. Demek pişt re em bi hev re revîyan, çûn cem erebeyê. Me rahişt Ergen û wî bir nexweşxaneyê. Wexta ku em gihiştin nexweşxaneyê ez dibêjim qeyn Eyup Ergen nedijîya. Mirina Eyup Ergen bi temamî ji ber nehatina Ambûlansê û xwîn wendakirinê bû.’’

Tahir Elçi di nav wê heyetê de bû ku li ser navê Baroya Amedê bo lêgerîna bûyeran çûbû Cizîrê. Ev Dîyalog di navbera Tahir Elçi û Zahide Ecera şênîya mehelleyê û şahida bûyeran de, derbas bû:

Tahirl Elçi- *Merhaba. Tu li vê meheleyê dijî. Tu bû şahidê bûyerê?*

Zahide Ecer-Min her tişt dîtin. Bile herkes bêdeng bibe, ez ê vebêjim.

T.E. -*Navê te çi ye?*

Z.E: -Zahide Ecer.

T.E: -*Belê ez guhdar dikim.*

Z.E.: -Hema ku dengê çekan hatin me xwe avêt malên xwe. Piştî dengê çekan her kes belav bû. Lawekî min î biçûk hebû li kolanê. Bi bihîstina dengê çekan re min xwe avêt kolanê û wî anî hundir. Li pêşîya mala min wasîteyek sekinî. Em qîrîyan. Min fahm nekir, bê çibû, hema xortên ciwan xwe avêtin hewşa me. Min pirsî û go, çi bû dayika min? Ji min re gotin, ‘’dayê ji vî alî de gule berdan me’’. Ji min re gotın ‘em sê kes di wasîteyê de bûn, hevalê me yê din nehat’. Wan go, wexta ku ew ji jora rê hatine, gule bera tekerê wasîteya wan dane û tekerên wê teqandine. Wan go ji ber ku mala hevalê wan li vir e ew hatine vir û wan nizanîbûn ku li vir pevçûn heye. Wan go ‘ em ji nexweşxaneyê hatine, em hemşîr in, bo ku em hevalê xwe bibin malê, em hatin, wan gule berdan me’. Wan bang li hevalê xwe kir, kesî bersiv neda. Telefonî wî jî kirin dîsa bersiv neda. Dema ku bo mêzekirina hevalê xwe derketin derve min ji wan re go ‘’Dayê qûrban, dernekevin, ewê derb li wekeve’’. Hindik ma bû lawê min jî bikuştana. Ku min xwe navêta malê, ewê min bikuştana. Min nizanîbû ku nîşan digrin û bera mirovan didin. Wexta ku ez derketim derve min dît ku bera mirovan didin. Ez derketim derve bo ku li hundirê wasîteyê binehêrim. Min dît ku kes di wasîteyê de xwuya nake. Min lêneherî, kes di wasîteyê de xwuyan nedikir. Min bang li mehelleya hemberî rê kir û min pirsî li ser derketina kesekî ji wasîteyê. Meheleya hemberê ji min re go ‘kes derneketîye’. Ez hinekî din nêzîkî wasîteyê bûm. Min reşek li paldanka paşî dît. Min fahmkir ku xortê di wasîteyê de hatîye hingaftin.

T.E- *Tu bi tenê bû, kes li cem te hebû?*

Z.E- Na, ez bi tenê bûm. Kes newêrîbû, derkeve. Çend caran gule berdan min jî, gul di ber min re çûn. Li ew cihê ku ez lê bûm min xwe rast kir û dîsa li hundirê wasîteyê nêherî... Xortê reben serî wî bi ser wî de ketibû û xwîn ji enîya wî diherikî. Wê gavê gule berdan min. Meheleyîyê li hembera rê qîrîya û go ‘xwe bavêje erdê’. Min xwe avêt malê. Min ji wan her du kesên li malê re go ‘hevalê ji serê xwe de hatîye lêdan, dibe ku miri be.’ Wan kir hewar û qîrîn. Wan telefonî nexweşxaneyê kir û bi pir bi lezgînî daxawaza embûlansê kir. Her du jî ewil ji ser hişê xwe ve çûn. Pişt re ew hatin ser hişê xwe û wan daxwaza embûlansê kir, lê wan got embûlans nehatîye. Wekta ku gavekê bi pişt re embûlans hat, vê carê gule berdan embûlansê. Ew wesîfedarên di embûlansê de jî xwe avêtin mala min. Wan telefonî dewletê kir û kirin hewar. Wan go ‘em wesîfedarên xizmetên tenduristîyê ne, em hatine birîndarê di hundirê wasîteyê de bibim, guleyan berdidin...’ Wesîfedarê tenduristîyê yê di embûlansê de bi axaftina telefonê re digrîya bo hilgirtina birîndar û rawestana guleberdanê, lava dikir. Hevalên wî diqîrîyan û digo “li ku derê ye ev dewlet? Kesekî/eke ku dengê me bibihîze ma tuneye? Hevalê me ewê di hundîrê wasîteyê de ji ber jêçûna xwînê ewê can bide lê belê em nikarin wî hilgirin, em nikarin midaxaleyê li wî bikin. Ev çawa kar e!” Ji ber guleyan embûlansa ku hat jî, ji ber ku ew jî nikarîbûn ji hewşê derkevin, ew jî asê man û daxwaza ambûlanseke din kir. Wan telefonî rayedaran kir. Wextekê bi pişt re embûlansa duyem hat. Gule berdan wan jî. Wan jî bi zorê xwe avêtin hewşî û canê xwe bi zorê xelas kir. Vê carê gelên li derdorê xwe ranegirt û dest bi qîrinê kir, li dij rabûn. Gel serî hilda,mirin da ber xwe, ev bîdona li wê derê ji xwe re kir mertal, xwe avêtin ser rê, ew birîndarê di wasîteyê de derxist, xist embûlansê. Bi pişt re dîsa gule berdan gel, Mirov li der dorê belavbûn.”

Qedexeya Yekem a li Cizîrê: 4-12ê Îlonê

Ji teref parêzgarîya Şirnexê di 4ê Îlona 2015an de li gor xala 11/C ya Qanûna Rêveberina Parzêgehan ya bi hejmara 5442an, bi saet 20.00an re li Cizîrê qedexeya derketina derve hat îlankirin. Qedexeya derketina derve bênavber heya 12ê Îlona 2015an berdewam kir.

Di hindirê vê wextê de hemû rêyên bo têketin û jêderketina bajêr bi barîkatan hatin girtin, hawîrdora bajêr bi tank û bi panzêrên zirxlêkirî hat girtin, bajar ket bin dorpêçê. Heta domahîya vê wextê gel ji pêdivîyên jîyanê yên wek av, elektrîk, paqijî, tenduristî, perwerdehîyê hat mahrûmkirin. Bi taybetî jî ji ber astengkirina pêdivîyên avê, elektîrkê, embûlansê û tendusristîyê gel ji alîyê tenduristîyê ve bandor girt û ji ber vê ji bûyerên mirinê qewimîn.[9]

---

[9] Rapora Lêkolîna Buyerên Qedexeya Derketina Derve ya Cizîrê, 4ê Îlona 2015an, Baroya Amedê

Heta domahîya qedexeya derketina derve mehelleya Surê, Cudîyê, Yafesê û Nur'ê ku jı %70'yi nufûsa navçeyê pêk tînin, bi tank, top, panzêr û çekên giran hate lêdan. Segvanê ku li cihên bilind hatibûn bi cihkirin, bêyî ku cudahîyê têxe navbera wan, hem hema gule berdan hemû tiştan ku li bi wan diket. Ev êriş bûn sebebê gelek kuştinan.[10] Di van operasyonan, êrîşan û pevçûnan de 15 sivîlan ji ber çekên agirbar an jî perçeyên şarapnelan can dan, 6 birîndar jî ji ber rankirina li nexweşxaneyê can dan.[11]

Bi qedexeya 8 rojî re heta 12 îlonê li Cizîrê 29 sivîl hatin kuştin. 22 kesên ji vanan di qedexeya derketina derva ya 4-12ê Îlonê de hatin kuştin. Meyitê 16 kesan ku di nav wan de Muhammed Tahirê 35 rojkî ji hebû, encax bi piştî betalkirina qedexeya derketina derve re, bo Nexweşxaneya Dewletê ya Cizîrê û ya Şirnexê hatin hilgirtin, bi awayekî girseyî merasîma nimêza mirîyan hat kirin û ew sipartin axê.

---

[10] Rapora Çevdêrîya Buyerên cizîrê, Koma Çareserîyê û Çavdêrîyê ya Pevçûnan, MAZLUMDER 12.09.2015

[11] H.ç. (heman çavkanî)

EAUTIFUL

Şahidê 1ê: Bi rastî jî mînak malbetek di şibakeya malê re an jî di derî re xêlîya boz li badike, bi pişt re ew dibêjin wer... Ya muhîm heta domahîya 8 rojan mehelleyekê, hemû her cihî bajarêkî dorpêç dikin... Yanî, binehêrin li wir mirov dijîn. Tu 'terorist' li wir najîn. Piranîya mirîyan zarokên 12 salî, zarokên 15 rojkî... Dayikeke 53 salî çi eleqeya wê bi bûyeran heye! Yanî ewên kuştî hemû sivîl bûn.

Şahidê 2an: Derdê me ne ew e ku ji vê derê têkevin wê derê. Heger bi rastî jî ne bi armanca kuştinê be, ne bi armanca girtinê be, ne bi armanca desteserkirinê be, bila têkevê. Kes ne di wê angaştê de ye ku hêza vê dewletê qebûl neke. Ku daristanekme dişewite û em nikaribîn agirê wê bitefînin, birîndarekî/eke me hebe û em nikaribîn wî/wê rakin nexweşxneyê û derman bikin, li nexweşxaneyên me ro li nîvro werin reşandin, me çi fahm kir ji vê têgihiştina birêvebirina vê dewletê? Wê wextê ev gelê li vir go: ‘’ Em pergaleke bi vî awayî naxwazin, em dewletê red dikin le angaşata wan a birêvebirinê em red dikin. Walîyek ev 9 roj in wisa bi zilmê bajarekî birêve dibe. Kî dikare vê bipejirîne?

Şahidê 3an: Lawê xalê xanima min, ewê bûz bianîya, çi bianîya, zarokekî 16(14 salî), Lê dan. Zarok birîndar e. Embûlans tê, ew vê carê li embûlansê direşînin.

Zarok destê xwe bilind dike, tevî ku birîndar e. Bi piştre ew li mezjîyê wî didan û wi dikujin.

Şahidê 4an: Birîndar dibin, bang li embûlansê tê kirin, agahî bo emnîyetê hat dayîn ji ber ku birîndarek heye, bo ku birîndar bibin. Dibêjin 'dibe, wî bînin." Çar heb ciwan bi darbestê vî birîndarî dibîn vê derê, wê wextê him kesê li ser darbestê him jî kesên rahiştina darbestê, li wan hemûyan tê reşandin! Mecbûr li wir dihêlin, bo ku canê xwe xelas kin ji mecbûrî li wir dihêlin û guleyek jî li Bünyamîn İrci(berî vê bi 2 rojan- bi piştî Selman Ağar re), vî zarokî li wir dihêlin, guleyek lê ketîye. Bi pişt re polîs tê ser, xwedê giravî ew ê embûlans were, lê belê nayê. Polîs tê ser, 2 saet bi pişt re ku wir hinekî tebitî, ciwan dibînin ku hê jî darbest li wê derê ye û di bedena wî zarokî de şûna 3 guleyan heye. Guleyek li vir ketîye di vir re derketîye, rasterast înfaz... Yanî zarokekî 14 salî...[12]

---

[12] Rapora Çavdêrîya Bûyerên Cizîrê
Li ser Navê Navenda Giştî ya MAZLUMDERê. Koma Çareserî û Çavdêrîya Pevçûnan, MAZLUMDER 12.09.2015

Şahidê 5an (Wesîfedarê Tenduristîyê): *Bi piştî pevçûnan re polîsan gef li bijîşkan xwar, li ser wê jî servîsa rewşên lezgîn ji beşa saxberîya giran hat derxistin. Ekiba tenduristîyê ya ku ji Qoserê hatibû û hin bijîşkên pispor li vê derê bûn. Bijîşkên pratîsyen li vir tune bûn, personelên tenduristîyê yên ku li vir asê mabûn, li vir bûn. Ew personel bûn ku ji zû de ve li vir bûn. Di saet 01.00ê şevê de ji ber ku du wasîteyên zirlêkirî li hev ketibûn 3 an jî 4 polîs û sivîl bo nexweşxaneyê hatibûn rakirin. Me midaxaleyî wan kir, bi pişt re dengên teqînan hatin. Me dengê topan bihîstin. Wê wextê polîs bi hevokek wisa ku kêfa xwe bilêv bike, go "hewce nake hun bitirsin, ew ên me ne, ew ên ku bombeyan dibarînin ên me ne."*

Dengê teqîn û çekan car caran dihatin. Lê belê heya sibehê bi aramî derbas bû. Saet li dora 07.00ê sibehê birîndar hatin. Ewil 4-5 nexweş hatin. Ev birîndarana ji ber bombebarana 01.00ê şeva do birîndar bibûn Li gor îfadeyÊn wan, ew heya destê sibehê li mal mane. Me qeneet pê anî ku yek ji wan damara wî ya xwînber jêbûye. Lı derdora wî hematom bir giranî hebû. Me mıdaxaleyî wî kir. Bi parçeyên şarapnelê birîndar bûne.

Cizre
BAŞHEKİMLİK

Lingê jinekê ji ber parçeyên şarapnelê şikestibû. Wê gavê danê sibehê teqînek rû daye. Zarokek di gava rahiştina bombeyeke ji nav axê de, bombe di destê wî de diteqe, 13 salî bû, destê wî yê rastê qût bûbû. . Lingê çepê û yê rastê ji qevdikê û pê ve bi temamî ji hev ketibû, hestî jikestibûn.Ji damara xwînber xwîn dihat. 2 saet bi pişt re me wî sewqî Amedê kir. Tê gotin ku li mehelleyan pir birîndar hene. Lê belê ji ber tirsê nayên. Bi îmkanên xwe tedawîyê dikin. Do yekî yextîyar anîn, ji serê xwe de hatibû lêdan. Can dabû. Bi şevê kes nayên, bi roj jî mirinê didin ber xwe û tên.

Zarokekî ku du roj berê hat, ez vebêjim. Zarok 6-7 salî bû. Wexta ku ew hat nexweşxaneyê, servîsa lezgîn, dikir qîrîn û hewar, hewl dida ku çavê xwe derxe. Hey diqîrîya. Diqîrîya digo “ez ê xwe bikujim.”

Zaroka ku vê sibehê hat, bi pismamên xwe yên temenmezin re hatibû. Zarokên 10 salî. Ew jî bi vî awayî diqîrîyan. Digotin “em ê xwe bikujin, em ê xwe biteqînin”. Dîyar dike ku derûnîya zarokên di vî temenî de bê ketîye çi rewşê.

Ev zarokên 7 salî, 10 salî diqîrin, dibêjin “ez ê xwe bikujim, ez ê xwe biteqînim.” êdî iştekî ku bê kirin nemaye.

Tarık İrci: Ez bavê Bünyamin İrci me, zarokên birayên min li mehelleya Nur'ê mabûn. Liwê derê ava cemidî tunebû, ava cemidî ji me xwestin. Min ji go "bibe". Wî jî rahişt bûzê û çû. Heya sibehê li wê derê ma. Sibehê jî gotîye "ez ê herim malê, ewê dîya min wan meraq bikin" û ji malê derketîye. Li vegerê panzêrekê rê ya wî birrîye, wî jî destên xwe rakirine jor û gotiye 'ez dixwazim herim malê". Lê belê polîsan wi girtine, xistine panzêrê û li wê derê wî kuştine. Guleyek bera ser dilê wî dane û guhekî wî jêkirine, guleyek ji li kefa destî wî dane, êşkence lê kirine, parsûyên wî jî şikestine. Ji ber xwînwerivîna mejî mirîye. Bi pişt re avêtine ser çopekê. Kesên ku wî dîtine, wî birine mizgeftê. Wexta ku ez sibehê ji xewê rabûm, min bihîst ku Bünyamin can daye. Ez bi lawê xwe re çûm wî bînim. Li ser rê panzêran me da sekinandin û bi ser dev de em li erdê hatin rastkirin û gef li me hat xwarîn go '' emê we bikujin.", Me jî go ''mala me li wê derê ye, divê em herin." bi pişt re destûr dan ku em biçin. Em çûn mehelleyê, me wî li mizgeftê dît. Faysal Sarıyıldız(Parlemnterê HDPê) telefonî embûlansê kir, bi pişt re me wî hilgirt û bir nexweşxaneyê. Wê gavê wan bi sê panzêran hawîrdora me zevt kir, dan çêran, gef xwarin. Li pêşîya nexweşxaneyê 500 kesên mîna DAİŞîyan hebûn. Bi seda polîs û wasîteyên leşkerî hebûn.

Ramazan Çağırga: *Navê wê yê rast Cizîra Botan bû lê belê ji ber ku destûr nehat dayîn, me navê wê kir Cemîle. Em li mehelleya Cudîyê rûdinên. Saet di navbera 17.00 û 20.00ê şevê de bû. Roja qedexeya ya 3yem bû. , her kes li derve bû, derîyê mala me jî li cehdeyê dinehêre. Her kes li devê derîyê xwe sekinî bûn. Li meheleyê bûyer tune bû, li vê derê xendeq jî tune bûn. Tam li hemberî derîyê me kozika segvanan hebû. Gava em li ber derî rûniştî bûn, hat lêdan. Bi dijbalafiran, kobrayan, bi çekan lêdan. We gavê , ew jî hat hingaftin û can da. Di sala 92an de dîsa top avêtibûn mala me, wê wextê jî 7 kesên malbata me hatin qetilkirin.*

Cemile ÇAĞIRGA

Ahmet Edin: Mala me li mehelleya Cudîyê ye. Di wexta bûyerê de ez li Iraqê bûm. Apê min ê bi navê Ekrem Dayan, Ayşe Taşkın û dergûşa 3 mehî ya bi navê Berxwedan Taşkın birîndar in û li Nexweşxaneya Dewletê ya Şirnexê ne. Bûyer roja 8ê Îlonê qewimîye. Ez li Iraqê bûm û min li nûçe ji çapemenîyê dişopandin. Min malbata xwe meraq kir û malbata birayê xwe, min telefonî xeta sabit kir. Min go ‘’bang li zarok û xanıma min kin.” Xanima min hat, ez pê re peyivîm, go ‘em baş in.” Heya wê demê jî tiştek tunebû. Mala birayê min jixwe mala li kêleka me bû. Axaftina me qedîya, me telefon girt. Wexta ku jinbira min ewil di derîyê hewşê re derketîye, gule lêketîye û dergûşa wê ya sê mehî Berxwedan Taşkın jî di himbêza wê de bûye. Dergûşa wê jî birîndar bûye. Ji lingê xwe û ji guhên xwe hatîye lêdan. Wexta ku xanima min û apê min dît ku jinbira min lê hat dayîn û ew ket, tavilê çûne alîkarîya wê lê belê segvanan hemû kesê ku derketin, li wan dane. Apê min li alîyê derî yê hundir, li alîyê hewşê ketîye, xanima min jî hema li cem jinbira min, li alîyê derveyî derî ketîye. Di vê wextê de dergûş bi birîndari li erdê bû û hê jî digrîya. Jinbira min wexta kıu bibirîndari li erdê bu, xwe bi ser dergûşa xwe de ditewîne, da ku pir gule neyênê, xwe jê re kirye mertal.Dîya wî û xanima min li wir can dan. Dergûş jî heta domanîya du saetan di nav wan meyîtan de bi birîndarî maye. Kesî nikarîbû, dergûşê hilgigire, kî derketîye li wan hatina reşandin.

YEK Jİ TETBÎQATÊN DEWLETA TERORÊ: MODELA SRÎ LANKAYÊ

HEMÛ GÎYANEWERAN KU DİLİVİN, ÎMHA BİKE

Modela Srî Lankayê wek tetbîqeke raste rast a dewleta terorê kete lîteraturê ku bi vê modelê re amûrên tundîtîyê û zextên pergala dewletê hatin yekdestîkirin û bo rewakirinê ew hatine bikaranîn; maskeya dadê, ya mafê mirovan, ya demokrasîyê û hwd. maske, bêyî ku fikara tu tiştekî were kirin, hatine paşguhkirin; her giyanewrên ku liv bi wan diket, bûn armanca îmhakirinê.

Di navbera dewleta Srî Lanka’yê û Pilingên Tamîlê (TEKK) ku azadîya Tamîlîyan diparêzin, di sala 1983an de şerê navxweyî destpê kir. Di sala 2002an de di navbera Srî Lanka’yê û Pilingên Tamîlê de bi çavdêrîya hukumeta Norwecê li Oslo’yê ku Cihekî xwe yê girîn di pêvajoya çareserîyê ya Tirkîyê de heye, peymana agirbestê hat îmzekirin. Hükumetê qedexeya li ser Tamîlan rakir, Tamîlan jî dev ji daxwaza dewleteke serbixwe berdan. Lê belê agirbest encax salekê dom kir. Di sala 2004an de Pilingên Tamîlan li Kolomba Paytext êrişeke xwekujî pêk anî û wezîrê karê derve hat kuştin. Li Srîlanka’yê rewşa awarte hat îlankirin. Di sala 2009 an de Hêzên Deryayî û hewayî bo îmhakirina Plingên Tamilê stratejîyek leşkerî amade kir. Lo gor ev stratejî ya ku wek modela Srî Lankayê ket lîteraturê, hemû gîyanewerên ku liv bi wan ket,bûn armanca îmhakirinê. Di gava operasyonê de bêyî ku sivîl û milîtan ji hev werîn cûdakirin, hem cismên ku tevgerîyan, hatin lêdan. Di encama operasyonê de, baskê çekdar ê Tamîlîyan hate tunekirin. 40 hezar sivî hatin kuştin, bi sedhezaran sivîl ji cihên xwe hatin kirin û vegera wan a li jîngehên wan hat astengkirin û ew di kapman de hatin asêkirin.

Baren
İzlanda
İsveç
İrlanda
Polonya
Avusturya
İspanya
İtalya
Türkiye
Kayseri H
Tunus
Fas
Irak
Cezayir
Libya
Mısır
Batı Sahra
16 sa
Mali
Nijer
Çad
Sudan
Yemen
Burkina Faso
Gine
Yemen Den
Nijerya
Gana
Etiyopya
Gine Körfezi
Somali
Gabon
Demokratik Kongo Cumhuriyeti
Kenya
Tanzanya
Angola
Zambiya
Mozambik
Namibya
Zimbabve
Güney Atlas Okyanusu
Botsvana
Madagaska
Güney Afrika

Modela Srî Lankayê veguherî hêmaneke tirsandinê ku hukûmetên otorîter li welatên ku şerê navxweyî lê hebû, bi vê modelê mixalîf qutifandin û gef li wan xwarin. Ev model, li Tirkîyê di wexta pêvajôya çareserîyê de, di heyama ku her du alî li pê muzakereyan û aşîtîyê bûn jî ji rojevê dûr neket.

Ofîsa Mafê Mirovan a NYê (Netewên Yekbûyî)

Li gor rapora ofîsa mafê mirovan a sala 2012an, di operasyona 2009an de 40 hezar Tamilî hatine kuştin. NYê dîyar kir ku, binpêkirina mafê mirovan li Srî Lankayê di asteke tirsank de ye, ji bilî pevçûnan bi deh hezaran kes bi sûîkastên kiryarê wan nedîyar û wendakirina bi zorê rûbirû mane, bi piştî operasyonan re li jin û mêran êşkence û tundîtîya zayendî hatîye kirin.


ts Denizi
Rusya
Kazakistan
Moğolistan
Kırgızistan
avalimanı
Japon Denizi
Çin
Güney Kore
Afganistan
İran
Pakistan
Doğu Çin Denizi
Nepal
. 15 dk.
Hindistan
Myanmar (Burma)
Filipin Denizi
Tayland
Bengal Körfezi
Vietnam
zi
Umman Denizi
Tayland Körfezi
Sri Lanka
Malezya
Endonezya
Arafura Denizi
NT
Hint Okyanusu
Avustralya
WA
Büyük Avustralya Körfezi

Li dij rêveberên wê heyamê ji ber sûce şer rêya darizandînê vebû. Li Srî Lankayê hê jî binpêkirina mafê pirovan pir e.

Leşkerê cêşa Srî Lankayê meyîtê jineke Tamîlî ku wan ew kuştiye, li kolanê teşhîr dike û sûretê meyîtê wê digre.

Li Cizîrê qedexeya herî dirêj: 14ê Kanûna Ewel a 2015an- 2ê Adara 2016an Heyama Jêrzemînên Apartmanan

Bi qedxeya derketina derve ya 8 rojî re, li Cizîrê heya 12ê Îlonê 29 kesan can da. Nêzîkî 1000 avahîyî ku di nav wan de di serî de mal û kargeh hebûn û firne, dermanxane, mizgeft, dibistan, navenda çandê hebûn, bûn armanca guleyan.[13]

---

[13] Rapora Tespîtkirina Xesarên Herêmî, Tebaxa 2015an- Kanûna Pêşîn a 2016an, GABB(Yekîtîya Şaredarîyên Herêmî ya Rojhilatê Başûr.
Avahîyên ku piştî qedeqeya 8 rojî xisar dît:
652 heb xanî, 204 heb kargeh, 2 heb firne, 2 heb dermanxane,
1 heb navenda tenduristîyê, 1 heb navenda Çandê, 2 heb dibistan,
5 heb mizgeft, 2 heb axur, 27 heb wasîte

Li gor agahahîyên rayaderên dewletê bi rêya çapamenîyê belav kirin, 14 General, 26 Serheng û 15 hezar leşker sewkî Şirnexê hatine kirin.[14]

Parêzgarîya Şirnexê li Cizîrê qedexeya derketina derve ya ku 79 rojan bi şev û roj bênavber berdewam kir, di 14ê Kanuna Ewel a2015an de di saet 23.00ân de bi vê daxwîyanîyê îlan kir:

> *“Li parêzgeha me Cizîrê û li navenda navçeya Silopîyê bo bêbandorkirina Rêxistina Terorê ya Cudaxwaz û endamên wê, bo berterafkirina barîqat û xendeqên bi mayin û teqemenîyan ji teref endamên rêxistinê kemînkirî û bo ewlehîya can û malê hemwelatîyên me, û bo sazkirina nîzama giştî li gor xala 11/c ya Qanûna Rêvebirina Parêzgehan ya bi hejmara 5442an, di roja 14.12.2015an de, bi saet 23.00an re qedexeya derketina derve hat îlankirin.*
>
> *Wek ku raya me ya giştî dizane, Rêxistina Terorê ya Cudaxwaz di serî de mafê jîyanê yê gelê me mafê wan î azadîyê, ewlehîyê, milkîyetê û hwd. mafên wan î esasî û huriyetê dike armanca erîşên xwe, xendeq û barîqatên mayinkîrî û teqemenîkirî çêdike, bi van çalakîyan rê li ber jîyana rojane ya gelê me û di serî de rê li ber mafê tenduristîyê û mafê gelê meyê sûdwergirtina ji xizmetên giştî digre û zerara maddî û manewî dide hemwelatîyên me.*

---

[14] H.ç.

Bi mebesta sazkirina pergala giştî û aramkirina rewşê bo bikaranîna mafên esasî û hurîyeta hemwelatîyên me, ewê hemû piştgirîya maddî û manewî bo welatîyan were dayîn. Bi vê mebestê, ez dixwazim dilê hemû welatîyên me rihet be, ez silav û kêfxweşîya xwe ji hemû welatîyên me re dişînim.

Bi rêzdarî ji raya giştî re tê ragihandin.

14.12.205 Parêzgarîya Şırnexê"

Pirsgirêka Hiqûqî ya Qedexeya Derketina Derve

Qedexeyên derketina derve ya li parêzgehên Kurdan hatin îlankirin, him li dij hiqûqa navnetewyî û peymanên li ser mafê mirovan ên li navneteweyî îmzekirî bûn, him jî li dij xalên li ser maf û azadîyên esasî yên Makezagona Tirkîyê bûn:

Him li gor belgeyên navneteweyî û him jî li gor xala 13em a Makezagona Tirkîyê divê rewşên sînordarkirina azadî û mafên esasî bi awayekî eşkere were nivîsandin. Loma jî xala 11em a Qanûna Rêvebirina Parêzgehan ya bi hejmara 5442an selahîyeta îlankirina qedexeya derketina derve nade parêzgaran. Di qanûnê de îbareyeke wisa tune... Di rewşa awarte û rêvebirina awaret de jî tevdîrên wek “qedexeya derketina derve ya bênavber” ne hatin rojevê û herwiha “qedexya derketina derve ya bênavber” ku di her astê de bû sedema binpêkirina mafê mirovan, ewê ne pêkan be ku hatibe xeyalkirin. Hukûmetê bi destê parêzgar û qeymeqaman serî li karên wisa dijhuqûqî dan, dakû xwe ji mukelefîyetên xala 15em a PMME (Peymana Mafê Mirovan a Ewropayê) dûr bihêle.[15]

Li cizîrê berî îlankirina qedexeya derketina derve bi rojekê di 13ê Kanûna Ewla 2015an de, di tarixa Tirkîyê de mînakeke kêm hat jiyîn. Rejîmê ji bajarê ku bi temamî dorpêçkirbû, hemû karmendên xwe vekişandin. Ji mamosteyên li Cizîrê û Silopîyê wesîfedarkirî re SMS hat şandin ku ew hemû bo “perwerdehîye xizmeta navxeyî” hatine vexwendin. Di peyamê de hatibû diyrakirin ku hemû mamoste û rêveber ji teref Wezareta Perwerdehîya Netewî bo semînera perwerdehîye xizmeta navxeyî ji 14ê Kanûna Ewel a 2015an û pêve hatine vexwendin. Di peyamê de wisa hetibû gotin ”Mamosteyên me dibe ku li bajarên xwe beşdarî semîneran bibin.” 1298 mamosteyên ku li 104 dibistanên Cizîrê wesifederkirî bûn, bi pişt re navçe terk kir.

---

[15] Rapora Çavdêrîya Cizîrê ya Qedexeya Derketina Derve ya 79 RojÎ Baroya Amedê, Komaleya Gündem Çocuk, İHD, SES, TİHV. 31.03.2016



Tüm öğretmenlerimiz ve idarecilerimiz bakanligimiz tarafından 14.12.2015 tarihinden itibaren hizmet içi eğitim seminerine alinmiştir. Ogretmenlerimiz seminerlerini memleketlerinde alabilirler. Gerekli duyurunun yapilmasini rica ederim 17:07

il dışına çıkacak öğretmenlerimizin otogardan araçlara binmemesi.Hastane kavşağından yada farklı imkanlarla ilçe dışına çıkılması hususunu öğretmenlerinize duyurmanızı rica ederim. 17:08

Heta Domahîya 79 rojî kes neket bajêr

Di dema qedexeya derketina derve de ku di 14ê Kanûna Ewel a 2015an de hat îlankirin û 79 rojan berdewam kir, destûr nehat dayîn ku tu sazî, kes, sîyasetmedar û rojnameger têkevin navçeyê.

Heta domahîya 79 rojan hawîrodara Cizîrê ji teref leşkeran ve hat dorpêçkirin û bajar bi çekên giran, tank, hawan û topên ku li cihên bilind ên bajêr hatibûn bi cihkirin, hat lêdan. Bi dehan mirov bi şev û roj hatin kuştin ku hin ji wan li mala xwe bûn, hin jê li mitfaxwe wê demê nan çêdikirin, hin jê li odeya xwe ya rûniştinê çayê vedixwar, hin jê bo pêdivîyên tenduristî û xwarin-vexwarinê li kolanan bûn.



Li Cizîrê hemû malan ji ber derbên çekên giran xisar dît. Qismeq ji mala bi topên hawanân ruxîyan, qismeq jê jî bi hin awayan hatin şewitandin ku êdî lê nedihat rûniştin. Yekîtîya Şaredarîyên Anatolîyayê ya Rojhilatê Başûr li gor xebatên xwe yên tespîtkirina xisaran; 1200 jê bi giranî bi giştî 10 hezar mal û kargeh xisar dîtîye; depoyên avê yên ku li ser xanîyan bûn û klîmayên ku li derva malan bûn, ji qestî hatine hedefkirin. Hewl hatîya dayîn ku jîngeh bi temamî werin îmhakirin û bi temamî rê li ber vegerê were girtin.

Hêzên rejîmê berî qedexeya derketina derve bi anonsan gef li hemû kesên li Cizîrê xwar ku **‘berî qedexeya derketina derve destpê bike, divê her kes mala xwe terk bike ya na ew ê berpirsîyarîya tiştên ku biqewimin negre ser xwe.’** Li gor vegotinên şahidan di 22emÎn roja qedexeya derketina derve de, di 05.01.2016an de, hêjên rejîmê bi anonsan gefên kuştin xwarine ku **“ku ew malên xwe terk nekin ewê çekên kimyewî were bikaranîn û hemû werin geberkirin.”** Bi piştî vê tarîxê re erîşên çekdarî yên li dijî malan gûrtir bûye, bi taybetî ji di roa 29em û 30em de ji ber bîna çekên kimyewî şêniyan bi alên boz malên xwe ji mecbûri terk kirin.

AK AL
ERMER
BEDO
OTO SERVİSİ


TÜRK ADIMIZ
OĞUZ SOYUMUZ
AVŞAR BOYUMUZ
ÇİZRE
PÖH
semuk

Nîvîsên ser dîwaran ku yekem car li Farqînê li ser dîwaran hatibûn nivîsandin, li Cizîrê jî hatin nivîsandin. Anonsên nijatperest, zayendperest û binefret yê wek “Pîçên Ermenan, Emê qira we bînin, Hûn ê hêza Tirk bibînin...


AŞK BODRUMDA
YAŞANIYOR GÜZELİM :)
PÖH

Birçîtî û tîtî tesîr li min nedikir, anonsên wan, çêrên ku dikirin pir tesîr li min kir. Roja ku bedenên bê can li erdê man, ez mirî me. Êdî bila ji min re nebêjin zindî, êdî ez mirîyekî zindî me.


FISTIĞIN EVİ


ERMENİ
PİÇ LERİ
PÖH!
KORKAK
PKK
AZER
JÖH
APO

Heta bi domahîya dorpêça Cizîrê bi giştî 251 mirov hatin qetilkirin ku 177 ji wan di jêrzemînan de hatibûn tespîtkirin. Di nav wan de yek jê zaroka berşîr û bi giştî jî 42 zarok, 22 jin hebûn. Disa nasnameya 79 kesên ji nav wan hê nehatîye tespîtkirin. Destûr nehat dayîn ku hin meyît li Cizîrê werin definkirin, ew bo bajarên din hatin şandin û li wan deran hatin definkirin.

Gav bi gav ber bi qetlîama jêrzemînan ve

Di 23ê Kanûna Paşîn a 2016an de ji ber lêdana topê li apartmaneke 5 qatî 2 kesan can da, 11 kes birîndar bûn. 31 kesên di apartmanê de xwe spartin jêrzemînê. Di 4ê Sebata 2016an de pê hat hisandin ku di duyem jêrzemînekê de birîndar hene û pêdivîya wan bi piştgirîya tibbî heye. Di 10ê Sebata 2016an de di çapemenîyê de hat weşandin ku sêyem jêrjemîneke din heye. Mirovên ku di jêrzemînan de bûn, di rojên pêş de bi piranî bi şewitandinê hatin qetilkirin. 24 jê meyitê zarokan bi giştî jî 177 meyît ji kavilên apartmanan û jêrzemînan hatin derxistin, ji kolanan û derdorê hatin hilgirtin.. Di nav kesên kuştî de xwendekarên zaningehê jî hebûn ku bo piştgirîya bi Cizîrê re hatibûn. Hejmara wan wek 40-50 kesî hatibû dîyarkirin.

> *"Bi rastî li wê herêmê 20 jêrzemînên din hene. Di salên 90î de kesên ku gundên wan hatin şewitandin û hatin Cizîrê wek tedbîreke şer, bo ku xwe bispêrênê apartmanên bijêrzemîn avakirin..."*
> *(28, mêr, Cizîr)*

Hevserokê Meclîsa Gel a Cizîrê Mehmet Tunç ku di jêrzemînê de hat qetilkirin, bi rêya telefonê beşdarî 12.Konferansa Kurdan a Navneteweyî bû ku 27.01.2016an de li Parlementoya Ewropayê dihat sazkirin. Tunç wisa bangawazî kir:

"...Cezayê qedexeya derketina derva 100 TL'ye lê belê em derdikevin, me bi kuştinê ceza dikin. Bi topên hawanê lêdidin. Li Cizîrê topên hawanê, tank, obis hemû tên bikaranîn. Li Cizîrê qetlîameke mezin pêktê û bi qirqirineke mezin re

rû bi rû ne. Hemû mal hatine bombekirin, tankan bikartînin. Çekên ku li dij dujmin werin bikaranîn di sedsala 21an de li dij hemwelatîyan ji teref hukûmeta AKPê û Komara Dewleta Tirkîyê tên bikaranîn. Li Cizîrê trajedîyek diqewime. Ev 60 roj in ev gel tî û birçî ye. Ji 120 hezar nufûsê 10 hezar maye an jî nemaye. Bi zorê gel dane koçkirin...Bi rastî jî li Cizîrê trajedîyek diqewime. 28 birîndar di malekê de birîndar bûn. 4 birîndaran can da. Ji nav 24 birîndaran rewşa Nusret Bayar(bi piştî axaftina wî re can da), Veli Çiçek û Sultan Irmak pir pir giran e. Av bi temamî qedîyaye. Am diçin avê bînin, ji teref segvanan em tên lêdan. Em nikarin derkevin. Apartmana 4 qatî bi topên hawanê bi temamî ruxîyaye. Bo ku beşdarî weşanê bibim, ez niha li wê apartmana rûxandî me. Û rewş pir pir xeternak e. Loma jî em ji dostên xwe yên wê derê re dibêjin: Ji kerema xwe vê wahşetê bidin sekinandin. Hûn xwedîyê wê hêzê ne ku li Cizîrê vê qetlîama bidin sekinandin. Hûn xwedîyê wê hêzê ne ku hişyarîyê bidin hukûmeta AKPê û dorpêça li ser Cizîrê bidin rakirin. Ya na ku qetlîamek pêk were em ê we jî şirîkê vî sûcî bibînin...''

Heyeta HDPê bo rizgarkirina ew kesên ku xwe sipartibûn jêrzemînan, dest bi greva briçîbûnê kir. Parlementerê HDP Faysal Sarıyıldız di 25ê Kanûna Paşîn de telefonî qeymeqamê Cizîrê Ahmet Adanur kir û navnîşana yekemîn jêrzamîne dayê, daku bombebarankirina li wê herêmê bê sekinandin. Piştî ku navnîşana jêrzemînê bi rayedarên dewletê re hat parvekirin, êrişên li apartmanê hatin gûrkirin û ji teref leşkeran hat dorpêçkirin.

Tevî ku DMME (Dadgeha Mafê Mirovan a Ewropa) “biryara tevdîrê” wergitibû jî, embûlans nehat şandin. Loma jî xwendekarê beşa erdînegarîya yê zaningeha Ege’yê di 23ê Kanûna Paşîn de can da.

> *Em 29 rojan di qedexeyê de man û wexta ku em vegerîyan, serê kewên zarokên me jêkirî bû bi camê ve daliqandî bû. Hê jî gelek wenda hene, malbat nagihêjin zarokên xwe. Xwezî hemû xan û manê min bişewitîya, hemû zarokên min bimrana û ew xwendekarên bo me hatin di jêrzemînan de neşewitîyana.*

Roja din xortekî navê wî ne dîyar û keçeke xwendekara zaningehê ku bo piştgirîya bi Cizîrê re hatibû, can da.

> *Em hînî mirinê bûne. Bo me ne girîng e jî, bi rastî a dilê me şewitand mirina ew ciwanên zaningehê bû ku bo me hetibûn...(38, jin, Mersin).*

Di 25ê Kanûna Paşîn a 2016an de di jêrzemîna yekem de Selamî Yılmazê birîndar ku ji gundê Hisarê ê Cizîrê bû, can da.

Di 25ê Kanûna Paşîn de ji teref birîndarên jêrzamîn ji Faysal Sarıyıldız re peyamek wisa hat şandin: “Anha apartmana ser me ruxandin. Em bi zorê nefesê distînin.”

Di 25ê Kanûna Paşîn de Mehmet Tunç bo şandina embûlansê ev peyam ji Faysal Sarı Yıldız re şand: Wer xwuyaye ku cîhan dengê Cizîrê nabihîze, êdî em çi bikin heval ku min dil hişti be li me bibore az ne baş im keçeke bi navê sûltan bi granî birîndar e ji min re tim dibêje babo min nehêle ez li vir dibehecim. Zarokeke sêzdeh salî heye, tim avê dixwaze û jiber ku navxwînî bûye, em avê nadin wê jî...

Di 26ê Kanûna Paşîn de Faysal Sarıyılıdız û heyetek ji 15 kesî ku ji malbatên kesên di jêrzemênan de asêmayî pêk dihat, dîsa hewl dane ku biçin cihê jêrzemîn lê, lê belê bo çûna wan dastûr nehatîye dayîn. Di 26ê Kanûna Paşîn de piş tî ku heyeta HDPê bo rewşa Cizîrê çû Wezareta Karê Hundirîn, dastûr hat dayîn, da ku birîndar werin hilgirtin. Piştî ku bi Enqereyê re danûstendin hat kirin, parlementerê Şırnexê Faysal Sarıyıldız telefonî Qeymeqamê Cizîrê kir û kir ku embûlans bo hilgirtina birîndaran têkeve rê. Lê belê bi piştî demeke kurt re pê hat hisandin ku di şûna embûlansa de wasîteyên zirxlêkirî çûne cihê wan apartmanan.

Di navbera kesên di jêrzemîn û heyeta HDPê de ku bo wan di greva birçîtîyê de bûn, bi saetan danûstendin hatin kirin. Ev danûstendin hemû ji teref heyeta HDPê hatin tomarkirin. Tomarkirina herî girîng ya ji wan tomarkirina di wexta serdegirtina jêrzemînê de pêk hat. Endamê Meclîsa Partîya Herêmên Demokratîk Mehmet Yavuzel ku ew jî birîndar bû û di dema serdegirtinê de hat qetilkirin, bi Meral Danış Beştaş re, ku wê wextê embûlans ketibû rê, bi rê ya telefona mobîl wisa axivî(Ev axaftin ji teref rayedarên hukûmetê jî hat guhdarkirin):

Tomara Yekem:

Meral Danış Beştaş: Em nuha embûlansê dişopînin. Di rê de ye.

Mehmet Yavuzel: Belê.

Meral Danış Beştaş: Bila bighêjê, emê telefonî te bikin.

Mehmet Yavuzel: Temam heval. Li cem me hema dengek tune yanî...

Meral Danış Beştaş: Tamam, tamam. Vê gavê embûlans ku bighêje ez ê telefonî te bikim.

Mehmet Yavuzel: Xebera we jê hebe, tu deng tune.

Tomar Duyem:

Meral Danış Beştaş: Nuha me bi Wezaretê re dan û stendin kir. Her yek ji me ewê bi telefonekê re mijûl bin.

Mehmet Yavuzel: Belê.

Meral Danış Beştaş: Hûn ji nuha de amadehîyên xwe bikin, vê gavê pesend kirin lê belê...

Mehmet Yavuzel: Temam.

Meral Danış Beştaş: Ku me telefonî we kir, hûn ê derkevin.

Tomara Sêyem:

Meral Danış Beştaş: Deng qût bûn? Dengê polîsan...

Mehmet Yavuzel: Li vir in. Li qorîdorê ne.

Meral Danış Beştaş: Hema li pêşîya derî ne ku hûnê tê re derkevin.

Mehmet Yavuzel: Belê belê li hundir in.

Meral Danış Beştaş: Li hundir in.

Mehmet Yavuzel: Belkî dengê te jî dibihîzin. Telefon vekirîye jixwe. Wezîrê Karê Hundirîn jî li gel te ye?

Meral Danış Beştaş: Nuha ew li alîyê telefonê...(wê gavê dengê teqînan, çekan û qîrîna kesên di jêrzemînê de ji alîyê telefonê yê din tê.)

Tomara Çarem:

Meral Danış Beştaş: Elo

Mehmet Yavuzel: Heval guhê min xerab in, ez nabihîzim.

Meral Danış Beştaş: Vê gavê tu dengê min dibihîzî?

Mehmet Yavuzel: Pir kêm tê.

Meral Danış Beştaş: Pir kêm. Ez nuha bang dikim. Biner bang dikim. Heger hûn nikaribin ji wir derkevin, divê em formuleke din bibînin.

Mehmet Yavuzel: Em di bin enqazê de ne. Ez çawa vebêjim haho!

Meral Danış Beştaş: Tamam tamam, hun ne di wê rewşê de ne ku derkevin yanî.

Mehmet Yavuzel: Em di bin enqazê de ne enqaz!

Meral Danış Beştaş: Temam bila telefon vekirî bimîne. Nikarin derkevin, nikarin derkevin.

Piştî ku heyeta HDPê ya li Enqerê û Faysal Sarıyıldızê li Cizîrê bi telefonê dan û stendin kir, îrtibat bi mirovên birîndar û westîyayî re qût bû ku di jêrzemîna Apartmana bi nimra xwe 23 ya li mehelleya Cudîyê li kolana Bostancıyê de asê mabûn. Di 12ê Sebatê de, 26 meyît bo nexweşxaneya Cizîrê hatin hilgirtin.[16]

---

[16] Anatomîya Wahşetekê, Rapora Dorpêça Cizîrê ya Rojanekirî û Berfirehkirî, HDP, 5ê Adara 2018an

*Hevserokê Şaredarîya Cizîrê Kadir Konuk


REİS
GEREĞİ
YAPILDI

Di qedexeya 79 rojî de qetlîama ku wek wahşeta jêrzemînan di hiş de cih girt, wek yek ji bûyerên herî trajîk ên dîrokê hat pesendkirin. Hat peytandin ku 177 mirov hatine qetilkirin ku bo xweparastina ji ber bombearanê xwe spartibûn 3 jêrzemînên saxlem.


Mirov sûretê perçeyên kesên şewitandî digrin ku di jêrzemîna yekem de hatibûn qetilkirin.

Berî bûyerên jêrzemînê 85 kesî can da. Ev 85 kes hemû gelê Cizîrê ye, îkameta wan li vir e, em ew kesan nas dikin ku li ku rûdinên, kî ne. Agahîyên derheqê wan hemûyan de li cem me hene... Ji ew kesên di jêrzemînan de em jî ne agahdar bûn. Bi piranî ciwanên xwendekarê Zaningehê bûn ku berî qedexeyê bi rojekê bo piştgirîya bi Cizîrê re hatibûn. Bi pişt re em pê hesîyan ku li dûv destpêkirina qedexeyan di Cizîrê de asê dimînin. Em hejmara wan a safî nizanin lê belê em texmîn dikin ku li derdora 40-50 ciwanî hebûn... Di 3 jêrzemînan da 176 kes bi komî hatin qetilkirin.[17]

---

[17] Hevserokê Şaredarîya Cizîre Kadir Konuk

Bi piştî Gimgimê re li Cizîrê tundîtîya aşkere

Bûyerek mîna bûyera kuştina Kevser Eltürkê (Ekin Wan) li Cizîrê qewimî ku bûyreke herî girîng bû û di wê bûyerê de Kevser Eltürk piştî ku hatin kuştin bedena wê ya tazî li kolanan hat teşhîrkirin û ew bûyer bibû sedema kolandina xendeqan û gûrrbûna pevçûnan li Gimgimê û bajarên din. Di dema dorpêçê de ji teref hesabên (medyaya civakî) leşkeran sûretên di jinên tazîkirî hatin parvekirin ku ji teref leşkeran hatibûn kuştin.

Çalakîya Protestoyî li bajarê Elmanya Hamburgê

Yek ji meyîtên hat teşhiskirin yê keçeke 16 salî, Sultan Irmak e. Dewlet ewê bi kuştina zarokên 16 salî hizûrê bîne vê xakê? Di ev 40 salên bihurî de me hîn nekir ku bileqsî vê ye? [18]

---

[18] Mehveş Evin: Bedena mirî ya jinê tolhildana çi ye?

Di 2ê Adara 2016an de ku roja 79emîn a qedexeya derketina derve bû, di saet 05.00-19.30an de qedexeya derketina derve hat rakirin. Ji vê demê û pê ve qedexe bi şevê berdewam kir. Dİ 28.03.2016an de jî qedexe di navbera saet 21.30 - 4.30ên şevê de hat tetbîqkirin.

Memet Tunç (Berî ku were qetilkirin): “Bo vegotina bûyerên li vir, divê mirov li vir be. Wexta ku em li malekê bûn û piştî ku ewên tevlî me bûn 4-5 roj berê em bûn 28 birîndar. Mixabin ji ber ku me pêdivîyên tenduristîyê çareser nekir, 4 kesan can da. Ew mala ku em lê ne, cenaze tê de ye. Me betanî lê pêçand. Hêdî hêdî bêhn ji wan tê. Ji ber bêhewîyê jixwe ne jîyanbar e.

Em neçar in. Do min lingê Selamî cihê, Yılmaz bi qayîşê girêda, şîn bû. Ez vedikim, xwîn diherike. Min ji ber xwînjêçûnê zarok xelas nekir. Ez xwe wek qesasê wî dibînim. Tu derdikeve derve, li te tê lêdan, tu di malê de dimîne, tu tê bombekirin.”

Dayika Mehmet Tunç, Esmer Tunç: “Kulmek xwelî dan min” gotin “Ha ji te re ev lawê te ye” “Gunehê me çi bû? Wek Kurdekê li Cizîrê jidayikbûne?”

Mehmet TUNÇ
CENAZE TAŞ

Xizmê Mahmut Duymakê ku di jêrzemînê de hat kuştin: “Em çûn derdora jêrzemînê. Me go em ê birîndarên xwe hilgirin. Em hatin kolana Cafer Sadık. Hawîrdora me girtin. Du sê metre mabûn ji jêrzemînan re. Di navbera me û polîsan de 10 metre hebûn. Polîsan ji me re go”çi karê we heye li vê derê?” Me go “em hatine birîndarên xwe bibin.” Wan go “ma hûn nizanin ku li wê derê mayin hene?” Me go “heger ew bimrin bila em jî bimrin.” Ku ew herin em ê jî herin. Em axivîn me derdê xwe ji wan re go. Ji hemberê de yek hat. Wek zebanîyan bû, ne dişibîya însanan. Di destê wî de keleş hebû, da serê me. Tu dibêjî qey di destê me de çek hebû, tu dibêjî qey em çûbûn li dij wan şer bikin wisa bi me re tev gerîyan. Em hemû kom kirin, bi çar panzêran dan dû me û em birin emnîyetê... Wexta ku em çûn ew derên jêrzemînê me tu bombe filan nedîtin, em di rê ya xwe de çûn, em di rê ya xwe de hatin. Bombe qet tunebûn, bi tenê têlên elktrîkê yên qutbûyî habûn. Dewletê tim derew kirin. Wê bi xwe li embûlansê direşand, digo “li wê derê pevçûn heye.” Wexta ku em çûn wê derê qet pevçûn tunebûn...Kesî cenazeyên xwe hilnegirt, ya parçeyek hestî stend... gotin” ha ji te re ev cenazeyê te ye.”

Xizmê Abdullah Gün ku di 15 salî ya xwe de li jêrzemînê hat kuştin: *"Abdullah di roja 29em de ji malê çû. Ji ber ku nedixwest hevalên xwe biterikîne, ji jêrzemînan derneket. Di 5ê Sebatê de ji jêrzemînê derdikeve bo kontrolkirina hatina embûlansê. Segvanan hem bi derketina wî re lê dane.Ji ber ku ew zarok e gotine "ew biçûk e, midaxaleyî wî nakin." Ku embûlans hatibûya ewê hemû derketana derve. Piştî ku lêdana, cenazê wî li derve maye. Ewên di jêrzemînê de nikarîbûn têxin hundir, çi bûye em nizanin. Me hê jî meyîtê wî nedîye. Wexta ku ew hatîye lêdan li kolanê mirîye Abdullah, saetek filan jî sax nemaye. Embûlans qet nehatîyê nêzê. Lê belê li nêzê panzêr hebûn."*

2016
539
2016
538
2016
603
2016
604
2016
539
2016
538
016
593

Şahidê/a 1em (Hevserokê ŞaredarÎya Cizîrê Kadir Kunur):

Jiber Gefa Kîmyasalê koç hat kirin

> “Em wek şaredarîyê, hata domahîya qedexeyê em li şaredarîyê man. Em bi ekîba îtfaîyê û av belavkirinê, yeka din rêveberî yek serok, yek alîkarê serok, endamê encumena şaredarîyê, endamê me yê daîmî û xebatkarên me yên tenduristîyê re li vir me wesîfedar kir. Şert û merc çi dibe bila bibe, ewê li vir be, tiştê ku dikarbe bike ewê bike. Ew bûyera koçê ku tu bahs dikî bi rastî piştî peyama ku ji mamosteyan re hat şandin, bi pêleke qismî qewimî li Cizîrê. Gelek hemwelatî jî wê demê derketibûn lê belê piranîya hemwelatîyan li cihê xwe man. Bi piştî roja 30em a qedexeyê re kurtepist belavkirin. Bi vî şiklî bû ku him ewê avêtina topan him jî ewê zext û tundîtê werin zêdekirin, yeka din ewê çekên kimyewî were bikaranîn. Kurtepisteke wisa tewşo mewşo belav kirin, di înternetê de, di medyaya civakî de bayek hat rakirin. Li ser koçkirinê ev bû sedem.Bi derkestina ev kurtepstê re, bi derketine ev gotinê re li hemû mehelleyan, wê wextê mehelleya Yafesê hatibû belavkirin lê belê mehelleya Surê, Cudiyê û Nurê her kes lê runiştî bû. Piranîya nufûsê li cihê xwe îkamet dikir. Bi piştî wê vegotinê re pêla koçê destpê kir.

Şahidê/a 2em: (Piştî ku qedexeya derketina derve destpê kir bi du rojan, di 16.12.2015an de bûyera kuştinê ya yekem ji teref hêzên rejîmê hat pêkanîn) Şahidîya Mahmut Şen, hevserê Hedîye Şena ku di wexta derketina hewşa xwe de bi gelek guleyan hat lêdan û jîyana xwe ji dest da:

“Ji nişkave ez veciniqîm, Hedîye kiriye qîrîn. Tarî bû. Min bang kir, go ‘Hedîye’, Min bi destên xwe peland, ji ber ku tarî bû min nedît. Wexta ku min xwest ez vegerim paş cihê xwe yê ez lê, lingê min li lingê wê aliqî, ez ketim. Çavên min hînî tarÎtÎyê bû. Gule li qirika wê ketibû. Bi qasÎ nÎv saetê ji qirika xwe ve nefest stend. Xirînî dikir. Min bang dikir, digo ‘Hedîye, Hedîye!’ Ez rabûm min telefonî 112ê kir, 155ê kir. 112ê ji min re go ‘ bînin Dörtyolê’ Min go ‘ Ez nikarim ji malê derkevim, hûn ji min re dibêjin, ji 3 km’an rê bîne.’ Ez çawa bînim? Min telefonî 155ê kir. Min go ‘we li hevsera min da’ Min go ‘li vêderê pevçûn tunene. Wasîteyên polîsan 100 metreyan li pêş in. Werin, hilgirin, 112 nayê.’ Bi vî awayî bi caran geh min telefonî 112ê kir, geh min telefonÎ 155ê kir, min bi deh caran telefon kir. Tabî wê gavê min xwe wenda kiribûye. Ez hey diqîrîyam. Zarokan fahm nekir, ka çi bû ye. Min gef jî li wan xwar. Min go ‘li vir ne xendeq, ne barîqat, ne pevçûn hene.

Wa çawa li jina min da?” Min go werin birîndar e.’ Min go ‘ger hûn neyên, ezê bibim xwekuj û rojekê we hamûyan bikujim’. Bi vîawayî niv saet çû. Pişt re ez li

Hediya vegerîyam. Mirî bû. Ez qîrÎyam, min bang li cîranan kir. Tabî giş feqîr bûn, kes ji tirsan nehat.

Bang dikirin lê belê nikarîbûn bihatana. Dawîya dawî Melle Mensûr hat, xwe ranegirt. Sê mal hebûn di navbera me de. Heta ku hat lê reşandin. Guleyek bi tesadufî bi lingê wî re xişiqîbû. Telefona parlementer Faysal hebû. Li cem min tunebû. Wi telefon kir, dengê me belav kir. Mele Mansûr telefonÎ miftîtîyê kir, bi miftî re axivî. Lê belê kesê guh neda. Heta sibehê Hediye wisa li erdê ma..."

Şahidê/a 3em: Ez diçim pola 12em. Ez îsal neçûm dibistanê. Ez bi pîrika xwe re dijîm. Di roja 20em a qedexeya derketina derve de, em çûn mala xweha bapîra xwe ya li Kumçatiyê... Me berê erzaq stok kiribûn lê belê pirên wan kufikî bûn. Loma min ji ser xanî xwe avêt û çend caran çûm marketê. Bo gihiştina marketê min ew qulikên ku di hundirê malan de hatibûn vekirin, şopandin û gihiştim marketê. Ji ber ku bidîtina ewê gula berdana me. Ava me tune, elektrîka me tune. Di roja 20em a qedexeya derketina derve de me telefonî 155ê kir. Me go dengê çek û êrîşan pir zêde bûne û divê em derkevin û me go ewê alên boz di destê me debin. Bi vî awayî em ji mala xwe derketin, em çûn Kumçatıyê. Lê belê cîranê me Şükrü li paş mala me, li orta kolanê, hat lêdan. Ji saet 20.00ê êvara ta saet 08.00ê sibehê, bi domahîya 12 saetan, li erdê bi birîndarî ma. Sibehê cîranan bi îmkanên xwe, mirin dan ber xwe, betanîye li Şükrü pêçan û ew bir nexweşxaneyê.

ILYAS AKENGIN / AFP

Şahidê/a 4em: Ez li mehelleya Cudîyê rudinêm. Lawê xalê min Murat Ekincî ji li mehelleya Cudîyê rûdinişt. Di 20ê Kanûna Paşîn de ji teref segvanan hat lêdan, cenazê wî du rojan li erdê ma. Bi pişt re cenazê wî ji teref malbata wî û Faysal Sarıyıdız hat hilgirtin. Lê belê wexta ku Murat hat lêdan, kurxalên min ên din, Muharrem Erbek(16), Mahsun Erdoğan(20) û Sabri Sezgîn(18, xwendekar) bo hilgirtina cenazeyê Murat li mehelleyê man. Bi pişt re ji wir derneketine û xwe spartine jêrzemîna yekem, bi piştî êrîşan polîsan re li wir tên kuştin. Di vê qedexeyê de mala me û ya apên me hatin şewitandin, ruxandin. Em nuha li mala apekî xwe ne, mitfaxa wan xera bûye, cihên malê yên din saxlem in. Bi 25 kesan re em li eynê malê ne. Derî û paca malê tune, ava me, elektrîka me tune."

Şahidê/a 5em: Em 20 rojan di pêvajoya dorpêçê de man. Ez ducanî bûm û tevî ku ez nexweş bûm jî, ez nikarîbûm biçîyama doktor. Jintîya min ewê zarok bianîya dunyayê û mimkin nebû biçe nexweşxaneyê. Tevî ku tu tecrûbeya min tunebû jî, min kir ku zarok biwelidîne. Elektrîk tune bû, em bi şewqa telefonê tevdigerîyan. Ji ber ku min meqes nedî, min navika wê bi kêrê jêkir. Welidandin pir bi zahmetî derbas bû. Zarok şîn şînî bibû.

Şahidê/a 6em: Xwezî mirin çênabûya, lê belê xwezî em birçî bimana, mala me xera bibûya, lê belê mirin çênebûya. Sê xizmên min jîyana xwe ji dest dan. Cerdevan ketine mala me. Mirîşk û elok li ser doşekên me serjêkirine. Bombe avêtine mala me. Keça min hey ji ser hişê xwe ve diçe. Li dîwarên me nivîs nivisandine "hun rehet nesekinin em ê dîsa werin".

Şahidê/a 7em: Me tim ji pacê de dişopand, meyît li erdê bûn, dîmenên ewên mirî li ber çavê me ne. Anons dikirn tim digotin”ji malê derkevin.” Anons dikirin digotin”me bihîstîye keçên vê mehelleyê xweşik in, em hatin hûn li ku ne?” Jinbira min ber avêt. Ez jî tim ji ser hişê xwe ve diçim, bênefes dimînim. Dema ku xwarina me qedîya û ji tirsa tecawizê em hemû ji malê qetîyan. Mala me serobinî kirine. Di hindirê malê de jî derketine tiwaletê. Li ser dîwarên me” wî emir kir, me jî kir’ û “ ne me, Xwedê ev li we kir”, nivîsandibûn.

Şahidê/a 8em: Bi qasî ku derfetên me hebûn em man. Em qet ne baş in. Anons dikirin, digotin ‘‘pîçên Ermenan.” Ji tirsan ez nexweş ketim. Bi şevê ricf dihat min. Canê min hey dixwure. Elektrîk tunebû, av tunebû. Xwarin tunebû.

Hewa sar bû. Ji tirsan me sobe vênedixist. Em ji malê derketin. Wexta ku em vegerîyan mal di rewşeke perîşan de bû. Binçekên me belav kiribûn. Hin jê bi mirêkê ve daliqandibûn. Ên din li ser doşekê raxistibûn. Min hemû şewitandin. Min ji jinê din re jî go "bişewitînin."

Şahidê/a 9em: Ez diçim mektebê, tevî ku di destê min de pirtûk jî hebûn, min disekinandin, digotin " tu diçi ku derê?" Heqaretê li me dikin. Em nikarin tiştekî bibêjin. Çendek berê min sekinandin, gotin "tu çima li me dinehêre?" û dan çêran. Li vê derê heyat nema, her tişt li gor wan tê sazkirin. Birayên min ji xew radibin, diqîrin û dibêjin "derî bigrin!", "hatin." Her tişt tê ber çavê min, kesên mirî li ber çavê me kişkişandin û birin. Wexta ku em vegerîyan û hatin hem betanîyên me di nav xwînê de bûn, me xwe negirt û hemû avêtin. Ez ji bîr nakim. Wexta ku ew nivîsên li dîwaran dibînim, hêrs dibim, fedî dikim.



Şahidê/a 10em: *İnsan li vê derê di jêrzemînan de hatin şewitandin. Xizmên me jî hebûn di hındirê jêrzemînan de. Di hişê min de tim sewal hebûn ku ‘’gelo em ê bimrîn an jî em ê sax bimînin?” Dema ku dengê guleyan dihat min radihişt xwuşk û birayên xwe û diçûm odeyê û bo ku netirsin ez li cem wan disekinîm. Wexta ku wasîteyên zirxlêkirî di mehelleya me re derbas dibe pir zora min diçe, nasên me şewitandin. Ez ji lîskên çekan hezdikim êdî. Min ji borîyê ji xwe re çekek çêkir. Ez xwe bi vê diparêzim. Wexta ku memosteyên me, em berdan û çûn, min go qeyn êdî dibistan qedîya û ez fikirîm ku em ê hemû bimrin. Di wexta qedexeyê de, me polîs didîtin, em ditirsîyan. Carekê me bi futbolê dilîst, polîs hat û xwest ku ew bilîze, min jî go “em kurd in, hûn jî Tirk in. Ka em biner bê kî bi ser dikeve.”*

Şahidê/a 11em: *Ev apartmana ku hatîye ruxandin ya min e. Li vê derê neh daîreyên min hebûn, tiştek li dû wan nemaye. Ez ê çi bikim? Ez ê çawa xwe bidebirînim? Ewê kî hesabê van bide? Heya nuha hûn li ku derê bûn, berî ku mirov bimrin, berî ku wahşet biqewimin divê hûn bihatana. Tiştekî ku hun li vir bikin tune ye. Herin li Nisêbînê, Şirnexê bisekinin, berî ku ew der jî têkevin vî halî...*

Şahidê/a 12em: Li vê derê dewletê qirkirinek pêkanî. Mirov di jêrzemînan de hatin şewitandin. Qedexeya derketina derve hebû dîsa jî mirov ji teref segvanan di malên xwe de hatin lêdan. Ev kirin ku li ser Cizîrê şikandina şeref û rûmeta gelê kurd kirin armanc. Lê belê gelê Cizîrê çaog danenî erdê. Dewletê ji dergûşa 4 mehî û kalê 70 salî re go ‘terorîst.” Dibêjin ‘’xendeq”, xendeq ewil li pir li jor, li serê kolanan bûn. Ku xendeq pirsgirê bûna tevî ku xendeq li jor, li serê kolanê bûn, segvanên li ser cihên bilind gule bera hemû tiştên ku hereket dikir, nedida. Dewletê bi bêhna fireh dikarîbû pirsgirêka xendeqan çareser bike. Pirsgirêk ne xendeq bûn, li gor dewletê pirsgirêk Kurd bûn. Bi piştî rakirina qedexeyê du kesên sivîl carek du carqn hatin malê, pirsa birazîyên min kirin. Em tim di bin zextan de ne...

Şahidê/a 13em: Lawekî min ji ber gule berdana hêzên taybet ên herekatê hat kuştin. Lawekî min birîndar bû rewşa wî pir ne giran bû. Ew birin nexweşxaneyê. Go "min nebin nexweşxaneyê ewê min bikujin." Bi Xwedê li nexweşxaneyê kuştin...Em niha ji ber wê poşman in. Em bûn sebebê mirina wî...

Şahidê/a 14em: Di 2ê Kanuna Paşîn a 1994an de serdegirtin çêbû. Polîs hatin malê û gotin ''mahkemeya we heye" û min û Kemal birin. Em birin Nisêbînê. Li Nisêbînê em birin qereqolê. Piştre min berdan. Ji wê rojê de ye me agahî ji Kemal wernegirtîye. Cenazê wî li ku derê ye, em nizanin. Piştî ku ev bûyer qewimî bi mehan Garîp welidî... Ew ji bavê xwe emanetî me bû tabî. Ew, ji zarokên din hemîyan bêhtir biqîmet bû... Piştî roja 30yem bû. Garîp bi roj dihat malê. Bi şev diçû. Wexta ku dihat bo ku neçe min hewl dida. Lê belê digo ''ez nikarim dev ji hevalên xwe berdim." Digo "ez narevim." Di saet 10ê sibehê de hat, me hemûyan bi hev re taştê xwar, ew derket. Min go ''neçe." Go '' ez diçim û êdî nayêm." Çû, Li der dora saet 1-2 an min telefonî wî kir, telefona wî girtîbû. Saet bû 4 hê jî telefona wî girtî bû. Ji ber bombeyan û topan me nikarîbû serê xwe jî di şibakeyê re derxe. Bu şev. Lawê min çû mala sersaxîyê. Vegerîya û go "Garip şehît ketîye û li mala sersaxîyê ye". Min çû lê nêherî. Dikenîya.

Şahidê/a 15em: *Ewil ji ser gir de bombe barandin, piştî ku her der hat bombekirin û ruxandin, ketin kolanan. Çendîn caran me telefonî 155ê kir, me go ‘’em dixwazin derkevin”, pişt ku me ev go, cihê ku em lê bûn, bêhtir hat lêdan. Em bûn ku wek ku me xwe îxbar kiribe. Mesele ne mesela xendeqan bû, u wisa bûya, berê xendeq hatibûn kolandin lê belê bi dîyalogê hatibûn girtin, dîsa bi dîyalogê mimkin bû were girtin. Bi wasîteyên zirxlêkirî û bi kepçeyên zirxlêkirî wek hêzên dagirker ketin kolanan.*

Şahidê/a 16em: *Ez nabêjim, dahatûya min nema lê belê ez dizanim ku tu bixwazî nexwazî nema...*

Faysal Sarıyıldız: Di girtina xendeqên yekem de hewildanên parêzgarê berê hebûn, hewl da ku bi me re hevdîtinan bike û bi hev re vê pirsgirêkê hal bike. Ez jî wê wextêm pir xebitîm. Wê wextê me ji havalên xwe yên ku diçûn Îmralîyê re go “Bi taybetî rewşa li ser Cizîrê vebêjin, ciwan guh nadin me, lê belê peyama ku ji wê derê were, dibe ku wan mecbûrî rîayetê bike.” Piştre Hatip Beg hat vir, go “xendeqan bigrin.” Wê wextê nêzî 50 hezar mirov kom bûn, lê belê wexta ku Hatip Beg çû, hê li derdora nexweşxaneyê bû, zarokê bi navê Nihat Kazanhan hat qetilkirin. Hema di wê rojê de bû. Çend roj bi pişt re, digel mirinê jî me bi wasîteyên şaredarîyê xendeq girtin. Wasîteya zirxlêkîrî li ser xendeqên ku me ew girtbûn, derbas bû û li hindirê mehelleyê Ümit Kurt kuşt. Ev bûn û pê ve, êdî bo me bû zahmet. Piştî ku peyam ji Îmraliyê hat, me ew kanih kir bo ku xendeqan bigrin, lê belê wê wextê mimkin bû ku em bi parêzgar re têkilîyê deynin. Lê belê vê gavê rêveberên li vê derê rastîyê qetil dikin, ji serî hata binî derewan li raya giştî dikin. Bedena jinekê ya teşhîrkirî hebû, sûretê wê me ji hesabê medyaya sosyal ê leşkerên derqanûnî û operasyonel wergirt. Me ev vekoland, mirov hatin, gotin “ev der pêşîya mala me ye.” Me ji wan re go “edres ku der e”, me ji wan re go “kîjan mal e” Lê bel ê bo vê tu lêpirsîn nehat kirin û herwiha derew kirin.

DMZê û DMMEê biryara tevdîra îhtîyadî neda

Bo birîndarên di jêrzemînan de asê ma bûn, parêzeran daxwaz ji Dadgeha Makezagonê û Dadgeha Mafê Mirovan a Ewropayê kir, daku alîkarîya tenduristîyê bighêje û midaxaleyên ku berdewam dikin were sekinandin û tevdîra îhtîyadî were stendin. Her du dadgehan li ser gihiştina mafê tenduristîyê ji Parêzgarîya Şirnexê re û ji Hukûmeta Komara Tirkîyê re nivîs nivîsandin lê belê biryara tevdîra îhtîyatî a ku dihat daxwazkirin, nehat dayîn. Wexta ku li dadgehan pêvajoya daxwaza tevdîra îhtîyadî berdewam dikir, di 7ê Sebata 2016an de di kanala fermÎ ya dewletê de nuçeyeke wisa hat weşandin ’’ Di operasyona jêrzemînan de 60 terorîst hatin kuştin.’’ Ji vê tarîxê û pê ve ji kesên di jêrzemînan de asê mabûn, bi tenê nûçeyên mirinê û dîmenên bedenê şewitandî man.

Hemû kesên ku serî li DMZê û DMMEyê dan hatin kuştin:

Jêrzemîna 1em: Mehmet Yavûzel û yên din/Tirkîye (Nimra Serlêdana DMZê: 2016/1652)/(Nimra Serlêdana DMMÊ: 5317/16)

Jêrzemîna 2yem: Mehmet Balcal û yên din/Tirkîye(Nimra Serlêdana DMMEyê. 8699/16

Jêrzemîna 3yem: Derya koç û yên din/Tirkîye(Nimra Serlêdana DMMEyê: 8536/16)

Zilm li me bû, qirkirin bû, wahşet bû. Ez çawa bibêjim, ez bi çi kelîmeyan ji we re bi lêv bikim! Ez ji bo dê û bavê xwe nezewicîm. Sirf bo ez baş li wan binehêrim, bo ku nazdar bin... Wahşên xwedê bila werin û zerarî bidin dîya te, bavê te. Barbarên ku dibêjin ‘’hesp, jin, çek” bila werin te bikujin, ma ewê bi te tahde neyê? Wexta ku ew roj tên bîra min, ez ji her tiştî dûr dikevim, her tim dîmenên wan tankan, ew bombeyên ku avêtin tê bîra min.





Wexta ku ez hatim Cizîrê, Cizîr tunebû. Mirov ditirsîya ku têkevê. Bûbû bajarekî mirî; mal tunebû, kar tunebû, dikan tunebû... Ez birîndar bûm, kes ne bû alîkar ji bilî du cîranên min. Ez jî êdî bi kesî re nadim û nastînim, bawerîya min jî nema jixwe. Ez vekişîyam nava xwe. Xwezî malên me xera bikirana û mirovên me nemirana. Mal vedigere, mirov venagere. Ez ji sê cihan de hatim lêdan. Ewil ji lingên min de li min dan, daku bikevim, neketim. Min lawê xwe heta malê anî. Min go” ez wî bihêlim, ewê wî jî bikujin.”

Ji qedexeyan û vir ve nakevim cilan ji tirsan. Me her tiştên xwe wenda kirin, pirsgirêka hilmijînê bi min re çêbûye, bi zorê nefesê distînim. Heta domahîya jîyana xwe em ê jibîrnekin, ew hêsir ji çavên me kêm nebe. Ew çêrên ku li jinê me kirin qet ewê neyê jibîrkirin, ewê diguhê me de bin. Em xelke in ku ji berxwedanê hez dikin, me li berxwe da, wexta ku em bi ser ketin teqez me li berxwe da û qet em ê tune nebin. Îro dîsa berxwedana bajaran çêbibe, ez ê rasterast beşdar bibim.

Rewşa bêparsengîyê bi zarokan re çêbûye...Ji ber ku topên hawanê pir tên avêtin, wan rêbazek ji xwe re dîye; destê xwe dixin devê xwe û dieciqînin bo rêlibergirtina xwinjêçûna mîdeyê.

Zaroka min ewilî pir ditirsîya, piştre bertek nema nîşan da. Sebeba derketina me ya ji malê, me bihîst ku têkilîya leşkeran bi DAİŞê re heye. Ez ne ji mirinê ditirsîyam, ez ji namûsa xwe ditirsîyam.

Wexta ku em ji qedexeyê vegerîyan zaroka min go ‘’dayê piskilêtê min jî şewitandine.” Ez ê vê qet jibîrnekim wek dayikekê.

Di pêvajoya dorpêçê de em bûn şahid ku li kolana me çend heb meyît bi batanîyan hatin hilgirtin. Me niznîbû ku ew kî ne. Mala me xisareke mezin dît. Ez çûm dikkanê da ku hin tiştnin şêrîn bo zarokên xwe bînim. Tişten nema bû, min dî ku loqim mane, zarokên min jî pir jê hez dikir, min kirî, min li hemîyan wekhev par kir. Bo ku bimîne roja din jî, piştre lawê min ji min re go ”dayê bila pênc hebin, ma ewê çi bibe.” Min go ‘’na lawê min bila bimîne sibehê jî” Bû roja din me koç kir û ew loqim di hundir de man, ez pir li ber ketim ji ber ku min neda lawê xwe, hê jî di nava min de ye.

Em wê demê çûn gundê xizmên hevserê xwe. Me agahiya şehîtketina lawê xwe ji televîzyonê bihîst. Kezeba min şewitî axxx... em nuh çûn Mêrdînê, me xwîn da bo tespîte meyît. ... Gotin ‘’bila telefona we gav û saet vekirî be, dibe ku her wextê em telefonî we bikin.” Cihê ku ez lê bûm telefon nedikişand. Lawê min tim şipyakî bû daku bighêjin me, em agahîyekê wergirin. Piştre agahÎ hat, em çûn ku cenazeyê xwe bistînin. Çend heb wasîteyên zirxlêkirî jî bi me re meşîyan. Em hatin Cizîrê bo ku li ew goristana derdora mala me definbikin lê belê destûr nedan. Berê çekan dan me û gotin ‘‘nelivin, neivin!’. Mimkin nebû ku destê xwe bidim cenazeyê lawê xwe. Wisa bi qarh û kerb girîyam...

Di wê navberê re wext derbas bû, em li mal in, telefon hat ji lawê min î din re. Hema ku xeber wergirt li erdê ket lawê min. Meyitê ewil ne yê me bûye. Dîsa ez çûm bo xwîndayinê. Du caran min û lawê min kuştin. Disa em çûn bo stendina cenaze. Hawîrdora goristanê girtibûn, rê li ber her tiştî girtibûn. Nehiştin ku tu kes were cenazeyê me ...Ez hê jî dibêjim”ewê lawê min di vî derîyî re were.” Carekê şaşîyek bû, belkÎ dîsa şaşîyek bûbe, em nizanin.

10

Wexta ku em bi zarokan re li Cizîrê bûn, em bûn armanca top û çekan. Em direvîyan, li ber çavê min 2 kes li erdê ketin, mirin ez nizanim. Pişti ku me koç kir ew kesbi tu şiklî ji hişê min derneketin. Ez ji xwe ve çûbûm...Ez Cizîrê difikirîm. Min ê porê xwe şeh bikra. Wexta ku min porê xwe şeh dikir, min bi xwe û xwe go ‘’ tu çawa wan li wir dihêle û tu porê xwe şeh dike!” Hema min rahişt meqesê û bi hin û hêla xwe porê xwe ji kokê de jêkir.

Girgê Amo

Silopi


Silopi
Toplam Ölüm Sayısı: 105
X
Sivil
Tanımlanamayan Gençler
PKK Gençlik Yapılanması (YPS)
PKK Militanı (HPG)
Güvenlik Gücü Mensubu
Toplam Ölüm Sayısı
15
10
5
0
Tem
Oca 2016
Tem
Oca 2017
Tem
Oca 2018
Tem
Bitlis
Van
Batman
Siirt
Mardin
Hakkâri
Şırnak
Silopi
(105)
Qamişlo
المالكية
دهۆک
الحسكة

SİLOPİ
Nüfus: 89100

GIRGÊ AMO - SİLOPİ

Li Girgê Amo 3 caran qedexeya derketina derve hat îlan kirin. Qedexeya yekem di navbera 07.10.2015-09.10.2015an de 3 rojan bênavber hat tetbîqkirin. Qedexeya derketina derva ya 14ê Kanûna Ewel a 2015an, ku di heman rojê de li Cizîrê jî qedexya derketina derve hat îlankirin, 37 rojan bênavber dom kir.

Ji 19 Kanûna Paşîna 2016an û vir ve qedexe di saetên şevê de hat tetbîq kirin. Piştî 5ê Nîsanê qedexeya derketina derve 19 rojan bênavber hat tetbîqkirin. Qedexe di 10ê Nîsana 2017an de bi temamî hat rakirin.

Di pêvajoya qedexeya derketina derve ya di 14ê Kanûna Ewel a 2015an de Girgê Amo jî wek Cizîrê di heman rojê de rastî êrîşeke mezin hat. Avahîya şaredarîyê, dibistan û mal wek biryargehan û qereqolan hatin bikaranîn. **Dibistana Cumhuriyetê, dibistana Süleyman Demirel, dibistana Yenîşehîrê, dibistana Sevgîyê, dibistana 23 Nisanê wek biryargehan hatin bikaranîn.**[19] Pevçûn bêhtir li mehlleya Nur'ê, mehelleya Cudi'yê, mehelleya Başak'ê û meheleya Barbarosê rû dan. Di 19ê Kanûn Paşîna a 2016 an de ku di wê rojê de qedexe di saetên rojê de hat rakirin, 29 kesan can da, 17 kes jî birîndar bûn.

---

[19] Parêzgeha Şirnexê Navçeya Girgê Amo qedexeya derketina derve-Rapora çavderî û tespîta binpêkirina mafan, İHD, TİHV, Komaleya Huqûnasên Mezopotamyayê, Baroya Amedê, 24ê Adara 2016an.

Di vê pêvajoyê de hin bûyerên mirinê wisa qewimîn:

- Di 19ê Kanûna Ewel a 2015an de topên ku ji teref tankan hatin avêtin li Mehelleya Nur'ê li malekê ket, di encama vê êrîşê de Reşît Eren (17) û Axîn Kanat (16) can da.

- Di 19ê Kanûna Ewel a 2015an de ji ber lêreşandina hêzên rejîmê, ciwanê bi navê İbrahim Bilgiç(18) ji sînga xwe de derb xwar û birîndar bû. İbrahîm Bilgiçê ku li nexweşxaneya Girgê Amo dihat dermankirin, can da.

- Diê 20 Kanûna Ewel a 2015an de li mehelleya Cudiyê Ayşe Bruntekina 44 salÎ û dayika 9 zarokan dema ku derket ser banîyê mala xwe, ji teref polîsên operasyonên taybet hat kuştin.

- Di 21ê Kanûna Ewel a 2015an de topên ku ji teref tankan hatin avêtin li malekê ket, zarokê li malê yê bi navê Mehmet Mete Kutluk (11) ji ber ku şarapnelên topê li serê wî ket, bi giranî birîndar bû. Mete'yê ku bo nexweşxaneyê hat hilgirtin, berî ku bighêje nexweşxaneyê can da.

- Di 29ê Kanûna Ewel de li Mehelleya Barbarosê Seyfettin Sidarê bavê 2 zarokan bo şerjkirina telefona xwe ji malê derket, heta domahîya 4 rojan agahî jê nehat wergirtin. Cesedê Sidar li nava kolanê hat dîtin, ji piştê de gule lê ketibû.

- İsmail Yavşanê (55) bavê 4 zarokan ku li Girgê Amo dikandar bû, di 30'yê Kanûna Ewel de li mehelleya Nuhê mirî hat dîtin, Yevşan ji serê xwe de hatibû lêdan û êşkence lê hatibû kirin. Di medyaya civakî de ji teref hesabê bi navê JÖH/PÖH sûretekî meyîtê Yevşan hat parvekirin. Di sûret de hat xwuyakirin ku Yevşan ji serê xwe de hatiye lêdan, ben di histûyê wî de bû, esker û polîs jî li ser meyîtê wî bûn.

- Ciwanê bi navê Necatî Öden (18) dema ku di 31ê Kanûna Ewel da bo çûyîna mala cîranê xwe ji malê derket û pêve, heta 3 rojan agahî jê nehat wergirtin. Di roja 3em de dîyar bû ku Öden hatîye revandin û piştre hatîye înfazkirin. Yek ji bûyerên qedexeya derketina derve din ku pir caran rû dida, qewimî. Kesên ku Öden qetil kir, sûretê wî di medyaya civakî de belav kir.



Galıp Korkmaz @galip0617 21sa

Li Silopîyê berate heye destê wan sax be agirê we pir be, xayino

- Ji parvekirinên hesabê twiterê yê bi navê @galip0617 dîyar bû ku İsmail Özdenê 55 sali û bavê 4 zarokan jî mîna Necatî Özden hatiye qetilkirin. Li ser her du cesedan jî polîsên operasyonên taybet bi çekên lûle dirêj xwuya dikirin.

- Di 4ê Kanûna Peşîn a 2016an de Seve Demir a endama Meclîsa Partîya Heremên Demokratîk, Fatma Uyar a xebatkara Kongreya Jinên Azad û Pakize Nayir a Hevseroka Meclîsa Gel a Girgê Amo û ew kesekî mêr î bi wan re dema ku ji mehelleya Karşıyaka'yê derbasî mehelleya Yeşilyurt'ê dibûn, hatin kuştin.

FATMA UYAR
04.01.2016
PAKIZE NAYIR
SEVE DEMIR
ÇETIN TAŞAR
06.01.2016

- Li gor rapora otopsîyê ya Seve Demir, Fatma Uyar û Pakize Nayir, di meyîtê her 3 jinan de bi giştî 19 gule hatin dîtin. Li gor nûçeya DHA'yê(Ajansa Nûçegihanê Doğanê) di meyîtê Seve Demir de 11 gule, di meyitê Pakize Nayir de 5 gule û di meyîtê Fatma Uyar de jî 3 gula hatin dîtin.

DAHA KAÇ İNSAN
ÖLDÜRÜLECEK
#FatmaSêvêPakize
P-HDK KADIN KOORDİNASYONU
Saatçioğlu Optik

Beyana xizmê/a Pekize Nayır: Pîşeya wê kuafortî bû. Herwiha di HDPê de siyaset jî dikir. Endamê Komaleya Alikarî û Piştgirîya Cudî'yê bû. Di xebatan de çalak bû. Parêzvaneke aştîyê bû. Pakize û hevalên li gel wê qetil kirin. Pakize di roja bûyerê de li cem mala xaltîka xwe bû ku li mehelleya Yeşiltepe'yê rûdinişt.Dewlet bi anonsan dibêje ''mehelleyê vala bikin''. Pakize û kesên li gel wê dixwazin ji Yeşiltepe'yê ber bi Ofisê, mehelleyên ewle, ve herin. Her sê jî jinên bê çek bûn. Bo derbasbûyîneke ewle di bin menfezê re derbas dibin. Wê wextê Seve Demir birîndar dibe. Ew telefonî parlementeran dikin. Bi rêya parlementeran bi wezaretê re, bi emnîyetê re têkilîyê datînin. Cihê wan vediguhezînin rayedarên dewletê. Piştî veguhestina cihê wan avêtin gule û topan bi awayekî gûrr destpê dike. Ji saet 21.00ê ta saet 0.04ê li wê derê dimînin. Di saet 0.04ê de her sê jî tên înfazkirin. Her sê jin jî di kanalê de tên kuştin. Ew tên înfazkirin... Cihên ku tê re derbas bûn, berê sivîl bi alên boz tê re derbasdibûn. Ew herêm bo sivîlan cihê derbasbûyîna ewle ye. Dewlet bi vê baş dizane. Di heman rojê de meyîtên wan hatin wergirtin. Meyîtên wan çûn Şirnexê, xizmên wan ên li wê derê çûn meyîtên wan dîtin... Ji ber qedexeyê meyîtên wan destûr tunebû ku werin vir. Cenaze li wê derê hatin definkirin. Ji vir, ji Girgê Amo malbata wê ji ber qedexeya derketina derve beşdarî merasîma cenazeyê nebû.


PAKIZE NAYIR
FATMA UYAR
SÊVÊ DEMIR

- Qedexeya derketina derve ya ku di Kanûna Ewel a 2015an de hat îlankirin, di 18.01.2015an de hat rakirin. Piştî ku qedexe hat rakirin li Girgê Amo xebata tespîtkirina xisaran hat kirin. Li gor vê xebatê;

- Hat tespîtkirin ku 69 avahî di rewşa ruxandinê de ne; 147 avahî bi giranî xisar dîtiye; 72 avahî nîve nîv xisar dîtîye û dibe ku were tahmîrkirin. 125 avahî jî hindik xisar dîtîye. Ji teref hukûmetê ‘’biryara îstimlaqkirina lezgîn’’ di 6ê Adara 2016’de bo mehelleya Barbarosê, Başak’ê, Cudî’yê, Karşıyaka’yê, Şehit Harun Boy’ê, Nuh’ê, Yenişehir’ê û Yeşiltepe’yê wergirt. Piştî xebata tespîrkirina xisaran jî li bajêr xerakirin berdewam kir. Malbatên ku bi zorê ji Girgê Amo hatin koçkirin, çûn Wan’ê, Êlih’ê, Dilok’ê, Mersîn’ê, û Edene’yê.

Li rewşa ajalan binehêrin, hûn ê fahm bikin ku me çi jîya. Em jî nizanin bê em çawa dêhn nebûne.



Hatibûn mala me xera bikin. Min go “Ji bo Xwedê xera nekin.” Wexta ku min ev mal çêkir porê min reş bû, heta ku xelas bû, tayek porê reş di nav porê min de nema. Min go “Ji bo Xwedê nekin, lawê min neke...”

Mîsal nuha panzêr bi ser me de were, em nebînin, em xwe nedin alî ewê me bipelçiqîne û here yanî.

Panzêr hat. Min go ‘’Lawê min nekin, biner keça min astengdar e, hêwirzeyên wisa jê re ne baş e, nekin!” Go ‘’xaltîkê ez fahm nakim(Teyze anlamıyorum).” Bi pişt re min bang li du zarokên di kepçê de kir, wan jê re go. Li zarokê xistin. Min go li “keça min nexin.” Min nêherî go “ez jî astengdar im, rapora min jî heye.” Li keça min a astengdar xistin, lingê wê şikandin, çavên wê şîn kirin. Li ser cehdeyê polÎsan wisa kir. Keça min çar caran li wê derê çar caran ji ser hişê xwe ve çû. Mal xera kirin, wisa keça min go “dayê dayê” û girîya. Çavên wê nedidît êdî, çavên wê tije xwÎn bibû. Lawê apê min heye, ê şehît bibû, ez çûm mala wî, ez bi wan re çûm cem polîsan. Polîsan go ‘’ew ê ku lê da, ne ji me bû, yekî kincê polîsan li xwe kirye.” Dixwastin bincilik bikin... Pişt re keça min gotîye ‘’hûn mala me xera dikin.” Wan jî heqeret kirine. Min jî go ‘’bila dozger jî were, polÎs jî were, vê keçikê bi tenê têxin odeyekê, bi saetan tiştnan jê re vebêjin, ku ew tiştekî fahm bike, ez tiştekî nabêjim. Kaça min astengdar e.” Werhasil mehkemeya min şeş mehan dom kir, mehkemeya min jî betal kirin. Jixwe em ditirsin, dewlet dev ji me bernade. Hevserê min ji teref dewletê hat wendakirin. Ev mala me ya pêncan bû. Jiber qîrînîya keça min pirsgirêkên derûnê pê re çêbûye, loma. Yanî çiqas şerpezetî hebû, me dît. Bê cih û war man, tiştekî ku me nedî nema yanî.

Berê ku dibû şev min li pêşîya malê doşeka xwe radixist, heta domahîya şevê min li stêrkan dinêherî, wisa li derve radiketim. Lê belê nuha ez newêrim derî vekim.

Şahid: Me xwe avêtibû jêrzemîna cîranê xwe. Lê belê di baxçeyê paşîn re ez û dîya xwe zîvirîn, em çûn, me nan êm da heywanên xwe. Pişt re dema ku dîya min bi tena serê xwe bo şîr ji marketa li serê kolanê ji birayê xwe re bîne ji derî derket, ji teref segvanan hat armanckirin û lêdan. Bi alîkarîya jinbira min û bavê min me dîya min kişand hundir. Pişt re ji ber ku em nikarîbûn li malê bimînin dîsa me xwe avêt jêrzemînê. Bi îmkanên xwe me tiştekî wek sedyê çêkir, me ben li guçên wê girêdan, me meyîtê wê danî ser me serê ben avêt ji cîranan re û bi alîkarîya wan me dîsa em vegerîyan jêrzemînê. Em bi meyîtê dîya min re şeş rojan li heman cihî man. Birayê min ê biçûk li derîyê odeya ku dîya min lê bû, dixist, digirîya û digo"derÎ veke!" Ji wê rojê û pê ve ez bi xwe raneketime, birayê min jî yek biyek dest rûyê jinê ku bi şev radiketin, dida, li dîya min digerîya. Di dawîya roja 6em de bi wê sedyaya ku me ben li guçên wê girêdabûn, me meyîtê xwe gihand mizgeftê. Meyit ji wê derê ji teref hêzên dewletê hat hilgirtin, bo otopsîyê birine Nexweşxaneya Dewletê ya Şirnexê, ji wir jî birine depoya hewa cemidîya li Haburê. Pişt re bêyî destûra me ew defin kirine. Ew a di gorê de ne dîya me ye, em nizanin. Hemû hewildanên me bêbersiv man û em neçûn gora dîya xwe.[20]

---

[20] Rapora Lêgerîna li ser Pêvajoyên Psîkososyal ên Zarok û Jinan ku Dema Vegerên Di dema Pêvajoya Qedexeya Derketina Derve de û Piştî Piştî Rakirina Qedexeyê Jîyane, GABB, Gulana 2016an

PAKPEN

Şahid: *Ji ber helwesta tund ya hêzên ewlehîyê min go ''hinekî sakîn bin!" Ji min re(bi qesta jinên li malê) go "ez dikarim nuha tecawiz bikim, bikujim, bigrim û bibim, ev selahiyeta min heye."*[21]


ÖNCE VATAN
JÖH
DERSE DEVAM
JOH
ÖNCE VATAN!
Ayyıldız TİM
ELMA DERSEM ÇIK


FB
YALÇINHAN TİMİ
SERHILDAM TİMİCİK NERDESİN?
H

---

[21] MAZLUMDER Rapora Çavdêrî û Lêkolîna Navçeya Parêzgeha Şirnexê Girgê Amoyê, 04.02.2016

Lawê Taybet înana ku li cihê hat lêdan, 7 rojan meyitê wê li erdê ma, li ser dîya xwe ev ristik nivîsîn:

Wexta ku dayika min hat lêdan, agahî dan me, em revîyan, berî ku em bighêjênê apê me xwestîye bighêjê, li wî jî dane. Wexta ku em çûn cîranan apê me hildigirt, min go “dîya min.”, gotin “li kolanê ma.” Min xwest ku ez herim, min girtin. Ez girîyam û girÎyam û girîyam...

Dayika min wisa li orta kolanê me. Berê hema bi zorê dilivîya, piştî ku saet derbasbûn tevgera wê kêm bû...Ma me telefonî kê nekir...parlementer, qeymeqam, parêzgar...Me go “van qijaqan (hêzên dewletê) vekişînin, mirî hey mirî, em meyitê xwe hilgirin.” Gelo dîya min çi his kir, pir êş kişand, ewê kişandibe... Ji me re qet bi lêv nedikir ku hezkirin çi ye, lê belê himbêzkirineke wê hebû berberî cîhanê bû. Bi hezaran peyv jî werin, wê hezkirinê ewê venebêjin...



Dayika min raste rast 7 rojan li kolanê ma. Tu kes ji me raneket, dibe ku kuçik, teyr û tivî bihatana, ew li wê derê raza em jî li 150 metro pêjde mirin... însanek çiqas dikaribe ezîyetê bide însanekî, dewletê jî bi domahîya 7 rojan ew li me kir. Heft roj, raste rast 7 roj meyîtê dayika we li orta kolanê bimîne...însan pir qenc namîne, însan wek însan namîne...

Destên dayika min hişk bibûn û wisa eciqandibû şelpeya xwe, xwuyabû ku canê wê pir êşîyaye, min maçî destên wê kir bo ku heqê xwe helal bike lê belê...Xwîna dîya min hişk bûye, destên wê, rûyê wê ku ku dema ketîye rûyê wê di nav axê de dabûye, kincên wê jî xwînê şil bûye pişt re zuha bûye, piştre bûya kevir dayika min...

Tirsa wê çûye, bûya ax û xwîn dayika min, porên wê hişk bûne, bûye gemar, can ji canê dayika min stendine. Kesên ji Xwedê bawerdikin! Vekirî mane çavên dayika min, berê wê bi malê ve, lingê xwe daye ser hev bo ku taqet werêyê, xwuyaye li berxwe daye. Dayika min, we dayika min kuşt, zarokên we hene ez nizanim ku yên we tunebe yên xwedîyên we hene, ez nabêjim êşeke çawa ye jixwe pir giran e...

7 rojan dayika min 7 rojan di serma çelê zivistanê de ma, a herê tahde jî nezanîna çend saetan birîndar ma, ez dibêjim ‘’xwezî tavilê bimirîya” We dayika min kuşt.

ALTUS
AUER

Şirnex

Şırnak




Şırnak (merkez)
Toplam Ölüm Sayısı: 43
Sivil
PKK Militanı (HPG)
Tanımlanamayan Gençler
Güvenlik Gücü Mensubu
PKK Gençlik Yapılanması (YPS)
Toplam Ölüm Sayısı
5
0
Tem
Oca 2016
Tem
Oca 2017
Tem
Oca 2018
Tem
X
Şirvan
Çatak
Kurtalan
Siirt
Siirt
Pervari
Eruh
Batman
Gercüş
Dargeçit
Şırnak (merkez)
(43)
Şırnak
Beytüşşebap
Güçlükonak
Uludere
Ömerli
Midyat
Mardin
İdil
Cizre
Silopi
المالكية
دركار
باتيفا
زاخو
Nusaybin
Qamişlo
عامودا
الدرباسية
القحطانية
المعبدة / كركي لكي
دهۆک
سەرسەنگ
بامەرنێ

ŞIRNAK
Nufus: 63000
Rakım: 1380

ŞIRNEX - ŞIRNAK

GULA TOPÊ EWÊ Lİ HER MALÊ KEVE!

Piştî ku Qedexeya derketina derve ya Cizîrê ku 79 rojan dom kir, bi awayekî qismî di 2ê Adara 2016an de hat rakirin,dor hat Şirnexê. Piştî Cizîrê bi 12 rojan li Şirnexê qedexeya derketina derve di 14ê Adara 2016an de hat îlankirin û 8 mehan dom kir.

Bi piştî 8 mehan dema ku qedexeya derketina derve di 14ê Mijdara 2016an de di saetên rojê de hat rikirin Şirnex bi erdê re bibû yek. 9 Ji 12 taxên bajêr bi temamî ji holê hatibû rakirin bi tenê 3 tax mabûn.

Li Cizîrê herî zêde kuştin li Şirnexê jî herî zede kavilkirina mekân pêkhat. Ji %70'yi bajêr bi temamî xera bû. Berî îlankirina qedexeya derketina derve li Şirnexê gel malên xwe terk kir, loma jî li Şirnexê wahşetîyeke mîna a Cizîrê neqewimî. Piştî ku di 14ê Mijdara 2016an de qedexeya derketina derve bi awayekî qismî hat rakirin jî ruxandina bajêr dom kir.

Di pêvajoya qedexeya derketina derve de ku bi şev dahat tetbîqkirin, pir agahîyên ciddî û serlêdanên li sazîyên mafê mirovan hene ku mirov, nirxên dîrokî û çandî, tax û kolan,binyada suriştî ya bajêr xisarên mezin dîtîye.[22]

Herêma Şirnexê bi domahîya heyama nêzî 40 salî yek ji cihên sereke bû ku pevçûn û tundîti her dem gurr lê diqewimî.Navenda bajarê Şirnexê bi domahîya şerên navxweyî yê 40 salî pir caran rûqalî êrîşên tund û qetlîaman bû. Şirnex di 1990'î de veguherandin wek ''bajarekî garnîzonê''. Di 1992'an de li bajêr 2 qetlîamên girseyî pêkhatin. Di êrîşan de ku yek jê di Newrozê de yek jê jî di Tebaxê de pêk hat, ji sedî bêhtir mirov hatin qetilkirin. Bi gotegota "PKKê bi ser Şirnexê de Girt." Li bajêr bi sedan mal û kargeh hatin şewitandin û xerakirin. Jiber tetbiqatên taybet li Şirnexê hatin kirin, navê Şirnexê di nav gel de bû Komara Şirnexê. Lê belê rûxandina ku di heyama qedexeya derketina derve de pêk hat, di tu heyaman de ne wisa giran bû. Bajar vê carê bi armanca ruxandineke bi temamî hat dorpêçkirin û êrîş lê hatkirin. Bajarek bo lêvegera kesên koçkirî nehiştin. Heta dîroka weşandina vê xebatê jî hejmareke zêde ya nufûsê li derveyî bajêr dima.''

---

[22] Piştî Qedexeya Derketina Derve ya 240 rojî Şirnex: Rapora Çevdêrî û Tespîtê (5-8ê Kanûna Ewel a 2016an)

HIDROMEK

Ji ber pêvajoyê wek berê kêfa min tune, ez di pacê de rûniştîbûm û heya ku agir vedimirî ez digirîyam. Zarokên min telefon dikirin û digotin ‘’tu çima wisa dikî?” Cîranên min dihatin, fêkî û zewze dianîn min nedixwar. Ew ken û kêfa berê tune êdî. Min bêrÎya zarokên xwe dikir di vê pêvajoyê de. Keça min li Silopîyê zewicî bû, ez li wê difikirîm. Ji ber tiştên ku di qedexeyan de bi serê min de hat, hindik mabû felç bibûma. Di operasyonan de em dernediketin derve, lê belê wexta ku operasyon qedîyan kêm be jî em diçûn û dihatin cem hev. Piştî ku qedexe hat rakirin dilê min gurp gurp diavêje, nuha jî bêhna min diçike… Carnan jî ez disekinim disekinim… ez radihêjim sênîyê û diçim sarincokê, ez derÎyê wê vedikim lê belê ez ji bîr dikim ku ez ê rahêjim çi. Piştî ku qedexe hat rikirin, heta hatina malbata min, min destê xwe neda tu tuiştekî. Ku dukan vebûn, ma av stend. Ku perê me hebûya me disted, ku tubûya me nedistend. Me ava giravî vedixwar, ku ez a rast bibêjim. Heta carnan me ava giravî jî nedidît, em bêav diman…Ez hema bitenê bûm li mehelleyê… Lê belê ez diçûm mala cîranan, min dinêherÎ. Min bexçeyên wan av dida. Ez nediketim malên wan. Lê belê min li bexçeyên wan dinehêrî. Wexta ku av dihat min ji wan re jÎ av dianî. Wexta ku telefonî min dikirin, digotin ‘’rahêje erzaqên malê” an jî ‘’fêkîyên bexçe bide hev”, ‘’zarokan birçî nehêle”, lê belê min nikarîbû. Ez gelekÎ bêşekir mam, bêçayê mam… lê belê dîsa jî li mala xwe bûm. Min şerpezetî jîya, min qebûl kir lê belê çêtir e ji mayîna mala hinekî din. Gelo ewê “Îro kî bimre, ewê çend heb birîndar çêbibe. Êdî rojeva me ev bû.

Di dibistana bi kapasîteya 3500 kesî de bi giştî di her polê de 2-3 kes herî zêde 5 kes hebûn. Ew jî herî zêde heya dersa 3'em em diman piştre em dişandin malê. Ew pêvojo ne ew pêvajo bû ku li YGSê were fikirindan. Bi rastî jî pêvajoyeke pir qirêj bû.

Em êdî hîn bibûn, bi me normal dihat dîtin. Wexta ku deng nedihat bi me anormal dihat, bêhtir bixof dihat... heybe tiştek bûbe... Em hemû li heman qatî kom dibûn wexta pevçûnan, jiber ku elektrÎ tunebû, me nizanîbû ku ewê topan biavêjin ku derê. Li dderdora malê kamerayê ewlehÎyê hebûn, avêtin wan. Minak hemû cam derizîn... Nuha jî derizîne...

Hema daîreyên biçûk biçûk hatina çêkirin, bi rastî li Şirnexê jixwe di her malê de herî kêm 5 heb zarok hene, lê belê daîreyên biçûk biçûk çêdikin. Gelo ev jî mesajek e? Dibe, êdî mesaja malbatên wisa biçûk didin?

Minak her malbata li Şirnexê di daîreyên fireh ên apartmanan de najîn, di malên mustaqîl de dijîyan lê belê nuha malbatên mezin mecburî aparmanan dikin, evana ewê mecbûr bimînin ku bi hev re bijîn û ewê problem derkeve di navbera wan de.

Qismek ji kesên ku mecbûr man ji bajêr derkevin mudetekê di çadiran de man an jî li nêzî mala xwe li kêleka kevilan man. Bi piştre mecbûr man li gund, bajarok û bajarên nêzîk bi cih bibin. Şirnaxa ku di sala 1990î de veguherî "bajarekî garnîzonê", di 2016an de piştî ku hat ruxandin, veguherî "bajarê înşaatê". Di şûna malên ruxandî de beyî ku destûra xwedîyê milk were stendin, xanî hatin lêkirin.



Li Şirnexê bi destpêka qedexeya derketina derve re li ser girên bilind tank, top û obûs hatin bicihkirin û bajar hat lêdan. Berî êrîşan di nirxandinên leşkerî de taktîkeke ruxandinê ya bi vî awayî hat tasawirkirin: **“Li Şirnexê gulûya topê ewê li her malê keve”**. Piştî axaftina Serokomarê dewletê Recep Tayyip Erdoğan ku gotibû “hewce bike bila bajar ji dûr ve bajar were lêdan, bi vî awayî ji endamên rêxistina terorê were paqijkirin.’’ Li bajêr bombebarankirina giran bêhtir hat gurrkirin.[23] 45 rojan bênavber bajar hat bombebarankirin.



---

[23] http://www.hdp.org.tr/tr/guncel/makale-ve-roportajlar/ sirnakta-kent-soykirimi/9257

Bajar bi armanca tunekirinê bi tank, top û çekên giran xistin bin êrîşan. Li bajêr mala ku guleya top û hawanê lê neket hema nehiştin. Ji 16ê Tebaxa 2016an û pê ve êrîşên herî berfireh û wêranker ku bi çekên giran hatin pêkanîn, li Şirnexê rûdan. Mîna Saraybosnaya wek mînakek bajarqirîyê li Şirnexê jî tevna mekanê û şênîyên bajêr bûn armanca êrîşên sîstematik.



Kesên ku nedixwestin ji mala xwe derkevin an jî kesên ku cihêkî wan ê pê de biçin tunebû, ji wan qismekî pir piştî ku elektrîk û av ji ser bajêr hat qutkirin mecbûr man ji bajêr koç bikin. Kesên ku li derdora bajêr kon vegirtibûn jî kêlî bi kêlî bûn şahidên bombebarankirin û rûxandina bajêr.

Mekânek bo ku veguhere mekanê mirin û ruxandinê bi tenê tundîtîya fizîkî ne bes e, tundîtîya fizîkî destpekek e ku nebe nabe. Lê belê, dema ku polîtikayên çewisandinê yên Dewleta Endonezyayê yên li dij nufûsa Tîmûra Rojhilat were vekolîn, tê fahmkirin ku veguherîna mekan a bi ser mekanê mirin û ruxandinê ve ji vê bêhtir dadihundirîne. Li gor vê taktîka yekem ewe ku mirov bi repertûara êşkenceyeke berfireh û pir mezin werin kuştin û tundîtîya fizîkî were bikaranîn. Taktika duyem jî tundîtîya sembolîk e ku dewlet hemû pratîk, sembol, ziman û awayê rêxistinê yê hêza dijberî xwe bi giştî dike armanc. Bi taybetî jî şêwaza zimanê ku di jêpirsînan de tê bikaranîn û kampanyayên leşkerî yên ku li herêmên pevçûnan tê meşandin wek mînak dibe ku were dayîn. Ya sêyem jî pêvajoya "Şeytankirina dijmin" e; yanî alîyê pevçûnan ên din bi hin pratîkên xerab ên "şeytanî" bi awayekî domdar referans tê dayîn û bi vî awayî dijmin ji alîyê peyvberî de ji nu ve tê avakirin û aktorên cûda yên dewletê pratîkên xwe yên derhuqûqî bi saya vê şeytankirinê meşrû dikin. Taktîka dawî jî ew e ku bi pratîkên koçkirina bi darê zorê nufûsa herêma cihên pevçûnan tim tê kontrolkirin û veguherandin.[24]

---

[24] http://hakikatadalethafiza.org/bir-olum-ve-yikim-mekani-olarak-cemal-temizozun-sirnaki/



Rûxandina herî mezin ya heta îro!

Çavdêrîya Serokê Baroya Amedê Ahmet Özmen ku bo dîsa vekolîna rewşa Şirnexê çûbû herêmê:

“Heya nuha cihê ku em çûnê û me dîye, di nav wan de zerara herî mezin li Şirnexê qewimîye. Em dikarin bibêjin ku ruxandina herî mezin e ku li komara Tirkîyê heta nuha qewimîye. Di navenda bajêr de 7 ji 12 taxan bi temamî hatîye rûxandin. Kavilên avahî û malan yên li mehelleyên rûxandî hatine rakirin. Ev herêm veguherîne erazîyên vala. Êdî ne mimkin e ku behsa hebûna mehelleyekê were kirin. Hê jî maleke mirovan tune ye ku serê xwe têkênê. Hin jê li derdora navenda Şirnexê di konan de dimînin. Qismek jê jî li Cizîrê an jî li gundên xizmên xwe dimînin. Em bi alîkariya kirê dizanin lê belê bi rehenda wê ya tam nizanin. Kesên ku ji cihên xwe hatine kirin, maleke wan tune ku lê vegerin... Hê jî mirovên ku ji ew her 7 taxan ji mecbûrî koç kirin wek penaberan jîyana xwe didomînin.[25]

---

[25] http://www.diken.com.tr/sirnakin-hali-harap-bugune-kadar-yasanan-en-buyuk-yikim/

Parlementera HDPê ya wê demê Aycan îrmez di 25.07.2017an da li Meclisê li ser pirsgirêkên parêzhega Şirnexê ji dervî rojeva meclîsê wisa axivî:

“... Belê, parlementerên rêzdar nuha ez ê behsa pirgirêkên bajêr ên bêdawî bikim ku ew bajar ne aîdî we ye.

Li Şirnexê rejîma zilmê hatîye di dewrê de ye ku ev du sal in bi awayekî sîstematîk tê tetbîqkirin û di dîrokê de mînakeke wê tune ye. Hukûmeta AKPê bi bikarînana amûrên dewletê yên zorê û îknayê konsepta şerê taybet li Şirnexê tetbîq dike. Bajarê Şirnexê, di dema dorpêçên bi mehan de û bi pişt re ji teref ekîbên xerabkar ên taybet ên hukumetê ve ji nexşeyê hat rakirin. Bo bêmirovkirina Şirnexê, bo jêbirina nasname, dîrok û hafizaya Şirnaxîyan hukûmeta AKPê polîtîkayên xerabkarîyê yên taybet mixabin xistiye dewrê. Wisa ye ku;

Tu cûdahîhya Şirnexê ji bajarê Polonyayê yê bi navê Gdanskê nemaye ku ew bajar di şerê duyem ê cîhanê de bi rêjeya ji sedî 90’î hatibû rûxandin.

Parlementerên rêzdar li parêzgeha me Şirnexê bi mehan e ku şeklekî rejîmeke taybet tê tetbîqkirin. Taybetîya herî girîng ya vê rejîmê ew e ku nirxên huqûqî, ehlaqî û mirovahî nasnake. Rejîmek wisa tê tetbîqkirin ku navenda bajêr bi temamî kavil dike, berî wê talan dike, li ser axa xwe welatîyên xwe dixe rewşa penaber. Her roja ku diçe, malên ku saxlem jî mane mixabin tên ruxandin. Bo gelê Şirnexê ku di bajarê xwe de bûne penaberan, di kêlîyên ewel de ji wan re bo jîyînê cihekî alternatîf nehatîye pêşkêşkirin. Hemwelatîyên me yên ku bi mehan di konan de dimen jî, bi giştî hemwelatîyên me yên ku li derdora Şirnexê, li navçe û li bajarokên Şirnexê bicîh bûne jî bo rêlibergirtina lêvegera wan konteynir jî mixabin nehatine sazkirin ku

Meheke me di serşokê de derbasbûye,
meheke me di destavê de derbasbûye,
meheke me di qatê jêr de derbas bûye...
çi zanim emrê me rizîya... Hê jî em
naxwazin ji Şirnexê derkevin,
ji be ku axa me ye ji mecbûrî.

sazkirina konteynirên demkî li her deverên cîhanê di rewşên awarete de wek karekî ji rêzê ye. Hukûmeta AKPê li Şirnexê rejîmek xistîye dewrê ku di dîrokê de nehatîye dîtin. Bi jiholêrakirina bajêr namîne, herwiha têketin û derketina bajêr û bi xalên kontrolê yên polîsan yên di nav bajêr de meşandina li ser erda repî rast jî vediguherîne ezîyetê; bi behaneya ewlehîyê daristanan dişewitîne, bi awakirina bendan xwezaya wê qetil dike; bi vê jî namîne ji teref serokê wan ê giştî statuya Şirnexê ya parêzgehê tê rojevê ku ewê tetbîqkirina mueyîdeyên sîyasî û cezayî jî neyên paşguhkirin... Rayedarên hukûmetê divê bizanibin: Ew kesên ku bo eşqa desthilatdarîya xwe mirovan qetil dikin û li dij bajaran polîtîkayên ruxandinên bêmerhemet pêk tînin, heta domahîya dîrokê bi lahnetê hatine bîbîranîn.[26]

Şahidê 1ê: *Bi top û obusan dest bi lêxistina bajar kirin. Hin kesên bajar terikandin çûn gundê xwe, cem nasên xwe yên li bajarên din. Kesên cihekî ku pê de biçin tunebû kon vegirtin. Li hindek taxan xendeq hebûn. Taxên ku xendeq lê hebûn bitemamî hatin hilweşandin. Taxên ku xendeq lê tunebûn jî hatin hilweşandin. Hemû avahiyên ne aîdî dewletê bixisar in. Avahiyên bêxisar jî derîyê wan şikestine. Li taxa Gundogdu û Yenîmahalleyê hilweşîn tuneye. Li van taxan jî derî hatine şikestin, cam ji ber avêtina top û û obusan şikestine. Li vê taxa ku hilneweşiyayî hêzên ewlekariyê bi cih bûne. Dizîya û windabûna têkberan zêde ye. Ketine hemû malên li bajêr, derî hatine şikenandin û lêgerîn hatiye kirin. Ketine nivîsgehên parêzeran, hemû kargehan û her deveran. Tabelayên nivîsgehên parêzeran hatine şikandin, dosyayên dozê hatine qetqetîkirin, ruxset hatine çirandin, pirtûk hatine qetqetîkirin. Bitaybetî pirtûkên Kurdî hatine qetqetîkirin.*

---

[26] https://www.tbmm.gov.tr/develop/owa/genel_kurul. cl_getir?pEid=61080

Taxên ku hatine hilweşandin: Îsmet Paşa, Dîcle, Cûmhûrîyet (beşek jê), Bahçelîevler (beşek jê), Yenîmahalle (beşek jê), Vakif Kent (beşek jê) bi obus û topan hatin lêdan. Nexweşxaneya diranan û nexweşxaneya dewletê hîna jî hene. Li nexweşxaneya diranan hêzên ewlekariyê bicih bûn û yekcar bû baregeh. Hê jî bi vî awayî ye. Nexweşxaneya dewletê hate valakirin. Ji bo polîs û hêzên ewlekariyê ên din tîmekî taybet ê dermankirinê hate anîn. Li bajêr erkedarê tenturistiyê neman. Bijîşkên malbatî û memûrên tenduristiyê şandin Cizîrê...

Berî qedexe were ragihandin bi du rojan hemû karmendên tenduristiyê şandin Cizîrê. Heta domahiya 8 mehan elektrîk li cihên ku hêzên ewlekariyê bi kar dianîn hebû. Av jî wisa.

40 rojên ewil û piştî wê cuda ye: ewil li xaniyan dixistin piştre dest bi binçavkirinê dikirin. Kesên ku nikarîbûn ji taxan derkevin hatin binçavkirin. Malbatên ku dixwastin derkevin telefonî polîsan(155) dikirin digotin “em dixwazin derkevin” Polîsan(155) digotin “hek erebeya te hebe were cihê kontrolê” Piştre kontrola GBTyê li hemû malbatê dihat kirin, li wê derê jî binçavkirin diqewimîn. Di 40 rojê pêşî de li taxan binçavkirin tune ye, kesên dixwestin derkevin dihatin binçavkirin. Di vê pêvajoyê de zêdetirî 90 kesî hatin girtin.

Şahidê 2an: *Berî qedexeyê her ku zext bêhtir bûn xendeqan dest pê kir. Gelekî tehde li me perwerdekaran hat. Piştî qedexe qediya bi du rojan, 16ê mehê em vegeriyan bajêr, dema em vegeriyan xisarek mezin gihiştibû mala me. Pirsgirêkên derûnê bi me re çêbûn. Mal tune ye, cihekî lêmanê tune ye, têkber tune ye, ku cihekî kirêkirinê hebe jî têkber tune ye. Min xwest têkberên xwe ji mala xwe derxînim. Min ciwanek du ciwan bi pera girt, destûr nedan ku eşyayên xwe derxînim, li ciwanan xistin, me ti tiştek dernexist. Me*



1940 **Varşova.** Bi êrîşa Nazîyan ji %90’ê bajêr hilweşîye.

2016 **Şirnex.** Ruxandina ku bombeyan di nêvî de hişt ji teref kepçeyan tê temamkirin.



xwest em biryara hilweşandinê bibînin, bi zorê me kekê min û diya min ji nav lepê polîsan derxist... Dema ku ez zarok bûm min salên 90î ditibûn, zarokên min jî vêya dîtin. Min qet nedixwest ku ew vê rewşê bibînin.

Şahidê 3yan: *Di roja 84emîn a ragihandina qedexeya derketina derve de operasyon hatin bidawîkirin. Di 6 mehên piştre de destûr nehat dayîn bo kes vegere. Xebatên hilweşînê dest pê kir. Ji 14ê Adarê heta 14ê Mijdarê kêmzêde 2 hezar avahî, 6 hezar mal bitemamî hat rûxandin. Kêmzêde di navbera 700 û 1000î de kargeh hatin hilweşandin. Ji binê hin kavilan cesed derdiketin, 6 kes hat derxistin. Hê jî di binê kavilan de cesed hene. Hejmara miriyên ku ji hêla malbatan hatine cenazeyên xwe birine ve hatiye tespîtkirin: 115 kes hatiye kuştin.*

Şahidê 4an: *Di bin çavan de gelekî li me xistin. Gotin şahidê veşartî heye. Gotin hûn terorîst in, nan û av nedan me. Berî ku derxênin dadgehê em birin nexweşxaneya dewletê ya Şirnexê. Berî ku em bigihêjin nexweşxaneyê di rê de erebe sekinandin destbenda min vekirin û ji min re gotin "tu yê gelekî di girtîgehê de bimînî, em şensekî didin te, bireve xwe xilas bike" Lêbelê min got, ez birevim wê min bikujin, ji vê tirsê ez nereviyam. Piştî nexweşxaneyê berî ku min radestî girtîgehê bikin ji hev re gotin, ka em careke din a dawiyê jî lêxînin û li min xistin. Dijûn ji min re dan.*[27]

Şahidê 5a: *Gava ku hatim Cizîrê poşmaniya min a herî mezin hiştina ciwanan a li wira bû. Hek ne zewicî bûma ez ê jî beşdarî ciwanan bibûma.*

---

[27] Piştî Qedexeya Derketina Derve ya 240 rojî Şirnex: Rapora Çevdêrî û Tespîtê(5-8ê Kanûna Ewel a 2016an)

Şahidtiya Leyla Bîrlîk a di derheqê bûyera Haci Lokman Bîrlîk ê bi erebeya polîsan ve hat girêdan û bi erdê ve hate xişiqandin: “*Şahidan gotin Haci birîndar hat girtin, heta birîna xwe pêça bû, piştre bi kobrayê lê hate reşandin, dawiyê ew 100 metreyî bi erdê ve xişiqandin, dilê wan rehet nebû bi wesîteyên zirxlêkirî di ser wî re derbas bûn. Di wêneyekî ku ji wî hesabî de ji min re hate şandin xuya dike Haci birîndar e û bedena wî saxlem e.*”

Kesên di rastiyê de îşkence li bedenên mirî dikirin, kesên ew ji gorekê mehrûm kirin ji pêkanîna ewlehiyê a rûtîn bêhtir, dixwazin sîwana pîroz a ku bedenekê ji bo xatirê doza ku jê bawer dike afirandiye, tune bikin. Êrîşkirina miriyan û bêqîmetkirina mirinê, a rastî ji bo kesên jiyaneke ku dişibe jiyana kesê mirî dijîn, peyamek e. Rewşa siyasetê ya herî eşkere û bêrûpoşk ev e.[28]

---

[28] http://www.birikimdergisi.com/haftalik/7240/ olu-bedenlerinsiyasal-yasamlari#. Vx5-Afl97IU)

Şahidiya Şaredarê wê çaxê yê Şirnexê yê DBPyî Serhat Kadirhan: *Gelheya Şirnexê 65 hezar e. Niha 40-45 hezar mirov bêxanî man. Ji 12 taxên Şirnexê 9 heb hatin rûxandin. Li taxên Cûmhûriyet, îsmetpaşa, Dîcle, Yenîmahalle hilweşîn zêde ye. Li taxên Bahçelîevler, Gazîpaşa û Yeşîlyûrt, Aydinlikevler*

û Ataturkê jî hinek hilweşîn heye. Ez şaredarek im ku bajarê wî tune ye. Talan jî heye. Mînak me li senayiyê parkek çêkiribû, hê me vekirina wê nekiribû lêbelê me damezrandina wê qedandibû. Li wir çi tiştên hebûn JOH, POH û cerdevanan hemû rakirine û birine. Li şûnê ti tiştek nehiştin.[29]

---

[29] http://www.cumhuriyet.com.tr/haber/siyaset/552647/Burasi_Sirnak.html

Ez di rewşa penahendetiyê de mam. Malên ku bar kirin çûn Silopiyayê, Cizîrê û bajarên derdorê. 30 hezar Şirnexî çûn bajar û navçeyên dorhêlê. 180 malbat çûn Cizîr û Qilebanê, nêzîka 200 malbatî çûn hêla Basanê û Kaplıcalarê nêzîka 170 malbatî çûn nahiyeya Sêgirik (Şenoba). Nêzî 5000 kes li cihên weke Dêrgulê(Kumçati) di kon û çardaxan de man, hinek ji wan neçûn. Bi qasî pênc-deh hezar malbat li navendê man, hinek ji wan neçûn. Kesên ku av û elektrîka wan qutkirin ji neçarî çûn. Ji ber ku kesekî li jeneratoran binihêre tunebû piştî demekê li her deverê elektrîk qutbû.



BAJARÊ KU DI SALÊN 1990Î DE WEKE "KOMARA ŞIRNEXÊ", "BAJARÊ GARNÎZON" DIHAT BINAVKIRIN, VEGUHERIYABÛ ŞANTIYEYA AVAHIYAN




Büyük Değişim Büyük Dönüşüm
ŞEHR-İ NUH YENİDEN DİRİLİYOR
Projelerimizi Gerçekleştirirken Çevreye Verdiğimiz Rahatsızlıktan Dolayı Özür

MİZGÎNÎYA MİRİNA BAJAREKÎ DİDİN: ŞEHR-Î NÛH Jİ NÛ VE VEDİJE



Te go, "Ez ê herim bajarekî din, deryayeke din.
Jê hê çêtir bajarekî din ewê were dîtin helbet.
Bi ku ve herim çarnûs e xwe bi qirika min ve digre;
Ewê hişê min gelekî bimîne li vî welatê bejî.
Ez çavên xwe bi ku de vekim, li kuderê binehêrim
Reşkavilên jîyana min derdikevin pêşberî min,
Ku min salên xwe qurmiçand, vala bihurand.
Tu yê welatên nû nebenî,
Deryên din nebînÎ.
Ev bajar ewê dev ji te bernede.
Tu yê di heman kolan de bigerî.
Tu yê di heman taxê de kal û pîr bibî.
Di heman malan de tu yê spî bikî.
Ev bajar e meskenê ku tu yê biçiyê.
Li hêvîya yekî din nemîne...[30]

---

[30] Pirtûka Dema Li Bendemayîna Barbaran, Kavafis, Helbesta Bajêr,

Hezex

İdil


İdil
X
Toplam Ölüm Sayısı: 81
Sivil
PKK Militanı (HPG)
Tanımlanamayan Gençler
Güvenlik Gücü Mensubu
PKK Gençlik Yapılanması (YPS)
Toplam Ölüm Sayısı
30
20
10
0
Tem
Oca 2016
Tem
Oca 2017
Tem
Oca 2018
Tem
Tunceli
Bingöl
Muş
Elazığ
Malatya
Van Gölü
Van
Bitlis
Diyarbakır
Batman
Siirt
Adıyaman
Şanlıurfa
Mardin
İdil
(81)
Hakkari
Kahramanmaraş
Niğde
Mersin
Hatay
Kilis
Qamişlo
دهۆک
الموصل
الحسكة
حلب
إدلب
منبج
الطبقة
الرقة
جسر الشغور
اللاذقية
معرة النعمان
نينوى
سۆران
هەولێر
کەرکووک

HEZEX - İDİL

ZAROKÊN 14-15 SALÎ HATİN KUŞTİN

Navçeya parêzgeha Şirnexê Hezex di Kanûna Ewel a 2015an de hat dorpêçkirin. Qedexeya derketina derve ya ji teref parêzgarÎyê di 16ê Sebata 2016'an de di saet 23:00ê de hat îlankirin, 44 rojan bênavber dom kir.

Di 31ê Adara 2016an de di saet 04:30an de qedexe di hundirê rojê de hat rakirin û di navbera saet 21:30ê êvarî û 04:30ê sibehê hat tetbîqkirin.

Qedexeya derketina derve li Gundê Dirseklîyê ku li cihekî bilind ê Hezexê ye û li navenda navçeyê hat tetbîqkirin. Bi domahîya 44 rojan derheqê pevçûnên Hezexê de û derheqê binpêkirina mafan de tu agahî nehat wergirtin. Berî qedexeya derketina derve tiştê ku li Cizîrê û li bajarên din qewimîn, bûn sedema tirsê û fikarê loma jî ji navçeya ku 26 hezar û 500 nufûsa wê hebû ji navenda navçeyê koçeke mezîn qewimî. Herî kêm ji %80’êm ji %80’yî nufûsê ji navçeyê qetîyan û koçî navçeyên cîran û gundan kirin.

Li Hezexê bi îlana qedexya derketina derve ya 16ê Sebatê re êrişêk û ruxandineke xedar destpêkir. Bi tenê di 19 rojên qedexeyan de pevçûn rûdan, tevî ku pevçûn qedîyan jî tax dihatin ruxandin. D, dema qedexeyan de yek jê jin û 9 jê zarok bi giştî jî 23 sivîlan can da.

Bi rakirina qedexeyê re dema ku şênîyên bajêr vegerîyan taxên xwe rûqalî malên şewitandî, rûxandî bûn. Lê belê dîsa jî nexwestin ji mekanê xwe qût bibin. Xwestin ku li ser kavilên malên xwe konan werbigrin. Lê belê ev daxwaza wan bi hinceta ku kon dibin sedema “qirêjtîya dîmenê” ji teref qeymeqemtîyê ve hat redkirin. Dîsa jî malbatên ku kon vegirtin ceza xwar. Şaredarî û komaleyên ku dixwestin bi gel re bibin alîkar her tim bi cezayan û rêlibergirtinan rû bi rû man.

Piştî ku pevçûn qedîyan û qedexeya derketina derve rabû ji teref lijneya wezîran ve ji %80'yî Hezexê wek cihê birîsk hat îlankirin û ruxandina avahîyan berdewam kir. Li gor xebata tespîtkirina xisaran a ku ji teref GABBê û TMMOB'ê (Yekîtîya Odeya Mîmar û Mihendisên Tirkîyê) li Taxa Turgut Özalê û Yenîmahalleyê ku pevçûn lê bi dijwarî diqewimî, hat kirin, 1200 avahîyan zerar dîtiye(nêzî 1600 malî).[31]

Devlet
BURDA
R.T.E

---

[31] Rapora Koç û Tespîta Xisaran a Herêmî ya GABBê, TR-EN, 2ê Tirmeha 2016an. http://gabb.gov.tr/MansetAyrinti.aspx?ID=2419

Şahida 1em: Ez bi 6 mehan ducanî bûm. Ewqas dengê çekan dihat, xaza îsotan dihat avêtin. Rojekê dengekî berz ê bombeyekê hat, ez pir tirsîyam wê rojê zarok ji ber min çû. Zaroka min a 6 mehî mir.

ALLAH TEK'TIR ORDUSU TÜRK'TÜR

Şahidê 2em: Ev 30 sal in em van tiştan dijîn. Di 93an de jî me ev tişt jîya, îro jî em di heman rewşê de ne. Ewqas ciwan mirin ma ne heyf û guneh e? Zilmê li me dikin. Di saet 2 û 3'yê şevê de derdikevin ser xanîyê me û marşan lêdixin, çekan berdidin. Em derîyên xwe digrin li hundir rûdinên û pir zora me diçe. Em bimrin jî, em bê mal bimînin jî, em birçî bimînin jî em axa xwe naterikînin.

Şahida 3yem: Belê, di qedexya derketina derve de dema ku em çûn ew li vir ma. Me digo tiştekî wisa tune, zarok e jixwe. Yanî zarok e, jin e, sivîl e. Yanî me nizanîbû ku wahşetîyek daketîye cîhanê. Ji 7an hetayî 70'yî herkes teror hatîye îlankirin. Zaroka 2 salî jî terorîst bûye, dergûşa 6 mehî jî, zaroka ku hê newelidîye jî terorîst bûye. Mirîşkên me jî terorîst bûye. Darên me jî, malên me jî yanÎ ji serî heta binî, wek ku hûn dizanîn, di nezera dewletê de em terorsîtin. Me zarokên xwe, zarokên me wek zarok dizanîbû.

Zarokê me di baxçeyê de hat qetilkirin. Tanka zarokê me tunebû, topa wî tunebû, çeka wî tunebû, çi zanim teyara wî tunebû, tiştekî wî tunebû, zarok bû. Ji ber ku 14 salî, bera 15-16 salî be dîsa zarok bû. Li vir hat qetilkirin. Em çûn me ji morga Mêrdînê hilgirt.

Her kesên li wê derê jî pê zane ku me çi rezîlî kişand ji wan, 4 rojan 5 rojan li wan deran em di halekî perîşan de bûn. Bİ tu şiklÎ ev xizmê mirî ye, zaroka xwe wenda kirye dayik e, me tû hurmet tu tiştek nedît. Me cenazeyê xwe anî vir, ketin navberê me rabû li goristana Hezexê defin kir.

Di dema qedexeya derketina derve de me mal bir Êlihê, me mal nedît, me zahmetîya malan kişand. Em li mala xizmekî xwe yê ji dûr ve 2 şevan bi mêvanî man me bettenîye li erdê radixist û em radiketin, me di ku nabe em pajde vegerîyan. Me go ku me bikujin jî bila bikujin. Me dî ku li Cizîrê û li Siopîyê çi kirin, em tirsîyan lê belê ne ji mirinê. Bi rastî jî em ji mirinê netirsîyan. Yanî ku nuha jî bibêjin em ê we bikujin bila werin lê belê bedena keçê me yên ciwan, jinên me, dayikên me tazî dikin û diavêjin kolanan. Ji ber ku ev kesên ketine vir kî çi bêje bila bibêje, ewê kes min bi vê nede bawerkirin ku ew kesên ku ketin vir bi tenê ne cenderme bûn, polîs bûn, ne hêzên operasyonên taybet bûn; ew kes bûn ku dişbîyan DAİŞê. Ketin Hezexê ev mirov, ev ciwan, ev jin qetil kirin.Him madî him manevî, him canê me him jî malê me pir zerar dît.

Em çend caran ji vir çûn hatin. Hê jî deynê me heyek ku me jı bo rê stendîbû û me nedaye. Jina min di 57an de welîdîye, ketîye 60-70 salî, hê jî şivanîyê dike. Vî deynî bi şivanîyê dide. Zerara me negihiştibû kesî. Me ev heq nekirbû. Di destê lawê me de çek tunebû. Lawê me xwendekar bû.

Zarokekî 14-15 salî bi çekan jî were te divê tu wî nekujî ji ber ku ew hê zarok e. Tu dibêjî ha wisa û wisa tu destan dixwênî, di televîzyonan de dibêje "Xwedayo min bê welat nehêle." Wê demê divê tu millet ji welatê wan surgun neke. Em li welatê xwe li ser axa xwe jîyana surgunê dijîn.Hê jî em dijîn. Zarokên me dernakevin derve ji tirsan. Binehêrin ez jin im ez diçim Qur'anê derîyê xwe diqifilînim û diçim. Ditirsim ji ber ku li malê zarokeke min î 13-14 salî heye, tiştek dibe ku bibe, yek dibe ku were. Ez ji miletê xwe, axa xwe, cîranê xwe natirsim. Ez dikarim emanetî cîranê xwe bikim û herim lê belê li welatê me mirovên wisa pir bûne ku em nizanin kî çi ye loma. Me bêhurmetî ji ala kesî re nekirye, me ji serok û rêberê kesî re tiştên xerab negotîye, derdê me tenê mafên me ye. Ji ber ku mafên me tê binpêkirin.

Jinên me tên tacîzkirin, ciwanên me tên kuştin û li paşîya panzerê tên xişiqandin. Kijan ol, kîjan nijat, kîjan îslam vê qebûl dike ku em qebûl bikin. Li dij me tundîtî tê kirin. Em di bin tundîtîyê de ne, em nikarin derkevin kolanên xwe, em nikarin biçin marketên xwe, sûkên xwe. Jibo çi, çima em nikarin herin? Jiber ku her ji gavekê qereqolek çêkiriye. Me li dij kê diparêzin, bile me ewil li dij xwe biparêzin. Yanî mirovên ku dewletê ew kuştin tu zerara wan li me tunebûn. Tu xerabîya ciwanên me tunebû. Çi hebe wan kir. Ez difikirim ku her daxwaza xwe min bi lêv kir. Hêvî dikim ku min fahm kiribin, min xwe vegoti be. Dîsa dibêjim hûrmeta me bo her netewê, her olê, her bawerîyê bêdawî ye.Em jî mafên xwe yên azad û hurriyeta xwe dixwazin.

Em jî nasnameya xwe, zimanê xwe dixwazin. Em bi tu şiklî li dij ırza te, malê te tacîzê tecawizê nakin. Çavê me ne li tu tiştekî kesî ye. Daxwaza me bi tenê mîna mirovan bi aşîtî,mîna xwuşk û birayan em bijîn. Em tiştekî din naxwazin. Hêvî dikim ku mafê lawê min li erdê nemîne. Ez bawir dikim, ji mirovan bawer dikim. Kesên ku lawê min qetil kirin, dizanîbûn ku ew zarok bû, ji qestî qetil kirin, hêvî dikim ku heqê wî li erdê nemîne.

Lawê min ji min û zarokê min re wesîfeya bavtîyê dikir. Min ew mezin kirbû le belê êdî lawê min min mezin dikir, hemû jîyana min endeksî wî bû. 4 zarokên min ên din hene û ji hemûyan re bavtî dikir. Ew bi her tiştî re eleqedar dibû. . Em ne wek dayik û sêlekan bûn, em heval bûn. Wek hevilinî we li kolanan hebe ku hûn pev re niqaş dikin, gengeşî dikin lê belê dev ji hev bernadin, wisa bû têkilîya me. Ew dayika min bû, bavê min bû, axa min bû welatê min bû. Dibe ku min ew anî dinyayê lê belê wî kok berda bû hundirê min,mezin bû, ew axa min bû. Wî ez kemilandim, wî ez mezin kirim. Bi min re dihat sûk û bazaran. Nuha hûn dibêjin ‘‘wek jinekê te çi jîya?” Ez wek mirovekê hê min ferq nekirye ku min çi jîya ku wek jinekê hestên xwe bikim şexsî. Ez bêjim ez jinek im. Wek dayikekê min çi jîya, wek hevalekê min çi jîya, wek hevaleke nêz min çi jîya, wek hevalekê ez çi hissdikim? Min bavê zarokên xwe wenda kir, min hevalê xwe yê lîskê yê herî nêz wenda kir. Min axa xwe wenda kir, belkî bêjeya ku her zêde ez vebêjim ev e, min axa xwe wenda kir, min welatê xwe wenda kir.

Ez nûha çawa bijîm, bi şev ez rûdinêm û lê difikirim. Bo zarokên xwe yên din ez xwe bi jîyanê ve bigrim an jî bibim îsyankar û şer bikim? Aciz dibîm bêjim ku "min çima wenda kir, çima zaroka min, çi bû çima çima?" Çima zaroka min hat kuştin. Zaroka min çi kiribû ku hat kuştin.[32]

---

[32] Rapora Lêgerînê ya li ser Pêvajoyên Psîko-Sosyal yên Jin û zarokan di Dema Lêvegera piştî Rakirina Qedexeyan û Pêvajoya Qedexeya Derketina Derve li Hezexê Yekîtîya Şaredarîyên Herêma Başûrê Rojhilat ê Anatolyayê
Şaredariya Şirnexê, Şaredariya Hezexê, Tirmeha 2016an

Şahidê 4em: Zarokên ku li vir hatine kuştin pirên wan 12, 13, 14, 15 salî ne. Bo van hemîyan telefonî me hat kirin. Bo wasîteya cenaze hilgirtinê... Em bûn alîkar... Yanî tu temenê wan têxe ser hev 20î derbas nake. Hejmara wan jî 20î derbas nake.

Şahêdê 5em: Dibêjin "qedexeya derketina derve hatîya rakirin" lê belê bi rastî nehatîye rakirin. Mînak du roj berê derdora saet 11ê nîvê şevê hatîye gotîye, lambeyan vemirîne. Jinik jî bi Tirkî nizane. Jixwe dengê ew wasîteyan baş nayê fahmkirin, dengê wan hinekî çîk e. Piştre nêherîne ku lambe venemirandîye. Gule berdanê, hema ji 50 bêhtir gule berdanê. Tiştek heye ku Hezexê ji navçeyên din cihê dike; ne cihekî wisa ye ku tu rojnameger werin li ser wê nûçeyan çêkin.

Şahida 6em: Zaroka min 15 salî bû. Roja ku qedexe hat îlankirin, tarî ket erdê em jî derketin. Bi tenê ew ma. Em koçer in. Me pûşê xwe bir. Kebokên lawê min man.Ji me re go ‘‘ez ê kebokên xwe bidim hev û werim”. Bo ku wan kom bike, bû şev êdî derneket ji wir. Kebok li ser banîyê vê malê xwedî dikir. Me wê demê eşyayên xwe, pûşê xwe xist rê. Piştre ku vegerîya careke din venegerîya. Me cenazeyê wî piştî ku qedexeya derketina derve qedîya dît. Me di înternetê de dît. Di zikê wî de şûna guleyekê hebû, destekî wî herî bû, destekî wî li ser birînê bû. Herî dawî yekî telefonî me kir. Ji min re go, “me lawê te kuşt, li înternetê binehêre tu yê lawê xwe bibîne.” Ez texmîn dikim ku polîs bû. Dîrekt telefonî min kir, go “li înternetê binehêre”. Ji nemroyeke veşartî telefon kir. Telefona lawê min jî nuh do yekî dît, da me. Şikir ji Xwedê re bedena wî nehatibû perçekirin, bi tenê guleyek hebû, bedena yên dinê bi temamî hetibû perçekirin…

Çend roj berê me mûlid da xwendin li navenda çandê. Mele girtin birin. Sûretên zarokan şikandin. Min go “Sûretan çi bi we kirye?” Min xwe avêt ser sûret. Pêhn li min dan. Go “te lawê xwe ji van re nehiştaya” Min go “destur nedan, asê ma, lawê min çû sûret ma. Hema sûretan neşikînin.”

Şahidê 7em: Piştî operasyonan min mala xwe dît. Di mala min de, yeqîn bikin, şopa 4-5 guleyan hebûn. Şopa 4-5 guleyan. Al jî daliqandibûn li mala min. Me go bila. Jixwe kamyon hene li vir, doşekên me li erdê raxistine. Raketine. Leşker mana. Me go bila. Ne xem e. Biner ez bi xwe çûme taxê. Piştî du rojan, piştî karê wan qedîyaye agir bera malê dane. Min binehêre rewş wisa ye. Yaw we al li mala min daliqand, welewkî ez terorîst bim jî, piştî ku al lê hat daliqandin ew mal nayê şewitandin. Yaw ez rêz digrim ji alê re... Polîs dibêje ‘‘ekîbek hatîye. Rûyê wan bi rûpoşk e. Em jî nizanin, kî ne, çi ne.” Polîs bi xwe dibêje. Dibêje ‘‘kî ne, çi kes in, em jî nizanin.” Mêrikan ketinê, guh nadin tu kesî,kesî bi tiştekî nahesibînin. Ne guh didin emir, ne li me guhdar dikin, li kesî guhdar nakin...

Şahidê 8an: Mirovên li vê navçeyê ji %99 psikolojîya wan ne di cihde ye. Me travma derbas kir, loma jî em nizanin ku em çi diaxivin, em çawa tevdigerin. Nuha em tiştekî dibêjin tavilê gef li me tê xwarin. Dibêjin ‘’tu bi tu kesî re nepeyive.” Nuha em jî ditirsin.

Şahida 9em: Tu ewilî hatibûya, tu yê rûqalî girî û îskeîskê bibûya, nuha her kes bê hêvî bûye. Li Rojava her kes dibêje ‘’ez misliman im, ez çepgir im filan.” Yek bi tenê jî napirse ka li Hezexê çi qewimî?[33]

---

[33] RAPORA ÇAVDÊRÎ Û LÊKOLÎNA HEZEX-ŞIRNEXÊ YA PİŞTÎ QEDEXEYA DERKETİNA DERVE YA Dİ NAVBERA TARİXA 16.02.2016- 31.03.2016AN DE (22-23ê Nîsana 2016an)

Nisêbîn

Nusaybin


Nusaybin
Toplam Ölüm Sayısı: 223
Sivil
PKK Militanı (HPG)
Tanımlanamayan Gençler
Güvenlik Gücü Mensubu
PKK Gençlik Yapılanması (YPS)
Toplam Ölüm Sayısı
80
60
40
20
0
Tem
Oca 2016
Tem
Oca 2017
Tem
Oca 2018
Tem
Bitlis
Siirt
Batman
Mardin
Şanlıurfa
Nusaybin
(223)

NUSAYBİN
Nüfus: 115000

NISÊBÎN-NUSAYBİN

Bİ BALAFİRÊN ŞER HAT BOMBEKİRİN!

Li navçeya Mêrdînê Nisêbînê di navbera Cotmeha 2015 û Adara 2016an de 7 caran qedexeya derketina derve hat îlankirin. Di tarîxa 14ê Adara 2016an de qedexeya derketina derve ya 8em hat îlankirin.

Qedexeya ku di 14ê adarê de hat îlankir, 134 rojan bênavber berdewam kir. Piştî 134 rojan di 26ê Tîrmeha 2016an de, li 9 taxan (Girnewas, İpekyolu, Barış, Devrim, 8 Mart, Selahattin Eyyubi, Yeni Turan, Yeşil Kent û Mor Yakup) di navbera saet 05.00-23.00ê de qismî hat rakirin. Li 6 taxên ku man jî *(Fırat, Dicle, Yenişehir, Zeynel Abidin, Abdulkadir Paşa, Kışla) qedexe 24 saetan hat tetbîqkirin.*[34]

---

[34] TÊBİNÎYA AGAHDARKİRİNÊ YA Lİ SER QEDEXEYA DERKETİNA DERVE YA Lİ NİSÊBÎNÊ Û PİŞTÎ WÊ
Amadekar. Yekîtîya ŞaredarÎyên Herêma Başûrê Rojhilat, Şaredarîya Nisêbînê, 25ê Tebaxa 2016an, Nisêbîn

Li Nisêbînê qedexeya derketina derve ya yekem di 1ê Cotmeha 2015an de hat îlankirin û heya 6ê Cotmeha 2015an li Taxên Nisêbînê yên wek Girmelî, Kayadibî, Tepeüstü, Eskihisar 6 roj berdewam kir.

Di 9ê Cotmehê de li taxa Abdulkadirpaşa, Fırat û Yenişehirê qedexeya derketina derve ya duyem ku du rojan dom kir, hat îlankirin.

Ji 13ê Mijdara 2015an heta 26ê Mijdara 2015an li taxên wek Abdulkadirpaşa, Fırat, Dicle, Yenişehir, Yenituran, Yeşilkent, Mor Yakup, Zeynelabidin, Kışla, 8 Mart, Gırnavas, Devrim, Selahaddin Eyyubi, İpekyolu, Barışê qedexeya sêyem bi domahîya 14 rojan hat tetbîqkirin.

Ji 29ê Mijdara 2015an heta 3yê Kanûna Ewel a 2015an li taxên wek Abdülkadirpaşa, Fırat, Dicle, Yenişehir û Yenituranê qedexeya 4 em bi domahîya 4 rojan hat tetbîqkirin.

Ji 6ê Kanûna Ewel a 2015an heta 9ê Kanûna Ewel a 2015an li taxên wek Abdülkadirpaşa, Fırat, Dicle, Yenişehir û Yenituranê qedexeya 5em bi domahîya 4 rojan hat tetbîqkirin.

Di 14ê Kanûna Ewel a 2015an de dîsa li heman kolanan qedexeya derketina derve ya ku dihat tetbîqkirin, di 18ê Kanûna Ewel de di navbera saet 9:00 û 16:00ê de bi awayekî demkî hat rakirin.

Di Kanûna Ewel a 2015an de ji saet 10:00an û pê ve li hemû navenda bajêr qedexeyeke din hat tetbîqkirin û qedexe di 24ê Kanûna Ewel a2015an de hat rakirin.

Yek ji qedexeyên derketina derve yên Nisêbînê ku ya herî zêde dom kir, ya 14 rojî bû. Di pêvajoya vê qedexeyê de du jê jin û yek jê zarok bi giştî 18 sivîlan can da. Di dema qedexeya ku di navbera 14-24ê Kanûna Ewel de hat tebîqkirin, 4 sivîlên din can da. Herwiha jinek jî di dema li taxa Girnewas ji teref hêzên rejîmê ve hat kuştin ku ew gund ne di nav herêmên qedexeyê de bû.[35]

Li Nisêbînê qedexeya herî dirêj ku 16 tax digirt nav xwe, di 14.03.2016an de hat îlankirin. Piştî îlana qedexeyê bi navê ‘’OPERASYONA YEKÎNEYÊN TAYBET ÊN HEVPAR ÊN BAŞOK 7’’ û bi beşdarbûna JÖH, PÖH û cerdevanan êrişeke leşkerî pêk hat. İddîayên ku yekem car di vê êrîşê de balafir hatîye bikaranîn, di çapemenîyê de cih girt û ji teref raya giştî jî pê hat hisandin. Di êrişên de ku dihat idîakirin ku balafiran bombe baran dikir, Nisêbîn bi erdê re bû yek.

---

[35] Rapora Binpêkirina Mafan a Qedexeya Derketina Derve ya li Navçeya Mêrdîn NisêbÎnê İlankirî, 8ê Çileya 2016an, Komaleya Mafê Mirovan(KMM) û Weqfa Mafê Mirovan a Tirkîyeyê(WMMT)

Ji ber bombebaranê ji dûr ve jî dûya bilind dibû, dihat dîtin. Dûya ku ji bajêr bilind dibû, rûxandina ku bajar jîyaye jî rêdida.

Di 03.06.2016an de wezareta karê hundirîn daxwuyanî da ku operasyon qedîyane. Lê belê qedexeya derketina derve bênavber heta 25.07.2016an berdewam kir.

Li Nisêbînê Kolan Nema

Qedexeya ku di 6ê Adara 2016an hat îlankirin, di roja 74emîn de tevî ku pevçûn qedîyabûn jî, piştî 134 rojan di 25ê Tirmeha 2016an li taxan hat rakirin. Lê belê li taxa Firat, Dicle, Yenişehir, Abdulkadirpaşa, Zeynel Abidin û Kışlayê jî zêdeyî 2 salan berdewam kir.



Qedexeya derketina derve hat rakirin

Li van taxan di 21ê Nîsana 2018an de qedexe bi temamî hat rakirin. Dema qedexeya derketina derve hat rakirin kolan nemabûn. Di vê demê de jiber guleyên ku ji wasîteyên zirxlêkirî hat berdan, jiber topên hawanê û jiber teqandina bombeyên di nav kavilan de 25 sivîlan can da. 11 hezar 386 mal û 2 hezar kargeh bi kepçeyan bi temamî ji holê hatin rakirin.





Sûretê ku Di Hafizeyê de Cih Girt

Zehra Doğan jiber ku ev sûret resimand ku li Nisêbînê hatîye kişandin û di sûret de li ber avahîyên ruxandî û şewitandî poz hatibû dayîn, û ala tirkî li kavilan hatibû daliqandin, ceza lê hat birîn.



Min bi tenê resimand

Zehra Doğan: Min 2 sal û 10 meh ceza xwar ji ber ku gotin ‘‘ Te çima ala Tirkîyê li ser avahîyên ruxandî resimandî ye’’ Lê belê vî sûreta wan kişandibû. Min bi tenê resimand.


FREE
ZEHRA
DOĞAN

Sûretê dîwaran ê ku Banksy bo piştgirîya bi Doğanê re xêz kiriye.


Nusaybin 2016



Sal: 1937-Cih: Guernica

Di tarîxa cîhanê de, di demekê de ku nedihat hêvîkirin, bi temamî li dij gelekî bi tememî bêparastin, li cihê sûka bajarokekê, bi balafirgehên şer ên modern bi awayekî rokû pêk 3 saetan êrîşên hewayî hat kirin. Ên êrîş kirin: Bi serperiştîya Hitler, Musolini, Franco dewleta Elmanya, îtalya û Spanya. Qûrbanî: Alîyê lawaz ê di şerê nav xweyî yê Spanyayê de, Gelê Bazarokê Guernica'yê yê Herêma Baskâ Sosylîst.

Picasso bo vê qetlîamê ev peyv gotibûn: Têkoşîna Spanyayê li dij êrîşên li mirovan û azadîyê ne. Wek wênesaz bi domahîya jîyana xwe her tim li dij kuştinê xebetîm. Kî dikare bo demekê be jî bi fikire ku ez bi kevneperestîyê û mirinê re rêkeftî me? Wêneyê ku li ser dixebitim û navê wî dê bikim Guernica û di hemû berhemên xwe yên dema dawîyê de nefreta xwe ya li dij çîna leşker rê didim ku ew çîn Spanya di nav okyanûsa êş û mirinê de dakir.



Pablo Ruizy Picasso piştî bombebaranê bi mehekê tabloya navdara bi navê Guernica'yê xêz dike û di du mehan de diqedîne.

Di pêşengehekê de ku Picasso beşdar bûye, generalekî Elman nêzîkî wî tê û jê dipirse:

Bersiva Picasso jî mîna tabloyê navdar dibe.

- Ev tabloya te çêkirye?

- Na, we çêkirye.



Nûnerê YOMMTê ê Nisêbînê: Di pêvajoya qedexeya derketina derve de, di pevçûnan de bi taybetî depoyên avê, şebekeyên avê, trafoyên elektrîkê hatin armanckirin. Kesên ku diçûn şebekeyên av û elektrîkê tamîr bikin, gule bera nêzîkî wan dihat dayîn. Li taxên ku qedexeyta derketina derve lê tê tetbîqkirin, ava şebekeyê ya paqij tune. Di roja duyem a qedexeyê de şebekeya avê hatiye teqandin. Navçe 3 rojan bêav maye, bo tamîrkirina şebekeya avê jî jeber ku ewlehîya parastina jîyanê tuneye, destûr nehatîye dayîn. Herwiha trafo ji teref hêzên ewlehîyê bi awayekî qestî tên armanc kirin. Em nêzî 30 muhendisan di 25-26ê Mijdarê de me li taxa Dicle, Fırat, Abdulkadirpaşa, Yenişehir, Yeniturané tespîta xisaran kir lê belê piştî wê tepîta me 4-5 caran qedexe derket û loma jî xisar zêde bû.

Nûnerê SKT (Sendîkaya Kedkarên Tenduristîyê) ê Nisêbînê: Wek tenduristîkaran em di hedefê de ne. Wexta em hewl dinin ku mudaxaleyî birîndaran bikin, em rastî êrîşên hêzên ewlehiyê tên. Em rastî zextên rêveberîya nexweşxaneyê tên. Di qedexeya demdirêj de hekîmek, teknîkerekî radyolojîyê û di hemşîreyên servîsê hatin surgûnkirin. Bi domahîya qedexeyan nexweşxane wek biryargehê tên bikaranîn. Polîs bi çekên xwe li nexweşxaneyê ne. Carnan nahêlin em midaxaleyî birîndaran bikin. Ewlehîya jîyana me jî di talûkê de ye. Ji ber qedexeyan 3 hevalên me yên tenduristîkar can dan. Di demên normal de nexweşên ku rojane li Servîsa Lezgîn didin 700-750 bû, lê belê di pêvajoya qedexeyan de ev hejmar dadikeve 30-40'î. Di pêvajoya qedexeyê de polîklînîk qet xizmetê nadin. Dermanxane, girtî dimîne.

- Li şeş taxên ku malên wan hatin ruxandin û şewitandin, nêzî 45 hezar kesî koçî bajar, navçe û gundan kir.

- Taybetîya hevpar a bajarên ku qedexeya derketina derve lê hat tetbîqkirin û rastî êrîşên giran man ew e ku ew kesên li wan bajaran bicihbûyîne di salên 90'î de ji ber valakirina gundan a bi darê zorê ji cihê xwe bûne. [36]

---

[36] Qedexeya Derketina Derve ya 134 Rojî ya li Navçeya Parêzgeha Mêrdînê Nisêbînê, 14.03.2016-25.07.2016, Amed Göç-Der





www.cnnturk.com/turkiye/nusaybindeki-operasyonda-savas-ucaklari-mi-kullanildi

Nusaybin'deki operasyonda savaş uçakları mı kullanıldı?

12.05.2016 Perşembe 21:41 (Güncellendi: 12.05.2016 Perşembe 21:51)
AA

Çerezler (cookie), cnnturk.com web sitesini daha etkin bir şekilde kullanmanızı sağlamaktadır. Detaylı bilgi için Çerez Politikamızı ziyare



TSK'ya bağlı savaş uçakları Nusaybin'i bombaladı

24 Mayıs 2016 14:36

Abluka ve saldırıların sürdüğü Mardin'in Nusaybin ilçesi, TSK'ya bağlı savaş uçakları tarafından bombalandı

BOMBEKİRİNA Bİ BALAFİRÊN ŞER Dİ ROJEVA MECLÎSÊ DE

Îddîaya ku Nisêbîn bi balafirên şer hatîye bombekirin, ket rojeva meclîsê jî. Parlementerê HDPê yê wê demê Ali Atalan pêşnîyaznameya pirsê ya nivîskî pêşkêsî Serokatîya Meclîsê kir da ku ji teref Wezîrê Parastina Netewî İsmet Yılmaz were bersivandin. Pirs wisa bû:

“Tê îddîakirin ku navçeya Mêrdîn Nisêbîn, 72 roj in qedexe lê berdewma dike, ji teref balafirên aîdî TSKê(Hêzên Çekdar ên Tirk) tê bombekirin, herwiha qada di navbera taxa Fırat û Zeynel Abidînê de tê bombekirin û nûçeyên li ser vê di çapemenîyê de cih girtin.

Bi vê re peywendîdar;

1. Rast e ku Nisêbîn bi balafirên aîdî TSKê tê bombekirin?
2. Çend heb balafir beşdarî vê bombebaranê bûne? Celeb û menşeîya van balafiran çi ye?
3. Di bombebaranê de çi şikil muhîmat hatine bikaranîn? Muhîmatên ku hatine bikaranîn ji kîjan welatî hatine kirîn?

Şahid: *Rojekê bi dizî ez çûm li eşyayên xwe binihêrim. Min dît ku kepçe alavên min derdixîne, diperçiqîne, dişikîne. Sarinca min derdixistin, dişikenandin. Min rahişt kevir û çûm kepçê. Min got: ma hûn ji xwedê natirsin? We em li bêtiştek hiştin, we mala me ji me stend, qene eşyayên me bidin me. Dîsa li polîsan geriyan, polîs hatin min birin qereqolê. hindik mabû min bigirtana. Em destvala vegeriyan malê. Em 3-4 malbat bi hev re diman. Em ditirsiyan. Tebeqa jêra me girtîbû, herkes dihat ba me. Em di rêzekê de bûn. Ji tirsa, me elektrîk venedikir. Jixwe elektrîk tunebû, ku hebûya jî me nikarîbû vêxista. rojekê cîranê me ji hêla segvanan hat birîndarkirin. Sê zarokên wê hebûn, ez qêriyam min got «Helîme birîndar bû» Ez ê biçiyama, destûr nedidan. Ji bo ku em biçin malên hev me dîwar qul dikirin. Min digot “ xwedêyo bila ev roj biçin û careke din venegerin!” Ez ji bîra nakim. Em diçûn destavê av tunebû, nimêja çi halê çi me pariyek nan nedidît bo xwarinê. Hê jî em nexweş in, hê jî ez bi ser hişê xwe ve nehatime. Di salên nodî de di dema valakirina gundan de em ji gundê xwe derketin. ango nehat serê min, hat serê hevjînê min û malbata wî, hatin Nisêbînê. Bavê min li ber wan ket. got, tiştekî wan tune ye. Him alîkarî bi wan re kir him jî min da wan. Me got, em mala xwe dixwazin, erdê xwe dixwazin. Nedan me. Ji neçarî me îmze kir, hê nû ye ev du meh e. Em naxwazin herin TOKÎyê, saxlem jî çênekirine. Roja çû şaneşîna wê filan hat xwarê. Ez ditirsim. Hê çi bibêjim, gelek tiştên ku bêjim hene lê nayên bîra min êdî. ji tirsan bi şevê em ranediketin. Sibehan carninan me deng derdixist, me li bermîlan dixist bo ku agirbest çêbibe. em nikarîbûn ji mala xwe biqetiyana. Em çi bikin. Yekcaran min di şibakê re dinihêrî, min digot “wira Ewrûpa ye, vira Kobanê” digiriyam. Min ji hevjînê xwe re digot, “zarokan bibe, ez ê li vira bimînim” Digotin “çima, ma em ji te çêtir in? Gelek mirov hatin kuştin li vir” Di qedexeyên 14 rojan de bi taybetî gelek kes kuştin. Her ku qedexe radibû em diçûn cenazeyan.*

1

444 44 47

Şahid: Li Sûriyeyê 2 lawê min û 2 keçê min birin, bi tena serê xwe mam li wargehê, ez dîn bûm. Zarokên min biçûçik bûn. Gotin, em ê we bikujin. Dema ku ji sînor derbas bûm min hemû pereyê xwe da yên li ser sînor. Ez nizanim kî bûn, bi Tirkî diaxivîn. Çûn û zarokên min anîn, piştre ji me re gotin "eger tu ji hinekan re behsa birina me ya zarokan bikî em ê bikujin." em gelekî tirsiyan. Li Sûriyeyê jî mafê me xwarin, em di rewşeke gelekî xirab de bûn. Em ji Qamişlokê hatin, li Sûriyeyê zarok dikuştin, zarokên çend cîranên min kuştin. Ji bo ku zarokên min nemirin ez reviyam. Şevekê di saet 3yan de em reviyan hatin vira. Gava ku em hatin vira jî em gelekî perîşan bûn. Alîkarî kirin, xwarin, kinc her cûre alîkarî kirin li Nisêbînê. Em 7 salan man û ji me re gotin, hûn çiqasî bixwazin hûn dikarin bimînin. tavilê gava ku hindekî bêhna me fireh bû me biryar da ku em xaniyekî nû bigirin. Lê di dema qedexeyan de em hê li wê malê diman. Xanî bi ser me de hilweşiya. Di qedexeyê de em li wir bûn, me ti dever nas nedikir, em ê biçiyna ku? Polîs hat ji me re got, derkevin, hûn çima dernakevin? Min got, em bi ku ve herin? Em ti deverê nas nakin. Got, hûnê li vira çawa bijîn, di nav van bombeyan, van tiştan de... Zarokên min bi şev ji tirsan ranedizan, ji êvarî heta sibehê şiyar diman, ji tirsa ranedizan. cil û bergên me timî amade bûn, em bi cilên xwe radizan gava ku tiştek biqewime bo em birevin. Gelekî gelekî gelekî dijwar bû, dema qedexeyan hê jî xirabtirbû. Em li Sûriyeyê jî perîşanbûn, em hatin vira em dîsa perîşan bûn. Hikûmeta Sûriyeyê çi di me de kiribe hikûmeta Tirkiyeyê jî heman tişt kir. Me gelekî perîşan kir. Ti tiştek nedan me, ji me re digotin, hûn çima hatin bajaran? Ne zarokên me girtin mektebê ne jî tiştek dan me. Li wira jî em ne hemwelatî ne, nasname nedan me, em hatin vira.

Em hatin vira, me xwe avêt vira, li vira jî wisa ye. Dema em hatin vira me got belkî li vira hê kêmtir bibe... Tîyekî min heye guhê wî kerr bû, hikûmeta Sûriyeyê îşkence lê kir û guhekî wî çû. Salekê nexweş bû, çi bixwara vedirşiya, min fêm nekir çawa nemir. Gelekî gelekî gelekî dijwar bû, tiştên me dîtin kesî nedît... Heta ku qedexe qediyan em man, em heta dawî man. Demeke dirêj xwarin tunebû, em bêxwarin man, bi ser de zarokên me nexweş ketin, di tariyê de,av tunebû. Hin cîranên me digotin, ji bo çi hûn li Sûriyeyê neman, çima we şer nekir? Dilê me gelekî ma. Dema em derdiketin derve zarokên min digotin, "dayê nebêje em ji Sûriyeyê ne" em fedî dikin bêjin, em ji Sûriyeyê ne. Ewqa tişt hatin serê me êdî ez fedî dikin bêjim, ez ji Sûriyeyê me. Dema ku diçim cihekî ku dibêjim, ez ji Sûriyeyê me, xanî nadin. Rojekî ez li xanî digeriyam min negot ez ji ku derê me, em li derve mabûn. Yekî got ez ê bi kirê bidim... Êdî çiqas jî bûya me yê bidaya. Piştre em çûn malê, gotin, tu ji ku yî? Gava ku min got ez ji Sûriyeyê me, got "em nadin Sûriyeyîyan min got, çima? Got, hema wisa? Min got, sedem çi ye, me çi kiriye? 7 sal e em li vira ne, bila bêjin we tiştek kiriye. Heta niha jî dibêjin, bi şûn de vegerin. Li Sûriyeyê jî ji ber ku em Kurd bûn cûdakarî hebû. dema em diçûn binkeya tenduristiyê ku fêm dikirin em Kurd in me bi şûn de vedigerandin. Niha Sûriyeyê bikin zêr jî ez narim. Malên min, dikanên min hene bila ji wan re be. Mêrê min parêzer bû lê tiştek nedidan me ji ber ku em Kurd bûn.

Li vira ez xwe li mala xwe hîs dikim, vira axa bav û kalê min e. Ez ji vira me jixwe, hemwelatiyê vira me. Piştre çaxa valakirina gundan bombe avêtin, mala me şewitandin, em jî tirsiyan û derbasî Sûriyeyê bûn. Li Sûriyeyê jî mala me hat şewitandin û em dîsa vegeriyan Tirkiyeyê.

Şahid: Di firaxên xwarinê de destava xwe kiribûn û firax xistibûn dolabê... Niha hişê min hezar par e, bi ku ve herim, çi bikim nizanim...

Şahid: Zarokên min naxwazin herin dibistanê. Dibêjin, hevalên me hatin kuştin, em ê jî bên kuştin, çûna dibistanê bi wan belasebeb tê...

Şahid: Em di hindurê mala xwe de nikarîbûn raketana, em ditirsiyan, digiriyan. Zarokên me gelekî tirsiyan. Gelekî binçavkirin qewimîn. Min bi çavên xwe dît, birîndar pirr bûn, yekî/a birîndar ji nexweşxaneyê girtin û birin binçav kirin. Mirî hebûn, nasên me jî hebûn sîxûr dişandin ser serê me(drone) Polîs nikarîbûn têkeve mala me, ceger nedikir. Ciwan hatin, ti tiştekî xirab nekirin, bi me re bûn. Polîsan gulle diavêtin, ku me bidîtana dikuştin. Li pêşiya mala min jineke bihalkî kuştin. Min bi çavên xwe dît xwîna wê ji derencê herikî; cîrana me bû. Mêrê wê ji qehra hevjîna xwe digot, ez ê xanî bişewitînim. Çûn, ji vira bar kirin. Haya wê jina ducanî ji ti tiştekî tunebû, ew kuştin. Em gelekî tirsiyan. Ji xeman me xwarin nedixwar, di qirika me re nediçû. Ji ber dengê çekan guhê min kerr bibûn, hînê jî baş nabihîzim. Ew deng hê di bîra min de ne, derûniya me xirabû. Em hêsîr mabûn. Bijîşk jî ji me re qedexebû. Me balîf dabûn ber şibakê, cîranên me yên ducanî hebûn lê nikarîbûn herin doktor. Ewqas zarokên nûciwan kuştin, nikarim herim wira Zarokan ji ber bûyeran hişê xwe winda kirin. Piştî qedexeyan demargirî (esabiyet) bi min re çêbû, êdî mîna berê ne bisebr û sekan bûn, ewqasî min hiş diavêt. Her tiştê me xirab. Em cîran mîna malbatekê bûn, me ji hev hez dikir. Em belav bûn, herkes çû cihên cûda. Piştî ku em derketin mal rûxandi. em heta dawiyî man, tavilê em derketim. Mala me rûxandin, xira kirin. Têkberên me şewitandin. Kesî alîkariya me nekir. Partiyê jî çend caran alîkarî kir. Yên ku dewletê didan, me nedixwest, lê carinan em birçî bûn me dixwest, jixwe tiştek jî nedidan. Di qedexeyê de dema em çûn Mêrdînê ji me re gotin derkevin ji vira, anons kirin gotin, hek hûn dernekevin em ê xanî bi ser we de hilweşînin, we gişan bikujin. Dema leşkeriy anons kir zarokên min giriyan, em wisa derketin, an na em dernediketin. Di malbata min de birîndar tune ye lêbelê ji cîranên min gelek hebûn. Dema ew roj tên bîra min gelekî li ber dikevim, ez ditirsim, dibêjim “ bila ew roj herin û careke din venegerin” poşman bûm, ez dibêjim; xwezî em derneketana, em jî li ser axa xwe bimana, ji cihê xwe derneketana. Ez fedî dikim, ji ber ku ez ji malê derketim. Mîna berê nikarim derkevim derve, nikarim rakevim, derman bi kar tînim an na nikarim rakevim. Nexweşiya şekirê bi min re çêbû, nexweşiya şekir tunebû, di dema qedexeyê de derket. Ji fetqê emeliyat bûm. Weke berê nikarim ti tiştekî bikim. nikarim hevîr jî bistirêm. Me ew zarokên delal dîtin, ew ciwan hemû çûn. Ti caran ez wan rojan ji bîr nakim, hemû di binê wê axê de ne. Zarokên gelek cîranên me şehîd ketin, gelekî delal bûn, nûciwan... Ez dewletê qet nabexşînim, belkî ji tirsan bibexşînim lêbelê em bi dilê xwe qet nabexşînim, jê hez nakin. Bêhna me çikandin, em zaf bihecîn. Zarokên me mirin, keçên nûciwan kûştin. Jixwe taxa min nemaye, di hindur wê de tiştekî min nemaye, hek hebe jî naçim jixwe. Eger bêjin, emê kirêya te bidin jî ez narim. Xwîna ewqa ciwanan heye li wira. Hevalê lawê min li ber çavên min kuştin. Digotin, herin dibistanê, diçûn, gulle berdidan me. Zarokên min ji ber vê yekê dibistan qezenc nekirin. Dema ez ji Mêrdîn vegeriyam her dever xira kiribûn, hilweşandibûm veguheriyabû cihekî sar. Em li ber diketin, me digot “çima cihê me xira kirin” Baş nebibû, xirab bû. Lê dîsa jî gava ez vegeriyam bêhna min derketibû, kêfxweş dibûm. Binihêr çiqa ne xweş kiribûn, ripîrast bibû, ji her deverê bêhna terman dihat, debar nedibû. Lê dîsa jî axa min bû. Mêrdîn zehmetbû, xerîbî zehmetbû. Tu deh gavan wê de herî jî zehmet e, axa te, mala te cûda ye. Min digot, ku konek jî hebe ez ê herim Nisêbînê, li Mêrdînê namînim.













APO


T.C. Kürdistan
mezar olacak

Gever

Yüksekova


Yüksekova
X
Toplam Ölüm Sayısı: 221
Sivil
PKK Militanı (HPG)
Tanımlanamayan Gençler
Güvenlik Gücü Mensubu
PKK Gençlik Yapılanması (YPS)
Toplam Ölüm Sayısı
30
20
10
0
Tem
Oca 2016
Tem
Oca 2017
Tem
Oca 2018
Tem
Van Gölü
Bitlis
Van
Van
Bitlis
Siirt
Siirt
Batman
Batman
Diyarbakır
Hakkâri
Hakkari
Şırnak
Mardin
المالكية
Qamişlo
دهوك
دهۆک
Yüksekova
(221)

YÜKSEKOVA
Nüfus: 77300

GEVER-YÜKSEKOVA

RÛXANDİNEK JI RÛXANDİNA ERDHEJA WANÊ

Ji Tirmeha 2015an û pê ve li Geverê pêvajoya rewşeke xerab û dorpêçeke dijwar destpêkir.Ji meha tîrmehê û pê ve 4 qedexeyên derketina derve hatin îlankirin ku li bajêr bi demên kurt berdewam kir.

Qedexeya derketina derve ya ku di 13ê Adara 2016an de hat îlankirin, bi şev û roj bênavber 79 rojan berdewam kir. Bi vê daxwuyanîya ku ji teref parêzgeha Colemêrgê hat dayîn, qedexeya derketina derve hat îlankirin:

“Li gor xala 11/C ya qanûna Rêveberîya Parêzgehan a bi hejmara 5442an li temamê navçeya Geverê di 13ê Adara 2016an de di saet 22.00an de, li Gundê Vezîrlî û Mezraya Çimenlîyê ku bi ser Geverê ve ne, di 30ê Adara 2016an de di saet 20.00an de qedexeya derketina derve hatîye îlankirin, têketin û derketina gundê Vezîrlîyê û Mezraya Çimenlîyê ku bi ser navçeya Geverê ve ne, hatîye qedexekirin.”


BİZ
Fırat Yılmaz ÇAKIROĞLU'NA
Barış Değil
İNTİKAM sözü verdik!
#Yüksekova
#PÖH

Tevî ku di 20 Nîsana 2016an de daxuyanîya qedandina operasyonan hat dayîn jî, qedexeya derketina derve heta 30ê Gulana 2016an berdewamkir.

> Ji ber hizr û gotegotan ku li Geverê jî qetlîameke mîna qetlîama Cizîrê ewê were pêkanîn, berî qedexeya derketina derve ya 13ê Adara 2016an ji navenda bajêr koçeke mezin destpêkir. Heta domahîya vê mehê destûr nehat dayîn ku ji dervî navçeyê kes têkevin nav bajêr. Lê belê qedexe piştî ku bo qismedemekê di navbera saet 6.00 û 20.00an de hat rakirin, têketina navçeyê mimkin bû.

OTOMOTIV
Hakka
D400
YU

Bi domahîya 79 rojan li navenda bajêr 6 hezar û 770 avahî hat şewitandin, ruxandin ku piranîya wan li taxên wek Cumhurriyet, Güngör, Orman û Dizelê bûn ku li ew taxan pevçûnên gurr diqewimîn.



Li gor rapora Geverê ya ku Odeya Endezyarên Avahîsazîyê (OEA) ya şûbeya Wanê amade kirye, di erhêja Wanê de ew qas avahî nehat ruxandin. Di raporê de hat destnîşankirin ku şerê ku bi tank, top û êrîşên hewayî hat meşandin, bajar bi erdê re kiriye yek û herwiha di raporê de li ser tespîta xisaran ev agahî hatin dayin: Li Geverê hejmara malên kêm xisar dîtî 3193’ye, hejmara malên nîv xisar dîtî 647 e, hejmara malên bi giranî xisar diîtî 787, hejmara malên şewitî jî 1336 e. Ji sisîyan yekê bajêr rûxîya. 23.640 kes bêmal man.

Tevî ku bi tank, top û êrîşên hewayî tahrîbateke mezin li bajêr hat pêk anîn jî ruxandina herî mezin piştî daxwuyanîya derbarê qedandina operasyonan ya di 20ê Nîsana 2016an de pêk hat.



Şahidê 1ê: *Qedexe, digel navendê li du gundan jî hat pêkanîn. Piştî ku operasyon qediya hêzên ewlekariyê dest bi rûxandin, şewitandin û şêlandina malan kirin. Di pêvajoya dorpêçkirinê de li taxên Esenyûrt û Îpekyolû elektrîk û av tunebû. hê jî elektrîk û avê nadin 8 taxan. Pêdiviya avê bi tankêran ji hêla şaredariyê ve dihat dabînkirin.*

Li taxên xendeq lê tunebûn jî hêzên ewlekariyî Dest bi rûxandin û şewitandinê kiribûn 90 mirovî jiyana xwe ji dest da, 51 kes jê li goristana bêkesan a Erziromê hatin veşartin. Di pêvajoya ewil ya 4 qedexeyên derketina derve de 5 sîvîlên ku navê wan Ersîn Aydin (37), Naîm Nûyan(29), M. Reşît Arici (17), Fetah Es (37 û Yakûp Babat (24) e jiyana xwe ji dest dan.

Şahidê 2an: *Teqez ez naxwazim ji vira derkevim, gora lawê min heye li vira. Rojê sê caran serdana wê dikim. Ez qayîl im ku di hinava vê ax û vê ariyê de bijîm.*



Şahidê 3yan: (heta 28 rojan ji mala xwe ya li taxa Dîzelê derneket) Heta 18 rojan hêzên ewlekariyê ji qereqolên Efeler, Kamişli û Mîçîçê tenê bi tank û topan Ji dûranî ve taxên Orman, Kişla û Dîzelê bombebaran kirin piştî 18 rojan tank ajotin cadeyan dest bi bombekirin û şewitandina malan kirin. Ji kêleka aş heta vira ji destê çep û ji rast de hemû mal dirûxandin. Top li minareya mizgeftê jî ket. Min debar nekir, derketim derve min got, “ma we li hemberî xwedê jî şer îlan kiriye?” Min ji fermandarê ku vê cadeyê gişkî kontrol dike re got, “werin ez bidim pêşiya we, eger ji vê cadeyê bi tenê guleyekê jî berdin we, ewilî min bikujin. Min got “malan neşewitînin, hilneweşînin. Li vira. Bi tenê ji malbata min zêdetirî 100mirovî dijîn; mala mirovan hilneweşînin. Nepejirandin.

Şahidê 4an: Dewlet wê demê vala nesekinî parçe parçe hêzên ewlehiyê kom dikir, rojekê me nihêrî ku navçe tevde tijî leşker û polîs bûye. Ewqa leşker û polîs hatibûn ku, di domahiya dorpêçkirinê de hema hema mal û dibistan tev ji hêla leşker û polîsan ve hat dagirkirin.

Şahidê 5an: (nûçegihan) Li taxa Kişlayê tunela ku komek sivîlên ji 7-8 kesan pêk dihat tê de bû, bêyî bangewaziya "xwe radest bikin" were kirin hat bombebarankirin û hemû kesên li wê derê jiyana xwe ji dest dan. Li vira gelek erkedarên ewlehiyê yên birîh û bi Erebî diaxivîn hebûn. Li vira ne rol û rayeya walî, ne ya qeymeqam, ne ya gerînendeyê ewlekariyê tunebû. JOH û POH ji deverekê emir distendin û pêk dianîn. Hêzên dewletê dema ku termek dihat binaxkirin ji malbatê bi tenê destûra beşdarbûna sê kesan dida. Di roja 11. an a 12emîn de li ser rêya Şemzînanê li erdê me dîmenê termekî girt. Di dîmenê de pisîkekê ji ji termê beşek dixwar. Di pey ku ev dîmen kete medyaya civakî re 8-9 termên li nava rê, hatin rakirin û walîtî neçar ma ku daxwiyaniyê biweşîne.

Şahidê 6an: Li wê herêma ku jê re Dolka Ezo tê gotin bavek û keça xwe mabûn, çendîn car bombekirina wê herêmê min bi çavên xwe dît. Herdu jî kuştine. Mirina wan mirovan neket çapemeniyê jî... domahiya 7 rojan bi tenê herêma ku ew malê lê bombe kirin.



Şahidê 7an: Dewletê li vira bi mirovan re şer nekiriye, bi xaniyan re şer kiriye. Xaniyê min ewqa dûrî taxa qedexeyê ye, xendeq tuneye, barîkat tuneye te çima mala min şewitand, rûxand? Li wê derê nirxên min hebûn, di malê de jî bihurîm. Wêneyê zarokên min hebûn CD hebûn, çi bike jî nikare wan bide min ku... Birastî jî pêdivî bi vê tunebû. Li ser Geverê xeyalên dewletê hebû, tiştekî mîna tolhildanê bû, tol hilanîn. Paşeroja herkesî şewitandine, hilweşandine. Yê min CDYên dawetê yên bi hevjînê min re hebûn. Niha tiştekî wisa tuneye êdî. Hevjînê min di Newroza 2008an de qetil kirin. Her tiştê min şewitandin, hilweşandin.



Berî qedexeyê jî em li vê malê rûdiniştin. Xira kirin me dîsa ava kir. Temenê min 80 ye. Ez ji mala xwe derketim. Di qedexeyê de min çû lê nihêrî li mala min qiyamet rabibû. Qedexe rabû ewiliya ewilî em hatin, tiştekî ku polîsan di me de nekir nema. Dema nû qedexeyê dest pê kir em derketin. Min got "ez dernakevim" polîsan got, "em ê te bikujin. YPSê jî got, "derkevin hûn ê bimirin" Xwarin tunebû jixwe. Gava em radibûn ku tiştekî bikin heta me dikir kezeb li me reş dibû. Ava me nebirrîn, ava me a bîrê hebû, neparzûnkirî me vedixwar. Elektrîka me tunebû. Ez sond dixwim qiyamet rabibû. Çend mal kirin mîna axurê. Zarok şehîd xistin. Leşkerî ketibû malê, mehû kiribûn, ne karê mirovan bû. Ti tiştekî me nemabû, heta laçika me biribûn. Binçek hilpekandibûn tobe tobe... Hek bêjin "qiyamet rabûyîye" ez ê bêjim "ew qiyamet bû, ew qiyamet bû.

Derûna me xira bibû, hê jî derûna me xirabe ye. Ku tu bêjî, here taxê, ez nikarim herim, ez berê diçûm. Me hemû dîn kirin. Li pey qedexeyan ecêbek mirov xwe kuştin. Bûka cîranê me xwe kuşt. Derûna wê xira bibû. Ji xwesiya xwe re gotiye "ez dadikevim jêr" daketiye xwe daliqandiye. Zarokên nûciwan kuştin. Ji taxê ti tiştekî zarokê tunebû sê gulle bera wî dan kuştin. Li Geverê qiyamet rabû. Hînê jî pirr ditirsi, di hindurê min de qiyamet radibe. Mala me bi ser min de hilweşiya, ewqas mirov mir in, baweriya te bi xwedê hebe weke cihê mehşerê bû... Derûna min xirabe ye. Dema ew qiyamet tê bîra min welehî ez dîn dibim. Ez ne Tirk im, malbata min ne tirk e, ez yek gotina Tirkî nizanim, ji bo çi tu ji min dixwazî ez bibim Tirk? Çawa bibim? Tebî bila dewlet lêborînê bixwaze, lê nabe ango. Lêborînê bixwaze jî dilê min rehet nabe. Ez Kurd im ew Tirk, sibê wê dîsa me ji hev biqetîne. Ez şaş dimînim çawa em dîn nebûn. yekane tiştê ku tê bîra min qiyametbû.

Dewletê li vira bi mirovan re şer nekiriye, bi xaniyan re şer kiriye, mala min ewqa dûrî taxa qedexeyê ye, xendeq nîn e, barîkat nîn e, te çima mala min şewitand, hilweşand? Li wira nirxên min hebûn, ez di xanî de jî bihurîm, wêneyên zarokên min, CD hebûn çi bike jî nikare wan bi şûn de bide min. Bi rastî jî pêdivî bi vêya tunebû. Xeyaleke dewletê li ser Geverê hebû, tiştekî mîna tolhildanekê bû, tol hilanîn. Paşeroja herkesî şewitandine, hilweşandine. yê min CDyên dawetê yên bi hevjînê min re hebûn, niha tiştekî wisa tune ye êdî. Hevjînê min di Newroza 2008an de qetil kirin, her tiştên min şewitandin, hilweşandin.



Enduro
Desert
Rally

Rewşa Giştî:

Hat çevdêrî kirin ku li 7 taxan tahrîbat pêk hatine. Ew tax ev in : Yeşildere, Dize, EskiKışla, Mezarlık, Orman, Cumhuriyet, Güngör.

Av-Elektrîk:

Hat bilêvkirin ku li taxên Geverê yên wek Yeşildere, Dize, Eskikışla, Mezarlık, Orman, Cumhuriyet, Güngörê av û elektrîk tunebûn. Ji ber ku li van deran depoyên avê hatin rûxandin Şaredarî avê bo vanderan bar dike lê belê di şûna çareserîyeke wisa demkî de pêdivî bi çareserîyeke mayînde heye. Hat tespîtkirin ku ji nav taxan li taxa Mezarlık, Orman, Cumhuriyet û Güngörê depoyên avê herwiha borîyên avê xisarên mezin dîtine û divê dîsa xeta avê were kişandin. Hat çavdêrîkirin ku li van taxan kablo û trafoyên elektrîkê hatine tahrîpkirin.

Vehewîn:

Malbatên ku hatine pirên wan mala wan rûxîyaye an jî şewitî ye. Gel naxwaze mala xwe biterikîne, ku di hewşa malê de be jî dixwazin bimînin. Kesên ku mala wan hatîye rûxandin bi derfetên xwe an dixwazin li hewşa xwe kon vegirin û lê bimînin ji ber ku nikarin vê bikin li gel nasên xwe yên ku mala wan saxlem mane, bi awayekî qerebalix dimînin.

Hawîrdor:

Bi domahîya qedexeya ku nêzî 3 mehan dom kir, ji ber beratên ajalan, ji ber teqqandina çahlên foseptîkê, ji ber guleyên çekan ên ku *hatina bikaranîn û ji ber ku qûtiyên konserveyê li mal û kolanan ne, ev yek dibe sedema qirêjtîya hawîrdorê û bo tendûristîya gel talûkeyên ciddî pêk tîne. Bo vê jî divê hawîrdor were dermankirin, li gundan derman were kirin û ajal werin derzîkirin. Divê tavilê wezareta hawîrdorê û kesên berpirsîyar bo vê çareserîyê bibînin.*

Xwedîbûn:

Gel dîyar kir ku piranîya alîkarîyan bo gihiştina navçeyê hatine astengkirin, ji ber ruxandina pirên firneyan pirsgirêkên girîng yê xwedîkirinê dertên.

Rewşa Psîko- Sosyal:

Malbatên ku bi kavilên xanîyên xwe rû bi rû diman, travmayên girîng ên psîkolijîk dijîyan. Kesên ku heta domahîya qedexeyan li navçeyê man û bi piranîya kesên ku ji ber qedexeyan ji cihê xwe hatin koçberkirin, hat çavdêrîkirin ku bi wan re pirsgirêkên wek fikar,tirs, xwe vegirtin, neçarî, bêdengbûn, puxudoktî, bêxewî der hatine, li dij nûnerên dewletê yên li herêmê jî nebawerî, nefret û qahr heye. Di vê pêvajoyê de ji ber faktorên stresê yên li jor jî hatine ravekirin,ji teref kedkarên tenduristîyê hat îfadekirin ku di bûyerên nexweşîyên wek welidandina mirî, xerabûyîna konversîf zêdeyî çêbûye.[37]

---

[37] Rapora Tenduristîyê ya Geverê-2016: Komîsyana tenduristîyê ya ku Meclîsa Tenduristîyê ya Kongreya Demokratîk ya Wanê(KDW), Yekîtîya Tebîbên Tirk(YTT), Sendîkaya Kedkarên Xizmeta Civakî û Tenduristîyê û Meclîsa Tenduristîyê ya Ciwanên Azad di nav de bûn.


Tanrı sizleri
cezalandırmak
için
bizleri yolladı...


YA SEV!!
YA ÖL!!!
YASTA
YÜKSEROVADA


Gever
BEYŞEHİR


Filistin


YÜKSEKOVA'DA
"GÖLGE"LeniyoruZ
T.B. ÖĞE'ye
S


Filistin
DABA


BOZOVA'YA
Salm olsun
SUR!!!
AG-BOZOVA


BIZ
Firat Yılmaz ÇAKIROĞLU'NA
Bariş Değil
İNTİKAM sözü verdik!
#Yüksekova
#PÖH

Têkilîya bi Cihanê re bi temamî qût bû, çûn hatin bi şev û rojan bênavber hat sînordarkirin.

Xebata rapora Komîsretîya Bilind ya Neteweyên Yekbûyî ya ku di navbera Tîrmeha 2015an û Kanûna Ewel a 2016an de li herêmên pevçûn lêrûdayî çêkirye

1. Ev rapora ku têkildarî operasyonên ewlehîyê, bi taybetî yên hikûmeta Tirkîyê yên li rojhilatê başûrê[38] Tirkiyê di navbera Tîrmeha 2015an û 31ê Kanûna Ewel a 2016an de hatin meşandin, nêrîneke giştî li ser fikarên derbarê mafê mirovan ên esasî de pêşkêş dike.

2. Hat raporkirin ku di navbera Tirmeha 2015an û 2016an de li başûrê rojhilatê Tirkiyê ji ber opresayonên ewlehîyê nêzî 2000 kesan can da. Li gor agahîyên ku hatine bidestxistin, di nav wan de 800 endamên ewlehîyê hene û ji gelê herêmê jî nêzî 1200 kesî hene. Tê raberkirin ku di nav van 1200 kesî de hejmareke neteqez li dij dewletê çalakîyên tundîtîyê an jî bêtundîtî pêk anîne. Komîsretîya Bilind a Mafê Mirovan a Neteweyên Yekbûyî(KBMMNY/OHCHR) bêhejmar bûyer tomar kirye ku zêde hêz hatîye bikaranîn, kuştin, wendakirina bi zorê; êşkence, tunekirina mal û mîrasa çandî, teşvîkirina nefretê, rêlibergirtina gihiştina xizmetên tibbî yên lezgîn, xwarin, av û çavkanîyên debarîyê, tundîtîya li dij jinê, sînordarkirinaazadîya fikr û derbirînê, mafê beşdarbûna polîtîk. Hat raporkirin

---

[38] Ev yek, herêmeke cografîk e ku a parêzghên Tirkiyê yên wek Semsûr, Êlih, Çewlik, Bêtlis, Amed, Dilok, Colemêrg, Kilîs, Mêrdîn, Sêrt, Riha û Şirnexê dadihundirîne.

ku binpêkirina mafê mirovan a herî cidî jî di dema tetbîqkirina qedexeya derketina derve de pêk hatîye. Di vê heyamê de têkiliya hin deveran ji cihanê bi temamî qût bûye û çûnehat bi rojan, bi şev û roj, bê navber hatiye sînordarkirin.

3. Piştî ku OHCHR’yê ji Tirmeha 2015an û vir ve iddîayên bi detay û pêewle li ser binpêkirina mafê mirovan li başûrê rojhilatê Tirkîyê bi dest xist, Konseya Mafê Mirovan ya Prosedurên Taybet û Organên Peymana Mafê Mirovan di nav de pir ji mekanîzmayên Mafê Mirovan yâ Neteweyên yekbûyî û mekanîzmayên mafê mirovan yê li Ewropayê, bi taybetî jî Komîserîya Mafê mirovan ya Ewropayê li ser idîayên raporkirî fikarên xwe bi lêv kir.

4. Di Gulana 2016an de Komîserîya Bilind ya Mafê Mirovan ji hukûmeta Tirkîyê destûreke tam û bêasteng bo gihiştina herêmên têkildar xwest da ku bi ekîbeke rayaderên mafê mirovan ên OHCHR’yê agahîyan ispat bike û fikarên li ser mafê mirovan ên raporkirî bipirse.[39] OHCHR ev daxwaz bi çendîn caran şopand lê belê ji Sebata 2017an û pê ve ji rayedarên Tirkîye’yê tu bersiveke fermî wernegirt.[40]

5. Ji ber ku di rêlibergirtina gihiştinê, di Pûşpera 2016’an de Komî-

---

[39] Di 11ê Gulana 2016’an de Komîserîya Bilind, ji Nûnerîya Daîmî ya Tirkîyeyê re ya Ofîsa Neteweyên YekbûyÎ ya li Cenevê û ya sazîyên navneteweyî yên din ên li Siwîsreyê, bo îddîayên ku hatine stendin, bi awayekî serbixwe lêkolîn bike nameyek şand daku ekîba OHCHR’Yê li başûrê rojhilatê Tirkîyê çavdêrîyê bike.

[40] OHCHR dipejirîne ku di 8ê Sebata 2017an de ji Mîsyona Daîmî ya Tirkîye’yê ya Ofîsa Neteweyên YekbûyÎ ya li Cenevê û ya sazîyên navneteweyî yên din ên li Siwîsreyê Notaya Devkî wergirtîye û bi vê notayê Komîserîya Bilind ya Neteweyên Yekbûyî bo serdana Tirkîye’yê hatîye dawetkirin. OHCHR her çiqas bi vê dawetê kêfxweş be jî, ji ber rêlibergirtana gihiştina herêmên şer ên li başûrê rojhilatê Tirkîye’yê xemgînîya xwe dîyar dike.

serîya Bilind di çarçova Biryara Lijneya Giştî ya Netewyên Yekbûyî ya bi hejmara 48/141ê selahîyeta xwe bikaranî da ku li Ofîsa Navendî ya li Cenevê pêvajoya şopandinê were meşandin.[41] Ev pêvajoya şopandinê li gor metodolojîya standart a OHCHR'yê pêkhatîye. Bersiva Hukûmeta Tirkîye'yê ya li dij darbeya 15ê Tirmeha 2016an û polîtîkayên wê yên li dij terorê û herwiha hin geşedanên ku her derê welêt tesîr dike di vê raporê de bi rewşa başûrê rojhilatê Tirkîye'yê re eleqedar (direkt an jî îndirekt) nîşan dike.[42]

6. Ev rapor, ji agahîyên piştrastkirî û analîzkîrî yên ekîba ji dûr ve şopandinê ya OHCHR'yê hatîye çêkirin. Di nav rêbaza berhevkirin û piştrastkirina agahîyan de hevdîtininên mexdûr, şahit û xizmên mexdûran, analîza agahîyên ji teref Rêxistinên Civaka Sivîl ya Nevneteweyî û Tirk û Hukûmeta Tirkîye'yê, qeydên fermî, belgeyên çavkanîyên aşkere, dîmenên stalaytê, vîdeo, wêne û materyalên dengî û her wekî din materyalên têkildar û ewle hene. OHCHR'ê di çarçoveya astengîyên ji dûr ve şopandinê bo bihêzkirina derbasdarîya agahîyên wergirtî pûte pê daye. OHCHR'yê taahud kirye ku hemû çavkanîyan biparêze û wan veşartî bihêle. Loma jî rapor ji bilî rizaya çavkanîyan tu agahîyên ku nasnameya çavkanîyan kifş bike nade.

7. OHCHR, ji ber agahîyên debarê rewşa başûrê rojhilat bidestxistiye, ji Mîsyona Daîmî ya Tirkîye'yê ya Ofîsa Neteweyên Yekbûyî ya li Cenevê û ya sazîyên navneteweyî yên din ên li Siwîsreyê OHCHR her çiqas bi vê dawetê kêfxweş be jî, ji ber ku raste rast negiştîye mi-

---

[41] Biryara Lijneya Giştî ya Netewyên Yekbûyî ya bi hejmara 48/141ê, bo diyaloga bi hemû Hukumetan re di çarçova selahîyeta xwe de bang li Komîserîya Bilind a Mafê Mirovan a Neteweyên Yekbûyî dike: a) Ku her kes ji mafê xwe yê kesayetî, çandî, aborî, sîyasî û civakî bi awayekî bibandor sûd werbigre, piştgirîya van mafan bike û biparêze...f) Da ku hemû astengîyên li pêşîya mafê mirovan were rakirin û bo rêlibergirtina berdewamîya binpêkirina mafê mirovan roleka çalak hilgire; g) Bo ku dijwarîyên li ser pêkanîna mafê mirovan were nirxandin.

[42] PKK; Di lîsteya terorê ya dewleta Tirk, hin dewletan, YE, û NATO'Yê de ye.

rovan û hin çavkanîyên hukûmetê, çavkanîyên serbixwe û yên dervê hukumetê xemgînîya xwe dîyar dike. Ev, rê liber dîyalogê girtîye û îddîayên ku hatine bidest xistin, piştrastkirina wan a bi agahîyên di destê rayedarên herêmî de ne mimkin kirye. Loma jî dema ku ev rapor dihat nivîsandin, îddîayên ku radestî OHCHR'Yê hatine kirin nehatine piştrastkirin. Lom a jî ev rapor rewşa mafê mirovan a li başûrê rojhilatê Tirkîye'yê bi awayekî berfireh venabêje lê belê mînakekê li ser bûyerên sedema fikarên herêmê dide ku di navbera Tirmeha 2015an û Kanûna Ewel a 2016an de qewimîn.

Mafê Jîyînê

23. Li gor agahîyên ku OHCHR'yê ji pir çavkanîyan wergitine, di çarçoveya opreasyonên ewlehîyê de di navbera Tirmeha 2015an û Kanûna Ewel a 2016an de li başûrê rojhilatê Tirkîye'ye nêzî 2000 kes hatine kuştin. Rapor bi piranî hejmara kuştîyên ji herêmê nêzî 1200 kesî dide. Dibe ku di nav van 1200 kesî de hejmareke neteqez li dij dewletê çalakîyên tundîtîyê an jî bêtundîtîyê pêk anîbin; ji ber ku daneyên li ser birîndar û mirîyan ên ewle û bo gihiştînê vekirî tunene, piştrastkirina îstatîstîkên wisa zahmet e.

Hat raporkirin ku di dawîya 25ê Çileya 2016an û serê Sebata 2016an de li navçeya Cizîrê mêr, jin û zarokên li jêrzemîna avahîyan asê man ji teref hêzên ewlehÎyê hatine bombekirin. Şahid û endamên malbatên qurbanîyên Cizîrê ku bi OHCHR'yê re hevdîtin kirin, rave kirin ku taxên wan bi temamî hatine ruxandin. Li gor vê, li ew taxan, ji ew 189 kesên İDP'yî ku ji operasyonên hêzên ewlehîyê revîyane, di jêrzemînên avahîya de, di mehên herî sar ên salê de bêyî xizmeta av, xwarin û tenduristîyê û elketrîkê bi hefteyan asê mane. Hin qurbanîyên ku di jêrzemînan de asê mane, hewldane ku bo balkişandina raya giştî ya cîhanê bi rêya telefonan têkilî bi RCS(Rêxistinên Civakâ Sivîl) û parlamenteran danîne û bo xelasîya ji bombebaranê lavayî kirine. Li gor malbatên qurbanîyên Cizîrê û li gor raporên hin RCS'yan hejmareke nedîyar ya bedena mirovan ji ber agirê bombebaranê û ji ber rûxandina piştî bombebaranê bi temamî an jî qismî wenda bûye.Ji ber ruxandina avahîyan delîl wenda bûne û loma jî tespîta nasnameya kesên mirî û şopandina van kesan bi awayekî berfireh hatîye astengkirin. Wekîdin rayedarên herêmî di şûna bikaranîna zêde hêzîyê ya ku hatîye raporkirin û mirinên ji ber wê vekolîne û lêpirsînê bike, kesên ku hatine kuştin tewanbar kirye ku tevî rêxistina terorê bûne û tedbîrên zextê li dij endamên malbata wan wergirtîye.

26. OHCHR'yê di Sebata 2016an de bi birayê jinekê re ku ew jin li Cizîrê hatibû kuştin axivîye. Malbata jinikê, bo wergirtina tiştên ji wê mane ji teref dozgerê komarê hatîye gazîkirin. Nasnameya wê bo hevgirtina DNA ji 3 perçeyên laşên ji laşê wê maye, dîyar bû. Ji malbata wê re li ser kuştina wê tiştek nehatîye vegotin an jî rapora tiba adlî nehatîye dayîn. Xwuşka jinikê bo darizandina kesên ku di kuştina wê de berpirsîyar in gazî kir û bo destpêkirina pêvajoya kanûnî hewl daye lê belê bi tewnbarîya terorê ew dane dadgehê.

27. Li Cizîrê îfadeyên şahidîya hin hevserên din ên navosere wisa hatîye ravekirin ku li gor rewşa giştî, jîyana mirovan bêqîmet hatîye dîtin û hukûmetê li gor qirîzê beriv nedaye. Li gor hevseran, di 14ê Kanûna Ewel a 2015 an de qedexeya derketina derve bo 24 saetan hatîye tetbîqkirin(Cara duyem) û bi piştre hemû kesên ku li herêmê dijîn ji ser wan av, elektrîk û xwarin hatîye birîn. Gel ev yek wek cezayeke giştî şîrove kirye. Taxên Cizrê yên wek Yafes, Nur, Sur û Cudi'yê bi awayekî qismî hatine tehlîyekirin lê belê bi piranî 189

kesên ku ji cihê xwe hatine kirin,ku ji teref rayedaran cihên wan dihat zanîn, di ew jêrzemînên avahîyên kêlekê de asê mabûne. Li gor şahidan bajar bi giranî dihat bombekirin û polîsên segvan li ser banîyên malan mewzî girtibûne û li gor hatîye raporkirin, piştî agirbestê bi kêfî gule berdidan. Tê îfadekirin ku rê liber ambûlansê hatîye girtin, têkevin herêmên qedeqeya derketina derve lê tê tetbîqkirin da ku nexweş û birîndaran hilgire ev yek jî bûye sedema mirinan ku mimkin bû rê li ber were girtin.

28. Şahidan vegotin ku di navbera walîyên[43] ku ji teref hukûmetê hatine wesîfedarkirn û şaredarên bi piranî eslê xwe kurd de nebawerî heye. Ev nakokî bo nufûsa herêmê bû sedema encamên trajîk.Wek ku komîteya krîzê ya walî rapor dike, tu hebatkarên şaredarîyê di nav wan de tunebû. Hêzên polîsan yên bi ser Wezareta Karê Hundirîn ve jî rapor dike ku li dij gel bi tundî hatîye tevgerandin û gel bo alîkarîyê tirsîyaye ku biçe cem wan.

29. OHCHR'yê li navçeyên wek Sûr, Farqîn, Licê(Parêzgeha Amedê), Nisêbîn, Kerboran(Parêzgeha MêrdÎnê), Navenda Şirnexê, Girgê Amo, Hezex(Parêzgeha Şirnexê) û Geverê, her çiqas di çerçoveyek biçûk de be jî, li ser bûyerên din ên ku bûne sedema mirina gelên herêmê, jî bi şahidan re hevdîtin kirye. Piştî mirinan her tim bi awayekî giştî kesên ku nemirine ji cihê xwe tên kirin û bîrdarîyên çandî yên herêmî û xanîyên wan tên rûxandin.

30. Li gor agahîyên çavkanîyên cûda yên li hundir Tirkîye'yê û li dervî Tirkîyeyê hatine bidest xistin, mirina kesên herêmê ya ji ber operasyonên ewlehî yê mimkin bû ku bihata astengkirin,(i) bi taybetî ku bikaranîna çekan bi tenê bo rewşên lezgîn ên talûkeya jîyanê

---

[43] Li Turkîyê serokatîya parêzgehan(bi navê xwe yên berê vîlayet) walî dikin ku ew ji teref lijneya wezaretan tên weîfedar kirin û bi ser Wezareta Karên Hundirîn ve ne.

an jî di bûyerên rîska ciddî ya birîdarbûyîn de bihata sînordarkirin, ji hêza zêde û ji bikaranîna çekên giran bihata dûr dan. (ii)ku bo tahlîyeya gel korîdorên alîkarîya mirovî di dema xwe de bihata vekirin û(iii) ku bo birîndar û nexweşên ji ber nedabînkirina xizmetên tenduristîyê yên lezgîn mirinbarîkat bo ambûlansan bihatana vekirin.

31. Li gor agahîyên OHCHR'yê ji malbatên qurbanîyan wergirtîye dozgerên herêmî li ser mirinên hatine raporkirin bi israr lêpirsînê venake. OHCHR li ser mirinên ku hatine raporkirin, tu delîlên li ser lêpirsîneke bibandor û serbixwe ku hatibe meşandin, bi dest nexistîye. Hemwelatîyên ku li ser şopa mirîyên xwe gerîyane, wek ku hatiye raporkirin, ew birine qerekola polîsan û hatine prisîyarkirin.

B. Rûxandin û îstimlaqkirina milk û xanîyan

32. Operasyonên ewlehîyê yên ku ji Tirmeha 2015an û vir ve dom dikin li xanî, kargehan û li avahîyên rayagiştî û qadên raya giştî ya başûrê rojhilatê Tirkîye'yê, bi taybetî li navçeya parêzgeha Mêrdînê Nisêbînê (li dîmena4.em binehêrin) û li navçeya parêzgeha Amedê Sûrê(li dîmena 5em binehêrin), ji xisarên sivik û heya ruxandinên berfireh xisarên ciddî dîtine. Bombebarana li wan herêman, wek ku hatîye raporkirin, nufûsa bajaran, binyada milkîyetê û karektera mîmarîyê bi temamî û bi awayekî mayînde guhertîye.

33.Ruxandina giran piştî operasyonên ewlehîyê dastpikirye; rayedaran, wek ku hatîye raporkirin, rê li ber nufusa ku ji cihê xwe bûyî, girtiye ku vegerin malên xwe û malên xwe ji nû ve ava bkin û bi makîneyên ku anîne avahîyên ku sivik xisar dîtine û mîrasa çandî jî di nav de avahîyên bajêr bi erdê re kirine yek. Bajar û bajarokên li başûrê rojhilatê Tirkîye'yê êdî wek erazîyên vala û parkên gir tên tasvîrkirin.

34. Tevî ku îstatîstîkên berfireh li ser xanîyên rûxandî tuneye jî analîza dîmenên stalaytê ya ji UNOSATê hatine dabînkirin, xisara mezin a li başûrê rojhilatê Tirkîye'yê derdixe holê. Ji hin cihên ku pir xisar dîtine, Nisêbîn, Dêrik, Kerboran (Mêrdîn), Sûr, Bismil û Dîcle(Amed), Cizîr û Girgê Amo(Şirnex) ye. Mînak li Nisêbînê(Parêzgeha Mêrdînê) bi rêya dîmenên stalayta UNOSATê hat tespîtkirin ku 1.786 avahî xisar dîtîye, ji nav wan 383 heban bi giranî xisar dîtîye û 1005an kêm xisar dîtiye(li Dîmenên 6em û 7em binehêrin). Li gor Dimenên stalaytê ya UNOSATê ev xisar ji ber bikaranîna çekên giran û ji ber avêtina muhîmatên ji hewayê der hatîye,

35. Dîmenên stalaytê rê dide ku piştî operasyonên ewlehîyê jî hukûmetê milkên taybet û avahîyên rayagiştî ruxandîye. Mînak li navçeya Amedê Sûrê, ku hejmara nufûsê li wir bilind e, faalîyetên rûxandinê bi makîneyên giran pêkhatîye.Dîmenên stalaytê yên ku di navbera Pûşpera 2015an û Tîrmeha 2016an de hatine kişandin, rêdidin ku ekîbên rûxandinê her carê beşekî bajêr dîyarkirine û piştre bêyî ku cûdahîyekê têxe nava avahîyên xisardîtî û xisarnedîtî ew rûxandine.

36. Li gor çavkanîyên herêmî bo ku hemwelatî eşyayên xwe werbigrin an jî milkê xwe înşa bikin, rê liber wan hatîye girtin ku têkevin ew deveran û wek ku hatîye raporkirin, kavilên ku îhtimal pê heye ku bermahîyên cenazeyan di nav wan de hebin li qiraxa çemê Dicleyê hatine valakirin. Hat tespîtkirin ku faalîyetên rûxandinê ji bihara 2016an de zêde bûye û di meha tebaxê de gihiştîye asta herî bilind û rojane nêzî 1000 m2 hatîye ruxandin. Li navenda bajarê Amedê ya 2000 salî 3 hektar(30.000 m2) avahîyên bajarîyî bi vî awayî di Tebaxa 2016an de hat rûxandin. Tê texmînkirin ku firehîya

avahîya bajarîyî ya rûxandî ji Çileya 2016an heta tebaxê, bi domahîya heyama 8 mehan, 18.7 hektar e. Rêveberîya Herêmî ya Amedê texmîn dike ku avahîyên beşa rojhilatê taxa Sûrê ji sedî 70'yê wan bi bombebaranê hatîye tunekirin. 40.000 ji 120.000 hemwelatîyên li Sûrê, wek ku di raporê de tê îfadekirin, ji herêmê revîyane û destûr nayê dyaîn ku vegerin û ji nû ve malên xwe ava bikin.

37. Bedenên bajêr ên 2000 salî ku navçeya Amedê Sûrê dorpêçdike, di nav programa parastina Mîrasa Cihanê ya UNESCO'yê de ye. Raporên şaredarîyê rê dide ku, di heyama bombekirina navçeya Sûrê de, di navbera îlona 2015an û Gulana 2016an de bo ku hukûmet xisarê nede bedenên bajêr tedbîr stendine lê belê ew taxên nav bedenê bi awayekî sîstematîk, bi temamî rûxandîye.. Ev kifş dike ku milkên taybet xwezaya sîstematîk ya rûxandinan derdixe holê.

38. Rêveberîya herêmî ya li parêzgeha Amedê rapor dike ku di Adara 2016an de Lijneya Wezîran parselên arazîyên li navenda Sûrê bo ku ji sedî sed îstimlaq bike, biryarê werdigre. Hat îddîakirin ku bi vî awayî demografîya herêmên hemwelatîyên kurd lê dijîn, bi temamî biguherin.[44] Li gor ku hatîye raporkirin gelê li heremê dijî û şaredarîya Amedê qet beşdarî plana îstimlaqê nehatîye kirin an jî li ser planan nehatîye agahdarkirin û bifikarin ku ew li dervî planên ji nû ve avakirinê werin hiştin.

39. Li gor sazîyên mafê mirovan ên li rojhilatê başûrê Tirkîye'yê hukûmet bi şertê ku xwedîyê milkan beyanameyekê îmze bikin ku tê de rûxandina milkên wan ''ji ber êrîşên terorê''tê îfadekirin, qebûl dike ku bo xanîyên rûxandî tezmînateke maddî bide. Wek ku hatîye raporkirin malbatên ku bo îmzekirina van beyannameyan

---

[44] http://new-compass.net/sites/new-compass.net/files/SUR_Report_2016-04-07.pdf, 20ê Mijdara 2016an de ev malper hatîye gihiştin.

mecbûr tên kirn, vê wek hewildanek bo guhertina qeyda tarîxa bûyerên 2015-16an dibînin û difikirin ku ev yek ewê di pêşerojê de rê li ber hesapdayînê bigre. Çavkanîyên OHCHR'yê, îddîa dike ku bi domahîya operasyonên ewlehîyê yên dawîya 2015an û serê 2016an malbatên malên wan rûxîyayî ku zor li wan tê kirin, bo ku malên xwe biterikînin herwiha destûr nayê dayîn ku eşyayên xwe yên kesayetî werbigrin an jî piştİ operasyonên ewlehîyê vegerin malê xwe û zorê didin wan daku bi îmzeyekê dev ji milkîyeta mala xwe berdin.

40. Di 4ê Îlona 2016an de hukûmetê bo başûrê rojhilatê Tirkîye'yê pakêta ji nûve avakirin û pêşketina aborîyê îlan kir.Tirkîye'y3e bo herêmên "Ku ji teref PKKê ji Tirmeha 2015an û vir ve rûxîyane'' ew 21 milyar dolarên Emerîka xerc bikiraya. Tê hêvîkirin ku îdareya Malên Komî ji 30,700 xanîyî zêdetir(ji wan 7000 li navçeya Amedê Sûrê ne) ewê ava bike an jî ji nû ve ava bike û 800 febrîqeyan36 stadyûmên sporê û 15 nexweşxaneyên nû ava bike. Plan her wiha hîbeyên biçûk, veberhênanên xizmetên civakî û tazmîna maddî ya xisaran jî dadihundirîne.OHCHR bi fikar e ku plana hukumetê ya pêşketinê îddîayên li ser rûxandinên giştî û nehewce, bêyî ku tedbîrên lêpirsîn û hesap dayînê were stendin, were tetbîqkirin.

C. Mafê Tenduristîyê

41. Di dema operasyonên ewlehîyê de li başûrê rojhilatê Tirkîye'yê raporên li ser binpêkirinên giran ên mafê mirovan balê dikşîne ku qedexyên derketina derve yên ji teref hêzên ewlehîyê tên tebîqkirin û bişev û rojan berdewam dikin, tevkarîya binpêkirinan dike û kapasîteya hukûmetê sînordar dike ku xizmetê esasî bo nufûsa bandorgirtî bibe.

42. Rayedaran dîyar kirin ku qedexeyên derketina derve yên li 30

bajarok û li mehelleyan hatin tetbîqkirin, hemû tevgerên bêdestûr heta çend mehan, bo demên dirêj qedexe dike. Di dema qedexeya derketina derve de rayedaran, wek ku hatîye raporkirin, bo demên dirêj ji ser bajaran temînkirina av, elektrîk û xwarinê bi temamî qût kirine. Hatîye raporkirin ku tevî destûrdayînê ji tevger pir zahmet e, herwiha bo nexweş û birîndaran jî gihiştina navendên tenduristîyê pir zahmet e. Wekî din,hatîye dîyarkirin ku hêzên ewlehîyê di dema qedexeya derketina derve de gihiştina ekîbên tenduristîyê yên lezgîn bo herêmên bandorgirtî bi awayekî sîstematîk zahmet kirye an jî asteng kirye. Ev jî bi rastî bûye sedema hin mirinên ku minkin bû rê li ber wan were girtin.

43. Herwiha îddîa hene ku li dij tesîsên tenduristîyê û li dij personelên tenduristîyê êriş pêkhatine, personelên tenduristîyê ji ber dermankirina nexweşan hatine cezakirin û tesîsên tenduristîyê bo armancên leşkerî û ewlehîyê hatine bikaranîn. Mînak li gor rapora RCS'yekê di îlona 2015an de hêzên dewletê yetkîneyên xwe bar kirine nexweşxaneya Cizîrê, qatê sêyem ê nxweşxaneyê bi temamî dagir kiriye.[45] Li gor heman raporê tê destnîşankirin ku di îlona 2015an de ajovenekî ambûlansê û çend heb hemşîre di dema wesîfeya xwe de ji teref polîs an jî kesên nasnameya wan nedîyar ve gule li wan hatine berdan û ew kesan mirine.[46]

44. OHCHR rapor bidest xistine ku rayedarên leşkerî yên ku qedexye derketina derve tetbîq dikin, gihiştina xizmetên tenduristîyê(-birîndarîyên bo jîyanê xeternak an jî bo nexweşîyên bi tedavîya lezgîn ya tibbi ve hewcedar jî di nav de) asteng kirine. Ev raporanan îddîa diki ku Hêzên ewlehîyê yên Tirkîye'yê bi rêya barîqat û xalên

---

[45] https://s3.amazonaws.com/PHR_Reports/southeastern-turkey-health-care-under-siege.pdf, s. 12.

[46] Heman çavkanî r. 18 ve 19

qontrolê midaxaleyî yekîneyên barkirina tibî kirine û parastina pêdiv bo wasîteyên barkirina lezgîn nekirine. Hêzên ewlehîyê, wek ku hatîye raporkirin, nexweşxane wek xewgeh û ofîsan bikaranîne û rê li ber xebatkarên tenduristîyê girtine ku ew têkevin hin beşên nexweşxaneyê. Raporê ku ji teref hukûmetê bo OHCHR'yê hatine temîn kirin rê didin ku gihiştina wasîteyên lezgîn ên tibbî û îtfaîyeyan bo herêmên bandorgirtî ji ber xendeq û barîqatên li hin taxan hatîye astengkirin.

D. Wendakirina bi darê zorê

45. RCS'yan rapor kir ku heta domahîya meha Tebaxa 2016an ji 3 mêrên ji başûrê rojhilatê Tirkîye'yê, di bûyerên ji hev cihê de, li Stenbolê, Rihayê û Licê'yê bi darê zorê hatine wendakirin. Wek ku tê ddîakirin qûrbanî ji teref polîs hatine girtin lê belê endamên malbatên wan mimkin nebûye ku bidin dû şopa wan. D ser vê de OHCHR hatîye agahdarkirin ku di Mijdara 2016an de ji Amedê endamekî Partîya Herêmên Demokratîk li Enqere'yê bi zorê hatîye wendakirin. Xizmên qurbanî îddîa kirine ku mimkin e qûrbanî ji teref polîsan li cihekî nedîyar hatibe binçavkirin.

46. Grûba Xebatê ya Neteweyên Yekbûyî ya Wendehîyên ji Dervî Îradeyê an jî bi Zorê di Adara 2016an de serdana Tirkîye'yê kirye û îfade kirye ku rewş li başûrê rojhilatê welat her ku diçe dibe sedema fikaran ku bi awayekî tim li xwe zêde dike. Û ji ber tesîra**47** ev rewşa ya li ser mafên mirovan bi fikar in. Hatîyê îfadekirin ku ev rewş zemîn ji wendakirinên bi darê zorê û binpêkirinên mafên mirovan re amade dike. Koma Xebatê îfade bidest xistine ku li başûrê rojhilatê Tirkîye'yê înfazên bêdarizandin pêkhatine û malbat ne gihiştine

---

47 http://www.ohchr.org/EN/NewsEvents/Pages/DisplayNews.aspx?NewsID=18477&LangIDE

bedena mirîyên xwe yên ku di operasyonên ewlehîyê de hatine kuştin.[48] Kom, di çarçoveya operasyonên ewlehîyê yên başûrê rojhilatê TirkÎye’yê bang kirye da ku îddîayên li ser binpêkirina mafê mirovan bi ewayekî berfireh û bêalî were lêpirsînkirin.[49]

E. Kesên ku li hundir welêt ji cih bûne

47. Li gor çavkanîyên cûr bi cûr tê texmînkirin ku di encama operasyonên ewlehÎyê yên başûrê rojhilatê Tirkîye’yê de hejmara giştî ya kesên ku li hundir welêt ji cihê xwe bûne(IDP) di navbera 355.00014 û nîv milyonî[50] de ye. Hejmara herî bilind jî li gor raporên herêmî, li Sûra ku ji sedî 95ê nufûsa wê ji ber operasyonên ewlehîyê ji cihê xwe bûye, qewimîye. Hatîye raporkirin ku kesên ji ber operasyonên ewlehîyê ji cihê xwe bûn an çûne bajarok û gundên derdorê; an jî çûna navenda bajarên wek Amed, Wan û êlihê; an jî bar kirine herêmên Tirkîye’yê yên din. Mala IDP’yîyan tune ye ji ber ku ya di operasyonên ewlehîyê de hatiye ruxandin an jî ji ber ku hukûmetê plana rûxandin û/an jî îsimlaqê dimeşîne(Ev hemû astengîyê derdixe pêşberî IDP’yîyan).

48. Hukûmetê gihiştineke tam pêkneanîye, wek ku hatîye raporkirin, bo ku pêdivîya parastin û mirovahî ya İDP’yîyan ya ji teref sazîyên serbixwe û bêalî yên alîkarîya mirovahî were temînkirin. Xizmetên esasî yên civakî û alîkarîya mirovahî yên ku hukûmetê bi cih anîne, wek ku hatîye raporkirin, berevajîmukelefîyetên mafê mirovan ên

---

[48] A/HRC/33/51/Add.1, para. 12.

[49] Heman Çavkanî, para.66

[50] https://www.amnesty.org/en/latest/news/2016/12/turkey-curfews-and-crackdown-forcehundreds-of-thousands-of-kurds-from-their-homes/ https://www.amnesty.ch/en?set_language=en&cl=en&gclid=CjwKEAiAirXFBR-CQyvL279Tnx1ESJAB- GQvssjpkiW7SVa4NJImBLUUarP1h_aAYmuYHfbtuvtlcBo-CXHXw_wcB, s. 18-19

navnetewyî yên Tirkîyeyê û mukelafîyetên temînatkirî yên Peymana Navneteweyî ya Mafê Aborî, CivakÎ û Çandî, hindik e û nekafî ye.[51] Wekî din RCS ên herêmî îddîa dikin ku hukumet alîkarîyên bi vî şiklî bi şertê pakbûna sicîla adlî dide. Ev rewşa îddîakirî rêgezên mirovahî yên ku mudaxaleyên alîkarîya mirovahî ya rewşên lezgîn saz dike, bipê dike.

---

[51] https://www.amnesty.ch/en?set_language=en&cl=en&gclid=CjwKEAiAirXFBR-CQyvL279Tnx1ESJAB- GQvssjpkiW7SVa4NJImBLUUarP1h_aAYmuYHfbtuvtlcBo-CXHXw_wcB, s. 18-19



Di grafîka jor de li gor daneyên ku Koma Krîzê ya Navneteweyî ji çavkanîyên aşkere berhevkirye, xwuya dike ku ji Tîrmeha 2015an û pêve, ku pevçûnan dîsa destpê kir, û ber bi dawîya sala 2016an ve rêjeya mirinan bilind bûye. Di grafîka jêr de faktorên bûne sedema mirinan hatine dayîn. Di rûpela kêlekê de û li grafîka jor de balê dikşîne ku heta Tirmeha 2015an û nava sala 2016an di qadên bajarîyî de rêjeya mirinan bilind dibe. Di rûpela kêlekê de û di grafîka jêr de jî ji 2011an heta Tirmeha 2015 an a ku pevçûnan destpêkir, mirinên qewimîne rêdide. Di navbera Adara 2013an, ku pêvajoya çareserîyê destpêkir, û Tîrmeha 2015an de rêjeya mirinan bla dikşîne ku di asteke pir kêm deye.





Ji Tîrmeha 2015an û pê ve herî kêm 1318(%36) kes li nav bajêr, 2320 kes(%64) li gundewarîyan hatin kuştin.



Di navbera Çileya 2011an û Pûşpera 2015an debi giştî herî kêm 153 sivî, 327 endamên hêzên ewlehîyê û 558 endamên PKKê di pevçûnan de mir.

Pêvajoya neçalakbûnê ya ku di Adara 2013an de destpêkir û di Tîrmeha 2015an de qedîya, herî kêm 63 sivîl, 25 endamên hêzên ewlehîyê û 25 endamên PKKê mirin. Sedama zêdabûnê ya di Cotmeha 2014an de ev bu ku li hemî derê welat grubên Kurd di tarixa 6-8ê Cotmehê de li hember helwesta Enqerê ya li dij DAÎŞê(Dewleta îslamê li Şamê û li İraqê) bertek nişandan ku wê demê DAÎŞê Kobanê dorpêçkiribû. Di van bûyeran de 42 kesan can da.

Sıra	Welat	Navçe	Roj	ji qedexeya derketina derve ya ku di 16ê tebaxa 2015an de li Mûş/Gimgimê hate ragihandin û pê ve kronolojiya qedexeyên derketina derve
1	Mûş	Gimgim	0	Qedexeya derketina derve ya ku ji rex walîtîya Mûşê li navenda bajêr ya navçeya Gimgimê roja 16.8.2015an ji saeta 08:30an û pê de hate îlankirin, di dîroka 17.08.2015an de saet 05:00an de rakirina wê hate ragihandin.
2	Amed	Licê	0	ji hêla walîtîya Amedê li navenda navçeya Licê di 17.08.2015an roja duşemê ji saet 21:00ê de heta 18.08.2015an roja sêşemê saeta 07:00an qedexeya derketina derve hat ragihandin.
3	Amed	Licê	0	ji hêla walîtîya Amedê li navenda navçeya Licê ji 18.08.2015 roja sêşemê saet 21:00an heta 19.8.2015 roja çarşemê demjimêe 07:00an qedexeya derketina derve hat ragihandin.
4	Amed	Farqîn	1	Qedexeya derketina derve ya di 18.08.2015 bi şevê di saet 01:00ê de ji hêla walîtîya Amedê li navenda navçeya Farqînê hate ragihandin roja 19.08.2015 di saet 07:00an de bidawî bû.
5	Amed	Farqîn	1	Qedexeya derketina derve ji hêla walîtîya Amedê li taxên Tekel, Konak û Mescîtê yên girêdayê navenda farqînê roja 24.08.2015 saet: 12:00 de pê ve heta bangewaziyeke duyemîn hate ragihandin di roja 25.08.2015 saet: 12:30an de hate rakirin.
6	Colemêrg	Gever	1	Qedexeya derketina derve ya ji hêla walîtîya Colemêrgê ve di roja 26ê Tebaxa 2015an de saet: 23:30î û pê ve li navenda navçeya Geverê hate ragihandin di 28ê Tebaxa 2015an de di saet: 07:00an de hat rakirin.

7	Şirnex	Cizîr	7	Qedxeya derketina derve ya ji hêla walîtîya şirnexê ve di roja 4ê Îlona 2015an de di saet: 20:00an de li navçeya Cizîrê hate destpêkirin, di 12ê Îlona 2015an de roja şemiyê di saet: 07:00an hat ragihandin ku bidawî bûye.
8	Amed	Sûr	0	Qedexeya derketina derve ya ji hêla walîtîya amedê ve li herêma di hindurê bedenê de a navçeya navendê Sûrê (li taxên Abdaldede, Alîpaşa, Camî Kebîr, Camî Nebî, Cevatpaşa, Dabanoglu, Fatîhpaşa, Hasirli, Înkenderpaşa, Melîkahmet, Zîyagokalp, Lalebey, Suleyman Nazîf, Savaş, Cemal Yilmaz) hate ragihandin, di 07.09.2015 roja duşemê ji saet: 06:00an û pê ve hat bidawîkirin.
9	Amed	Bismil	0	Qedexeya derketina derve ya ji hêla qeymeqamiya Bismilê ve li navçeya Bismilê roja 8ê Îlona 2015an saet: 14:00an û pê ve li Taxa Tekelê, li Taxa Dûmlûpinarê, li Taxa Firatê û li Taxa Ûlûturkê hate îlankirin, di dîroka 08.09.2015 de ji saet: 17:00ê û pê ve bidawîkirina wê hat ragihandin.
10	Colemêrg	Gever	0	Qedexeya derketina derve ya ji hêla walîtîya Colemêrgê ve li navenda navçeya Geverê roja 10ê Îlona 2015an ji saet: 23:30î û pê ve hate ragihandin, di dîroka 11.09.2015an de roja înê ji saet: 07:00an û pê ve hate bidawîkirin.
11	Şirnex	Cizîr	0	Qedexeya derketina derve ya ji hêla walîtîya Şirnexê li navenda navçeya Cizîrê di roja 13.09.2015an de di saet: 19:00an de hate ragihandin, di 14.09.2015an de roja Duşemê ji saet: 07:00an û pê ve hat rakirin.

12	Amed	Farqîn	1	Qedexeya derketina derve ya ji hêla qeymeqamtiya Farqînê ve li taxên Mescît, Tekel û Konakê ên girêdayê navçeya Farqînê di 13ê Îlona 2015an de roja Yekşemê ji saet: 08:00an û pê ve hat îlankirin, di 14ê Îlona 2015an de roja Duşemê ji saet: 16:00an û pê ve bidawîkirina wê hat ragihandin.
